



K.T

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê WÊJEYA KURDÎ

HÊMANÊN FOLKLORÎK DI ROMANÊN ELÎYÊ

EVDILREHMAN DE

AMADEKAR

Hasan FİLİTOĞLU

TEZA LÎSANS A BİLİND

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN

BÎNGOL 2020

T.C
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

ELÎYÊ EVDİLREHMAN'IN ROMANLARINDA
FOLKLORİK ÖĞELER

AMADEKAR
Hasan FİLİTOĞLU

YÜKSEK LİSANS TEZİ

ŞÊWIRMEND
Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN

BİNGÖL 2020

NAVEROK

NAVEROK	I
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ.....	V
PÊŞGOTİN	VII
ÖZET.....	VIII
KURTE	IX
ABSTRACT	X
KURTEBÊJE	XI
1.1. Mijara Tezê.....	I
1.2. Armanç û Girîngiya Xebatê.....	2
1.3. Çarçove û Sînorên Tezê	2
1.4. Rebaza Xebatê	3

BEŞA YEKEM

1. Folklor	4
1.1. Pênaseye Folklorê	4
1.2. Naveroka Folklorê.....	7
1.3. Têkilîya Folklor û Disîplînên Din	10
1.4. Erka Folklorê.....	12
1.5. Folklor û îdeoloji.....	12
2. Roman	15
2.1. Roman Çi Ye	15
2.2. Folklor û Roman.....	16
3. Romana Kurdî û Folklor	19
3.1. Lênêrîneke Giştî, Folklor û Romana Kurdî.....	19
3.2. Di Romana Kurdî De Rengvedana Folklorê	21

BEŞA DUYEM

1. Romannûsiya Qafqasyayê Û Eliyê Evdilrehman	26
1.1. Nêrîneke Giştî Li Ser Romannûsiya Qafqasyayê.....	26
1.2. Romannûsiya Eliyê Evdilrehman	27
2. Kurteya Romanan.....	30
2.1 Kurteya Morof.....	30
2.2. Kurteya Xatê Xanim.....	32
2.3. Kurteya Romana Gundê Mêrxasan	33
2.4. Kurteya Romana Şer Li Çiya	37

BEŞA SÊYEM

1. Hêmanên Folklorîk Di Romanên Elîyê Evdirrehman De	44
1.1. Wêjeya Gelêrî.....	44
1.1.1. Yên Helbestkî (Menzûm)	44
1.1.1.1 Kilam	44
1.1.1.2. Helbest	49
1.1.2 Yên Pexşan	49
1.1.2.1. Destan	49
1.1.2.1.1. Siyabend û Xecê	49
1.1.2.1.2. Mem û Zîn.....	50
1.1.3. Vegotinên Qalipgirtî.....	51
1.1.3.1. Gotinên Pêşyan	51
1.1.3.1.1. Gotinên Pêşyan Yên di Romana Morof de	52
1.1.3.1.2. Gotinê Pêşyan Yên di Romana Xatê Xanim de.....	55
1.1.3.1.3. Gotinên Pêşyan Yên di Romana Gundê Mêrxasan de	56
1.1.3.1.4 Gotinên Pêşyan Yên di Romana Şer Li Çiya de.....	58
1.1.3.2. Biwêj.....	61
1.1.3.2.1. Biwêjên di Morof de.....	62
1.1.3.2.2. Biwêjên di Novela Xatê Xanim de	64
1.1.3.2.3. Biwêjên di Romana Gundê Mêrxasan de	66
1.1.3.2.4. Biwêjên di Romana Şer Li Çiya de.....	69
1.1.3.3. Dua.....	76
1.1.3.3.1 Xwestek	77
1.1.3.4. Nifir.....	78
1.1.3.5. Sond Xwarin û Soz Dan.....	79
1.1.3.6. Xatirxwestin û Xêrhatin.....	80
1.1.3.7. Heyîrîn	81
1.1.3.8. Şîret.....	82
1.1.3.19. Leqeb (Navûnûçik)	82
1.1.3.10. Berketin/heyfanîn.....	83
1.1.3.11. Gefxwarin	85
1.1.3.12. Bangkirin	85
1.1.3.13. Gotinên Lihevhatî	86
1.1.4. Meseleyên gel.....	87

1.1.5. Dengbêjî	89
2. Zanista Gel Di Romanên Elîyê Evdilrehman De.....	91
2.1. Ewra Derbasbûyînê	91
2.1.1. Welidîn.....	92
2.1.1.1. Beriya Welidînê	92
2.1.1.2 Piştî Welidînê	93
2.1.1.2.1. Navlêkirina Zarokan	93
2.1.1.2.2. Kîrîvetî.....	94
2.1.2. Zewac.....	95
2.1.2.1. Pêşîya Zewacê	96
2.1.2.1.1. Keç Ecibandin û Fikra Keçê Pirsîn	96
2.1.2.1.2. Qelen	97
2.1.2.1.3. Soz û Nîşan Kirin.....	98
2.1.2.2. Wextê Zewacê	98
2.1.2.2.1. Balgiya Bûkê	101
2.1.3. Mirin	103
2.1.3.1. Wesiyet	105
2.2. Agahdariya Gel.....	105
2.2.1. Bijîşkiya Gel	105
2.2.2. Giyanasîna Gel.....	108
2.2.3. Zoolojîya Gel	110
2.3. Cejn, Şahî, Ol	112
2.3.1. Ola Îslamê	112
2.3.2. Cejna Remezanê	113
2.3.3. Quran	114
2.3.4 Çavkaniyên Olî	115
2.3.5. Ezîdîtî.....	115
2.4. Baweriyên Gel.....	115
2.4.1. Baweriyên di Derbarê Rengan de	116
2.4.2. Baweriyên di Derbarê Hejmaran de.....	116
2.4.3. Baweriyên di Derbarê Ajalan de.....	117
2.4.4. Baweriyên di Derheqê Axê de	118
2.4.5. Kaniya Mirazan.....	118
2.5. Lîstik.....	118

2.5.1. Cîrîd	118
2.6. Reqsên Gel	119
2.6.1. Cûreyên Reqsan	119
2.6.2. Amûrên Mûzikê	121
2.7. Mitbexa Gel	122
2.7.1. Cûreyên Xwarin û Wexwarinê	122
2.8. Jiyana Civakî	123
2.8.1. Mêvandarî	123
2.8.2. Cînartî	124
2.8.3. Rabûn û Rûniştin	125
2.8.4. Zibare	126
2.8.5. Edet	126
ENCAM.....	128
ÇAVKANÎ.....	132
KURTE JÎYAN	136

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Yüksek Lisans tezi olarak hazırladığım *Hêmanên Folklorîk di Romanên Eliyê Evdilrehman de* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

28 /08/ 2020

Hasan FİLİTOĞLU

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Hasan FİLİTOĞLU tarafından hazırlanan “*Hêmanên Folklorîk di Romanên Eliyê Evdilrehman de*” başlıklı bu çalışma, 28.08.2020 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile/ oy çokluğu ile] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [Kürt Dili ve Edebiyatı] Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ İmza:

Danışman : Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN İmza

Üye : Doç. Dr. Canser KARDAŞ İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../ 2020 tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

Enstitü Müdürü

PÊŞGOTÎN

Piştî şerê cîhanê yê yekem di sîyaseta cîhanê de guherînên nû pêk hat. Di nav van guhertinan de dewletên xwedîdar li gor berjewendiyên xwe bi şîrîkên xwe re sînoren nû ava kirin. Di vê parvekirina sînoran de neteweyên kêmanî hatin paşgûhkirin. Yek jî ji wan neteweyan, neteweyê Kurd bû ku di nav sînoren dewletên cûda de belavbûn. Bi vê parvekirinê ve tenê têl û mayîn nakeve navbera têkiliyên wan ên şênber, bes cudahî dikeve nav hiş û folklorê wan jî û texrîbatekî mezin li folklorê wan dike. Lê di vir de em peyva texrîbatê nikarin tenê ji bo neyînîyê bikar bînin, lewre tevî xerabiyên xwe ji bo çanda gel derfetên nû jî daye peydakirin. Loma jî tevî parastina çanda xwe gelek peyvên tirkî, ûrisî û farisî formên nû girtine û êdî bûne malên kurdî.

Ji ber sedemên konjuktûrel û dîrokî romanên Kurdî yê ewilîn li xeribiyê ji destê kurdên qafqasyayê der çûne. Piraniya van berhemên klasîk in, xwe dispêrin paşxaneya kurdî û rengê wan ê folklorîk jî heye. Her çiqas ji aliyê teknîkî ve kêmahiyên wan hebin jî, ji aliyê folklorê ve ezmûnek xweş dane û berhemên xwe ji bo xwîneran bi keresteyên folklorîk ve dagirtine. Ligel çanda xwe ya resen ji çanda cîranên xwe jî sûd wergirtine û bi vî awayî berhemên xwe bi mîratên çanda xwe dewlemend kirine.

Yekemîn roman û novelên kurdî ji edebiyata qafqasyayê derçûne. Ji bo berhemên wê ewrê hêmanên folklorîk çavkaniyên herî bi qîmet in. Rewşenbîrên ewra qafqasyayê di xebatên xwe de pala xwe dane zargotina bav û kalan û berhemên xwe bi hêmanên folklorîk xemilandine. Tevî ku roman wek celeb aîdê serdema modernbe jî, nivîskarê wê ewrê naveroka roman û novelên xwe bi zargotina milletê xwe dagirtine.

Eliyê Evdilrehman jî yek ji wan xemxwarê kurdî bû ku bi berhemên xwe her ji kurdî re xîzmet kiriye. Ji ber ku di roman û novelên xwe de hin nîşaneyên teknîkên modern hene û li gel vê modernîzmê hêmanên folklorîk jî tevî wê hatine hunandin, ev berhem hêj bêhtir bala xwîner kişandiye ser xwe.

Di amadekirina vê xebatê de gelek alîkarî çêbûn. Lê di serî de ez dixwazim spasîyê xwe pêşkeşî şewirmedendê xwe birêz Doç. Dr. M. Zahir ERTEKIN bikim ku deriyê oda xwe herdem ji me xwendevana re vekîrî hişt û bi teşwîq û rênîşandina xwe ve di temamkirina vê xebatê de alîkarî kir. Herwiha ji bo xwendin û sererastkirinê spasîyên xwe Sabri KÜLTER û Ramazan BADEM dikim.

Armanca vê xebatê diyarkirina hêmanên folklorîk ên ku di roman û novelên Eliyê Evdilrehman de hatine bikaranîn in. Em hêvî dikin ku ev xebat bigihêje miraza xwe û ji bo dahatûyê bibe çavkaniya sûdwegirtinê.

ÖZET

Folklorik roman bir milletin örf ve adetlerini, inançlarını, dil ve kültürlerini gözler önüne sermek için bir ayna gibidir. Ayrıca bu yolla insan o milletin ruhuna ulaşabilir. Bu hususta Kafkasya konağı folklorik kürt romanlarının araştırılması için iyi bir fırsattır. Kafkasya Kürtlerinin romanlarında folklorik bir çok materyale ulaşmak mümkündür. Öyleki kafkasyada yaşayan kürt edebiyatçılar inanç, örf ve adet, kültür ve diline önem vermiş, folklorik bir dil kullanmış ve bunu romanlarına yansıtmışlardır.

Roman ve novellerinde folklorik bir dil kullanan kafkasya kürt yazarlarından biri de Eliyê Evdilrehman dır. Bu çalışma da Eliyê Evdilrehman'ın eserlerinde kullanılan folklorik öğelerin örneklerini tespit ediyor, katagorize edip gözler önüne seriyor.

Çalışmanın birinci bölümünde folklor, roman ve folklor-roman arasındaki ilişki üzerine söylenen düşünceler geniş bir çerçevede tespit edilmiştir. İkinci bölümde ise kafkasya romanı, Eliyê Evdilrehman'ın yazarlığı üzerine durulup *Şer li çiya* adlı romanının ve *Morof, Xatê Xanim* ve *Gûndê Mêrxasan* adlı novellerinin özetleri verilmiştir. Üçüncü bölümde de Eliyê Evdilrehman'ın eserlerindeki halk edebiyatı örneklerini katagorize edip gözler önüne sermektedir.

Anahtar kelimeler: Eliyê Evdilrehman, Folklor, Roman, Novel, Kafkasya.

KURTE

Romana folklorîk ji bo berçavraxistina urf û edet, bawerî, ziman û çanda milletekî wek neynikekî ye ku mirov dikare bi vê rêyê xwe bigihîne ruhê şênîyên wî milletî. Êwra qafkasyayê jî ji bo lêkolînên folklorîk ên romana kurdî xwedî fesal e ku mirov dikare di romanên vê ewrê de gelek materyal bi dest bixe. Wisa ku berhemdarên kurd ên li qafkasyayê zêdetir li ser bawerî, urf û edet, ziman û çanda xwe ponijîne û wisa jî vê yekê derbasê berhemên xwe kirine. Bi vî rengî jî zimanên wan ên folklorîk xemla xwe berhemên kiriye.

Yek ji van berhemdarên qafkasyayê Eliyê Evdilrehman e ku çî di novelên xwe de be û çî jî romanên xwe de be, zimanê xwe yê folklorîk niqutandîye berhemên xwe. Loma jî ev xebat hêmanên zargotinî ên di berhemên Eliyê Evdilrehman de radixe ber çavan, nimûneyan tesbît dike û bi awayekî rêkûpêk kategorîze dike.

Di beşa yekem de li derûdora fikr û ramanên di derheqê folklor, roman û tîkiliya folklor û romanê vedikolîne û bi awirek giştî çarçoveyekê xêz dike. Di beşa düyemîn de jî li ser romannûsiya qafkasyayê û li ser taybetiyên nivîskariya Eliyê Evdilrehman hatiye sekinîn û pê re jî kurteya romana wî a bi navê *Şer li çiya* û kurteyên novelên bi navê *Morof, Xatê Xanim* û *Gûndê Mêrxasan* hatiye nivîsîn. Di beşa sêyem de jî edebîyata gelêrî ya ku di roman û novelên Eliyê Evdilrehman de kategorîze dike û yek bi yek radixe li ber çavan.

Peyvên Sereke: Eliyê Evdilrehman, Folklor, Roman, Novel, Kafkasya.

ABSTRACT

The folkloric novel is like a mirror to reveal the customs, beliefs, language, and culture of a nation. In addition, people can reach the soul of that nation in this way. In this respect, the Caucasian mansion is a good opportunity to research folkloric Kurdish novels. It is possible to reach many folkloric materials in the novels of the Caucasian Kurds. Kurdish writers living in Caucasia gave importance to belief, customs, traditions, culture, and language, used a folkloric language, and reflected this in their novels.

One of the Caucasian Kurdish writers who use a folkloric language in his novels is Eliyê Evdilrehman. This study identifies, categories, and reveals the examples of folkloric elements used in the works of Eliyê Abdul Rehman.

In the first part of the study, the opinions expressed on the relationship between folklore, novel, and folklore-novel were determined in a wide frame. In the second part, focusing on the summary of the Caucasian novel, the authorship of Eliyê Evdilrehman, and the novels Şer li çiya, Morof, Xatê Xanim, and Gûndê Mêrxasan. In the final part, I categorizes and reveals the examples of folk literature in the works of Eliyê Evdilrehman.

Keywords: Eliyê Evdilrehman, Folklore, Novel, Caucasia.

KURTEBÊJE

amd.	: Amadekar
hwd.	: Her wekî din
weş.	: weşanxane
s.	: Sal
r.	: Rûpel
wer.	: Wergêr
h.	: Hejmar
j.	: Jimare
h.b	: Heman Berhem
X.X	: Xatê Xanim
G.M	: Gundê Mêrxasan
Ş.L.	: Şer li Çiya
M.R.	: Morof

DESTPÊK

1.1. Mijara Tezê

Mijara vê xebatê “*Hêmanên Folklorîk di Romanên Eliyê Evdirrehman de*” ne. Wekî em dizanin di edebiyata kurdî de yek jî ewra mûhîm ewra qafkasyayê ye ku bi xebat û weşanên xwe mihra xwe li wejeya kurdî xistine. Di nav heyteholâ sedsala 20an de nivîskarên wê ewrê ketine telaşa kurdî û ji bo xebatên kurdî pêngavên xûrt avêtine. Gelek rojname, kovar, roman, novel û hwd in ji aliye nivîskarên mîna Heciyê Cindî, Erebe Şemo, Şikoyê Hesên, Emerîkê Serdar û wd in ve hatine weşandin. Yek jî ji nivîskarê wê deme Eliyê Evdilrehmane ku ji xeynî xebatên xwe yê din ku derveyî vê tezê ne, dû(2) roman û dû(2) novel li edebiyata kurdî zêde kiriye.

Cûreya romanê qadeke nû ye ku bi awayekî xûrt û jêhatî di dawiya sedsala 18an de di nava cihanê de belav dibe. Gihaştina wê û rengvedana wê ya di nav edebiyata kurdî de, xwe digihîjîne nîveka sedsala 20an. Wexta ku em destpêka romanê kurdî vedikolin, tê dîtîn ku naveroka romanên destpêkê bi hêmanên folklorîk tije ne. Di hemû roman û novelên Eliyê Evdilrehman de jî hêmanên folklor bi awayekî aşkere xwe dide der. Nivîskar hêmanên folklorîk yê mîna gotinên pêşyan, biwêj, nifir, rabûn û rûniştin, zewac, kîrvetî, bîr û bawerî û wd in bi şiklekî xwezayî di nav berhemên xwe de belav dike. Bikaranîna hêmanên folklorîk hêza qablîyet û zanebûna nivîskarî li ser civakê derdixe pêş ku Eliyê Evdilrehman jî yek ji wan nivîskaran e. Loma jî me xwast em li ser roman û novelên Eliyê Evdilrehman bixebitin.

Yek jî sedema hîlbijartina vê mijarê ew e ku; her çiqas folklor di edebiyata kurdî de bi awayekî qewî xwe nişan bide jî xebatên di derheqê romanên kurdî de tînin kirin bi awayekî baş li ser ‘hêmanên folklorîk’ narawestin. Ev jî dibe sedem ku hem mirata bav û kalan tam nayê fêhm kirin, hem jî analîzkirina romana kurdî yê folklorîk ji aliye teknîkî ve bi pêş naçe. Bi vê xebatê me hewl da ku ji bo xebatên dahatûyê şablonek derbixin. Li ser vê şablonê sernavên hemanên folklorîk dîyar bikin û li gor vê şablonê dîtinan zêde an jî kêmkirin bikin.

1.2. Armanç û Girîngiya Xebatê

Armanca bingehîn a vê xebatê destnîşankirina hemanên folklorik di novel û romanên Elîyê Evdilrehman de ye. Lewre roj bi roj hejmarê bikaranîna gotinên folklorik û sepandina edetên folklorik di nav gel de kêr dibin. Ev jî dibe sedem ku nîşên nû ji vê miratê mehrûm bimînin. Ji ber vê yekê jî tesbitkirina hemanên folklorik ji bo paşerojê tiştê mecbûriye. Îro jî ber hin sedemên civakî-siyasî û nebûna statûya zimanekî fermî, me ji bo xebatên folklorîk bêgav dihêle. Yek jî ji wan xetereyan ew e ku; nîşên nû zimanê milletê xwe 'têr' nabînin. Ji bo peyv, gotin, biwêj û wd in berê xwe didin zimanê biyanîyan. Lewre haya wan ji dewlemedîya zimanê wan nîn e yan jî derfetên guncaw nedane wan ku haya wan jê çêbibe. Lewre perwerde ne bi zimanê wan, bi zimanê serdestê wan tê dayîn. Ger haya wan ji gencîneya ziman û edetên wan çê bibe û vekolînên baş û xurt li ser berhemên destpêkê pêk werin, ewê bê dîtîna ku zimanê wan kanîyek têr û tijeyê û li benda keşîfkirinê ye.

Folklor cewherêk bêdawiye û her diçe li ser xwe tiştên nû zêde dike. Her takekes an jî bi gelemperî netew li gor feraseta xwe dixwaze xwe bigihîjine vê cewherê û rûhek û hişmendiyek li ser vê cewherê ava bike. Folklor wekî behrekêye û bêrawestan her diherike, ava wê jî mirov, pêdivî, şaristanî û teknolojiye ku heger xebat li ser bê kirin kes ne dikare pêşîya wê bigre ne jî dikare wê ziwa bike. Divê em jî li pey şopa folklorê bikevin û nehêlên tarîfîyê de bimîne.

Yek jî sedema hilbijartina min a vê mijar û vî nivîskarî ew e ku hemanên folklorik û keresteyên folklorîk di roman û novelên Elîyê Evdilrehman de zehf zêde ne. Heta ku ji dest nivîskar hatîye gotin, qalib, e' det û bawerî zêde bikar anîye. Nivîskar bi xwesteka xezîneya ziman û edetên bav û kalan bi xwîner bide hîskirin, qelesa xwe bikaranîye. Wisa ku ev xwesteka nivîskar carina ketiye pêşîya nivîskariya wî jî. Lewre di van berhemên li ser hatine şixûlandin de wî ha tê xuyakirin ku; yek jî armanca nivîskar, serwextkirin û perwerdekirina xwîner bo xwe ye. Loma jî me hewce dît ku xebatek bi vî awayî pêk bînin û dîtîna xwe raxin ber çavan.

1.3. Çarçove û Sînorên Tezê

Sînor û çarçoveya xebatê bi giştî analîzkirin û deşîfrekirina hemanên folklorik di novel û romanên Elîyê Evdilrehman de ye.

1.4. Rebaza Xebatê

Ji bo ku xebatên akademîk bigihijin armanca xwe divê rê û rêbazên zanistî werin tatbîqkirin. Ji bo xebat bikemile û di wê qadê de wek mînak bê pejirandin divê her lêkolîn û xebat bi hizrek zanistî were amadekirin û piştî xwe jî bide xebat û palpiştên xûrt. Li gor mijara xebatan jî rê û rêbazên ku tên tatbîqkirin jî tên gûhertin.

Metoda ku di vê xebatê de hatî hilbijartin ne tenê hêmanên folklorîk destnîşan dike, di heman demê de bi rêbazên zanistî li ser wan keresteyan şîrove tê kirin. Herwiha di kurteya roman û novelan de jî heman rêç tê domandin û bi perspektîfekî zanistî berhem tê nixandîn.

Armanca vê xebatê di çarçoveya zanista folklorê de nixandina novel û romanên Elîyê Evdilrehman û berpêş kirina hêmanên folklorîk yên di berhemên de hatine kifşkirin e. Loma jî ev xebat dê hewl bide ku berhemên Elîyê Evdirrehman li gor persektîfa îlma folklorê binirxîne û nîşaneyên folklorê destnîşan bike. Ji rûyê vê yekê di serî de fikr û ramanên di derbarê folklorê de hatine vekolandin û naverok û sînora xebatê bi awayekî zelal hatiye raxistin.

Ev xebat, di beşa yekemîn de, li ser teoriyên folklorê rawestîyaye û ji bo zanista folklorê di çarçoveya fikr û angaştên ciyawaz de, wêneyek kişandiye. Di beşa duyem a tezê de berê pêşîn behsa nivîskariya Elîyê Evdilrehman hatiye kirin û paşê jî bi analîzkirina kurteya novel û romanên wî bi dawî dibe. Beşa sêyem ya tezê de jî li gor persektîfa xebatên cîhanê hêmanên folklorîk hatine senifandin û hêmanên folklorîk yên hatine tesbît kirin bi mînakên hatiye ravekirin.

BEŞA YEKEM

1. Folklor

1.1. Pênaseye Folklorê

Ji serdemên berê ve folklor bûye yek ji perçeyekî muhîm ê civakê. Ji berê ve mirov jîyana xwe li gor hin qaîdeyan bi rê ve dibin. Ev qaîde û edetên mirovan bi demê re kirasekî neteweyî û rûhekî manewî hildidin ser xwe û wek beşeke girîng ê civakê tên qebûl kirin. Lê helbet ji ber kevnarbûn û xwenûkirina xwe folklor, li gorî serdeman bi wateyên cuda cuda hatiye bikaranîn û pênasekirin. Her çiqas paşxaneya hêmanên folklorê heya demên kevin dirêj bibe jî, binavkirina wê ya bi navê ‘folklor’ê xwe digihîne sedsalên çûyî.

“Folklor cara yekem wek peyv ji aliyê lêkolînerê Brîtanî, William John Thoms ve ji dêvla kevnarên popûler hatiye bikaranîn û ketîye nav civaka zanistê.”¹ Wek serkêşê vê zanistê John Thoms, piştî ku gotara xwe belav dike, bandoreke mezin li ser cîhanê dike û pê re jî li her derên dinyayê, xebatên folklorê geş dibin. Di serî de xebatên ku ji bo folklorê hatine kirin ji naskirina folklorê, naverok û têkilîyên wê pêk tînin.

Ji ber nediyarbûna qad û sinorên folklorê hin gengeşî derdikevin holê. Li ser naverok, sînor, derketina wê û her wiha diyarkirina çarçoveyê geştî teorîsyen, bi awayekî qetî li hev nakin, lê bi gelemperî heman tiştî vedibêjin. Lê ji ber qada xwe ya xweser û dewlemend ji kesên cûda angaştên cîyawaz derdikevin holê. Loma jî di derheqê pênaseya folklorê de rêyêke teqez û hevpar nehatiye peyda kirin.

Di tespît kirina folklorê de pirsgerêka sereke deşîfrekirina sînorê wê ye. Berîya gotara John Thomas belav bibe, li Elmanyayê ji dêvla “Folklorê” “Wolkskunde” dihat bikaranîn. Ev peyv ji bo xebatên Elmanyayê dihat wateya lêkolîna li ser gundîyan û gundewarîyan. Loma jî di destpêkê de xebatên ku dihatin kirin bi gund û jîyana gundîyan re sînordarkirî bû. Lê dema ku folklorê bala emrîkîyan kişand, hingê naverok, sînor û pênaseya wê jî di cîh de guherî. Lewra li Emerîkayê di navbera gundîyan de ferq an jî çîn tune bû.² Her kesên ku di qada folklorê de dixebitîn li gor çavderiyên xwe tehlîl û dahûrandin dikirin. Ji wan teoriyan her yekê hem rola folklorê ji nû ve pênase kir, hem jî bandor û sehaya wê ya tehlîlê fireh kir. Ev jî bû sedem ku ji aliyê teorîsyenan ve folklor ji nû ve were xwendin.

¹ Richard M. Dorson, *Folklor û Teoriyên Folklorê yên Îroyîn*, Wer. Necat Keskin Weşanxaneya Awesta, Istanbul, 2017, r. 7

² Francis Le Utley, ‘Folklorun Tanimi’, Wer. Saltık Özkan, *Kovara Milli Folklor*, s. 2005, h. 65, r. 131

Li gorî Yuri M. Sokolov folklor ji keresteyên civakê pêk tê û bi lêkolîna keresteyan re jî zanista folklorê ava dibe. Herwiha wekî ku ji peyva wê dîyar e ji folk(gel) û lore (zanist) pêk tê loma jî zanista gel e.³ Dîyar e ku Sokolov ji aliyê etîmolojîyê ve jî peyva folklorê dinirxîne. Loma jî tevî ku zanistbûna folklorê dipejirîne, pênasaya folklorê bi têgeha gel jî rave dike.

Alan Dundes di wê bawerîyê de ye ku folklor berîya her tiştî zanistek e û herwiha bi pêkhatayên jîyanê yên wek rabûn û rûniştin, çand, wêje, cil û berg, edet û tore, mezinkirina zarokan û heya avakirina hişmendîya kesayetîyê re jî têkildar e.⁴ Xûya ye nêrîna Dundes û Sokolov di derbarê folklorê de ji gelek alîyan ve nêzî hev e. Herdu jî folklorê wek zanist qebûl dikin û têkilîya wê ya bi jîyanê re derdixin pêş.

Bi awayeki giştî di van nêrînan de keda gel derdikeve ber çav. Loma jî xebatên ku bi navê folklorê hatine kirin wek xebatên zanîna gel jî tên bilêv kirin.

Herder'ê ku yek ji teorîsyenê folklorê ye herî bi nav û deng e û bi fikrên xwe di xebatên folklorê de nêrînen nû vedike, folklorê wek adetên xelkê binav dike.⁵ Bascom, di wê fikrê de ye ku folklor her çiqas wek edetên xelkê û zanista xelkê bê qebûlkirin jî bi temamî ne rast e. Ji ber ku keresteyên folklorê ji edetan zêdetir xwedîyê hunerekê ne. Loma jî ji folklorê re dibêje 'hunera devkî'. Bascom, hunera devkî wek beşeke folklorê dibîne û tevî vê yekê folklorê wek zanîna xelkê jî qebûl dike. Li gor wî efsane, ne tenê zanîn in, li gel vê hunerek mezin in jî. Loma jî binavkirina folklorê nikare bi tenê edet û zanîna xelkê re bê sînordarkirin⁶ Bi vî awayî balê dikşîne ser avakirina paşxaneya çîrok, stran, efsaneyan û hunera gel derdixe pêş. Bi vê fikra xwe ve Bascom folklorê tenê ne wek kevneşop, wek hunerek serbixwe jî qebûl dike.

Hinek teorîsyen ji aliyê kevinbûnê ve li folklorê hûr dibin. Yek ji wan John Thomas e ku di gotareke xwe de folklorê wek mehsûlên demên kevn mîna kevneşop, gotinên pêşîyan, tevgerên xelkê û wd îfade dike.⁷ Her çiqas vê pênasayê rêya xebatên folklorê ronî kiribe jî di heman demê de hin pirsgirêk jî bi xwe re anîne meydanê. Lewra li gor vê penaseyê folklor tiştên kevn in û tenê aîdê demên borî ne. Wisa ku gelek

³ Yuri M. Sokolov, *Folklor: Tarih Ve Kuram*, Weşanxaneya Geleneksel, Ankara, 2009, r. 11-12

⁴ Alan Dundes, *Folklor Nedir, Halk Biliminde Kuramlar Ve Yaklaşımlar 2*, Weşanxaneya Geleneksel, 2010, Ankara, r. 15-18

⁵ Remezan Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman-*, Weşanxaneya Peywend, İstanbul 2013, r. 31

⁶ William Bascom, "Halkbilimi, Sözlü Sanat Ve Kültür" Wer. Nilgün Aytuzlar, *Kovara Milli Folklor* s. 2004, h. 63, r. 88-89

⁷ Süheyla Sarıtaş, "Halk Bilimine Giriş",

folklornas li hember vê fikrê derketine û hin tişt lê zêde kirine. Yek ji wan kesan William Bascom e ku li dijî fikra Thoms ku keresteyên folklorê wek kevnare binav dikir, derdikeve. Lewra li gor Bascom, pênasekirina folklorê ya wek ‘folklor kevnarebûn e’ tê dîtin, neheqîyê li stran, lîstik, henek, jest û mîmikên îroyîn jî dike. Herwiha ev pênase afirîneriya gelan jî dikûje. Loma jî ev fikr bi giştî ne rast e.⁸

Çawa ku hin teorîsyenan folklor wek kevnare, hinan jî wek huner qebûl kirine, hin teorîsyen jî di vê qadê de gaveke din jî pêş de çûne û folklorê wek wêje qebûl dikin. Le Utley, folklorê mîna wêjeya ku bi devkî hatîye neqilkirin qebûl dike.⁹ Lê belê folklorê tenê bi wêjeya devkî sînordar nake û festîwal, çand, mîhrîcan û wd. in jî di nava folklorê de dihewîne¹⁰ di vir de qesta Utley stran, destan, çirok, û wd. in ku di kurdî de ji bo vê beşa folklorê edebîyata gelerî tê gotin.

Bi awayekî akademîk hatina folklorê û wek zanist bikaranîna wê di nava Tirkîyê de li gor Ewropayê dereng dest pê kirîye. Di van nivîsan de folklor bi gelemperî wek ‘zanista xelkê’ û ‘xelqîyat’ wekî tiştên ku xelkê afirandîye hatine binavkirin.

Teorîsyen Örnek, folklorê wek zanista xelkê qebûl dike. Li gor Örnek zanista xelqê bi rê û rebazên teknîkî li ser çanda gelekî an jî herêmekê lêkolînan dike, hêmanên çandê berhev dike, tîne beranberî hev, li ser wan şiroveyan pêşkêş dike û di dawîyê de jî bi wan re digihêje encamekê û sentezeke nû çê dike.¹¹ Örnek jî wek ên pêşîya xwe folklorê, zanistekê xwedîyê rê û rebazên teknîkî dihesibîne. Herwiha Örnek di wê bawerîyê de ye ku dibêje lêkolînen ku bînin kirin divê li gor qaîdeyên zanistî bin.

Seyah ew kesin ku yekem nimûneyên folklorîk di berhemên xwe de dihewînin. Ev kesana dema kîjan welatî ewirîne û lê derbas bûne, di seyahatnameyên xwe de behsa wan welatan, folklorê wan kirine û li ser wan agahî dane. Îja ji ber ku li ser erdnigariya kurdan rêyên bazirganîyê zehf bûn, em di nav berhemên wan seyahatnameyên de, di derbarê kurdan de gelek tiştan hîn dibin. Kitêbên seyahatnameyên mîna İbnu Batûta û Ewliya Çelebî ji bo van gotinan du palpiştên herî xurt û navdar in.

Berhemên seyahatnameyên ji berhevkarîya hemanên folklorîk zêdetir li ser danasîna welatan bûn. Jixwe wê çaxê, berhevkarîya hemanên folklorîk jî zêde xurt nebû. Piştî sedsala 19 an, bi şoreş û înkîlaban re xema berhevkarîya hemanên folklorîk di nav xelqê de peyda dibe. Di kurdî de jî heman rewş gerguhêz e. Herçiqas berîya Bazîdî jî hîn nimûneyên xebatên folklorîk li ser folklorê kurdî hebin jî, ji alîyê berhevkarî û tomarkirinê ve,

⁸ William Bascom, ‘‘Halkbilimi, Sözlü Sanat Ve Kültür’’ Wer. Nilgün Aytuzlar, *Kovara Milli Folklor*, s. 2004, h. 63, r. 89

⁹ Francis Le Utley, ‘‘Folklorun Tanımı’’, Wer. Saltık Özkan, *Kovara Milli Folklor*, s. 2005, h. 65, r. 135

¹⁰ Francis Le Utley, ‘‘Folklorun Tanımı’’, Wer. Saltık Özkan, *Kovara Milli Folklor*, s. 2005, h. 65, r. 136

¹¹ Sedat Veyis Örnek, *Türk Halk Bilimi*, Weşanxaneyê İş Bankası, Ankara 1977, r. 15

xebata herî berfireh di salên 1850î de ji alîyê Mela Mehmûdê Bazîdî(1797-1867) hatîye kirin.¹²

Piştî yekem xebatên bi vî şiklî, bi awayekî xûrt ferq kirin û xwedî derketina folklorê bi rêya kovar û rojnameyan ve xwe nîşan dide. Di rojname û kovarên kurdî de cih ji nivîsên folklorîk be tê veqetandin û heta Celadet Alî Bedirxan ji xelqê ji xelqê dixwaze ku bila herkes nivîsên di derbarê folklorê de ji wan re bişîne¹³.

Ji ber ku kurd di cografyayeke mezin de berbelav in, hêmanên folklorîk li gor dever û herêman tînan guhertin û navên cuda lê tînan dayîn. Di kurdî de ji bo peyva folklorê gelek nav hene. “Bi kurdî bêjeya folklorê tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel.”¹⁴ Li gorî Celadet Elî Bedirxan "folklor, zanîna an zanista xelkê ye.”¹⁵ Di zaravayên kurdî de ji bo zanista folklorê bi kurmancî "zargotin" û "zanista gel", bi soranî "xelknasî" û bi zazakî “zanista şarî” tê gotin.¹⁶

Xûya ye ku binavkirina têgeha folklorê di kurdî de bi giştî di bin karîgerîya peyva ‘folklorê’ de maye. Lê kesên wekî Celadet, pêşdetir çûne û tevî zanistê, zanîna gel jî li folklorê zêde kirine. Bi vî awayî feraset û qablîyeta gel bêhtir hatîye destnîşankirin.

Di Hawarê de di derheqê peyva folklorê de bi sernavê “ferhengvan” wiha hatîye gotin “Ev bêje di eslê xwe de ingilîzî ye. Lê îro ketîye hemî zimanên dinyayê. Lewra me jî ew xistîye zimanê xwe. Ji xwe kurdên Qafqasyayê berîya me ev bêje xistine zimanê me û kitêbeke bi navê “folklorê kurdmancî” belav kirine.”¹⁷

Di çarçoveya van fikr û pênaseyan de bi giştî em dikarin bêjin folklor di qonaxa ku destpêka derketina wê baş nayê zanîna tê dîtin û ji alîyê gel ve hatiye afirandin; hinek ji wan bi devkî hatine parastin, hinek jî ji wan bi tevgeran hatine vehandin, paşê jî bi saya guhdarvanan û şopgeran nîş bi nîş heta van rojan hatîye vegûhastin ku niha em wan wek folklor binav dikin.

1.2. Naveroka Folklorê

Folklor tevî ku zanîna gel e, di heman demê de motîfên çandî û netewî di hundirê xwe de dihewîne. Herwiha hemû hebûn û tunebûnên berdest re jî bitêkildar e.

¹² Ramazan Perteve, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanxaneya Awesta, 2018, Îstanbul, r.136

¹³ Celadet Alî Bedirxan, “Armanc, awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê” *Kovara Hawar* j:1, Şam, 1923, r.1

¹⁴ Ramazan Perteve, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanxaneya Awesta, Îstanbul 2018, r. 27

¹⁵ Celadet Alî Bedirxan, “Ferhengok”, *Hawar* j. 30, Şam 1941, r.749

¹⁶ Yildirim Kadri / Perteve Ramazan, / Aslan Mustafa, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneya Zanîngeha Mardin, Îstanbul, 2013, r.11

¹⁷ Celadet Elî Bedirxan, Ferhengvan, *Hawar*, hej.30, r.

Folklor li ser pirsên wekî; mirovên berê debara xwe çawa dikirin, dema birçî dibûn çî dixwarin, çawa rudiniştin, dawetên wan çawa bûn, di şahî û şînan de kirasên wan çawa bûn û wd. radiweste. Ev tiştên ku em niha di jîyana xwe de mîna tiştên kevn binav dikin, di demên berê de wateyên wan ên kûrtir jî hebûn. Lê niha tenê wekî kevne'edet tî zanîn.

Çawa ku di pênasekirina folklorê de lihevkirineke teqez peyda nebûye, di naverok û sinorê folklorê de jî hevparîyek nehatîye bidestxistin. Li gorî Celadet Elî Bedirxan “folklor tevayî adet, çîrok û stranên mîletekî ne, ew adet, çîrok û stranên ku ji nav xelkê der ketine û ketine ser hev, gihaştine nişên nû.¹⁸” Wekî ku xûya dike Celadet Elî Bedirxan di nirxandina peyva folklorê de karîgerîya mîlet û xelqê derdixe pêş.

Wladimir Prop, di kitêba xwe ya bi navê “Folklor, Teorî û Dîrok”ê de naveroka folklorê bi hemû afirinerîya gelan ve îfade dike.¹⁹ Propp di wê bawerîyê de ye ku her tiştê ku ji aliyê gel ve hatîye afirandin, çî xwarin be çî cil û berg be hemû dikevin naveroka folklorê.

Francis Le Utrey her çiqas ku folklorê weke wêjeya bi devkî hatîye neqilandin qebûl dike jî lê naveroka folklorê bi neqilandinê wê ya bi devkî sînodar nake û bawerî û tevgerên gelan jî di naveroka folklorê de rave dike. Çîrok, stranên gel, henek, çîrokên ajal, balad (mîna dengbêjan), helbestên gel, mît, bawerîyên gel, sêhr, gotinên pêşîyan, mamik, lorî, mîhrîcan û şahîyan hemûyan jî di nava folklorê de îfade dike.²⁰

Zîya Gökalp folklorê wek çandê menewî dihesibîne û balê dikêşîne li ser vegûhestina folklorê devkî. Li gor Gökalp gotinên pêşîyan, biwêj, edet û tore, stran û hwd bi rêya devkî gihaştîye îro. Loma jî Gökalp îdia dike ku folklor ji nivîsê wêdetir bi çanda devkî re eleqedar e.²¹

M.Fuat Köprülü di derbarê naveroka folklorê de dibêje her tiştê aîdê gel folklor e. Stran, çîrok, gotinên pêşîyan û destan ji ber ku rewşa rûhîyeta gelan vedibêjin, hemû jî dibin folklor.²²

¹⁸ Celadet Elî Bedirxan (Ferahengok), *Kovara Hawar*, Weşanxaneya Nûdem, Stenbol

¹⁹ Wladimir Propp, *Folklor, Teorî ve Tarih*, Weşanxaneya Awesta, Stenbol 1998, r. 11

²⁰ Francis Le Utley, “Folklorun Tanımı”, Wer. Saltık Özkan, *Kovara Milli Folklor* s. 2005, h. 65, r. 135-136

²¹ Ayşenur Nazlı Özyurt, *Ziya Gökalp'ın Halk Bilimi Çalışmalarındaki Yeri*, Teza neçapbuyî, Ankara 2008, r. 72

²² Nail Tan, “Türkiye’de Halk Bilimi Çalışmalarının 100. Yılı Kutlarken”, *Kovara Folklor ve Edebiyat*, cilt: 19, h.75, 2013/3, r. 239

Li gor Pertev Naili Boratav, folklor nêrîna civakê ya li hemberî jîyanê ye. Loma jî edet, tore û hemû hêmanên çandî yê civatê lêkolîn dike.²³ Herwiha Boratav bi xebatên xwe ve balê dikşîne ser neteweyî folklorê û naveroka folklorê jî bi hêmanên çandî yê civatê rave dike.

Her çiqas çanda devkî beşeke girîng a folklorê be jî, bi temamî nikare folklorê rave bike. Lewra li gor Gökalp tiştên ku folklorê ava dikin ragihandina wan a devkî ye. Lê belê Alan Dundes di gotara xwe ya bi navê “Folklor Çi ye?” de amaje dike ku folklor tenê nikare bi çanda devkî bê îfadekirin, ji ber ku her tişt bi axaftinê an jî bi gotinê derbasî nîşan nabe, lewra tevger û çalakî jî di folklorê de bi bandor in. Ajotina erebeyekê herwiha paqijkirina diranan bêyî gotinê, bi dîtin û tecrûbeyan derbasî nava gel dibe. Hewiha li gor Dundes ji bo çêbûna folklorê pêdivî bi komên mezin jî nîn e. Herî kê du kes jî dikarin hêmanên folklorê ava bikin. Tiştên mûhîm hevparîya di nava kom an kesayetên de ye. Loma jî ger em li ser karê hesîngeran rawestînin em ê pêrgî folklorê hesîngeran bînin û wd in.²⁴ Bi vê fikra xwe Dundes hêmanên folklorê ji komek mezin ber bi komek piçûk ve kaş dike ku herî kê du kes jî dikarin folklorê ava bikin,

Li gor Sedat Veyis Örnek di diyarkirina naveroka folklorê de şaşîyên mezin tên kirin. Lewra raya giştî naveroka folklorê bi lîstikên gelan, stranên gelan û tiştên wekî wan qebûl dikin. Lê belê folklor bi lîstik û stranên nikare bê sînorê derbasî kirin. Her tiştên maddî û manewî yê aîdê gund, bajar an komekê, naveroka folklorê tijî dikin.²⁵

Îzzeddîn Mûstafa Resûl pênaseya folklorê û naveroka wê bi hev re îfade dike. Li gor Resûl her çend îro peyva folklorê di gelek alîyên kevneşopîya netewî de tê bikaranîn jî; ji tore, cil û bergên milî yê kevin, xwarin û vexwarin jî tê de, hemû berhemên çandî, weke folklorê tê pênasekirin²⁶ li gor vê angaştê giranîya folklorê ji dewlemendîya çandî pêk tê.

Wekî ku xûya ye, ji ber mezinbûna qada wê ya xweser û sîwana wê ya berfireh tespîtkirina sînorên folklorê zehmet dibe. “Zanista gel, hîkmeta awam, xelqîyat, folklor an zargotin... Ev peyvên han, di destpêkê de parçe parçe ji bo çanda gel, ayînên mîtolojîk, adetên parastî, jîyana ‘weşîyên esîl’ mûzîk û reqsên gelêrî, biwêj, qewl, destan, efsane û çîrokan dihatin bikaranîn”²⁷. Jixwe lêkolînerên folklorê, di pênasekirina wê de bi giştî li ser zanistîbûna folklorê û têkilîya wê ya bi gel re li hev

²³ Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Folkloru*, Weşanxaneya Gerçek, Ankara, 1997, r. 9-10

²⁴ Alan Dundes, “Folklor Nedir”, *Kovara Milli Folklor*, 2005, h. 65, r. 127

²⁵ Sedat Veyis Örnek, *Türk Halk Bilimi*, Weşanxaneya İş Bankası, Ankara 1977, r. 7

²⁶ Ebubekir Gören, *Di Romanên Erebe Şemo De Folklorê Kurdî*, (Teza neçapbûyî), Mardin 2013, r. 2

²⁷ Remezan Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman-*, Weşanxaneya Peywend, İstanbul 2013, r. 32.

dikin. Lê di vir de pîrsa mûhîm ew e ku, çanda gel li ser çi tê avakirin? Loma jî di van salên dawî de pênaseya folklorê hinekî din jî tê vekirin û wek ‘bîra civatê’ tê binavkirin. Dilawer Zeraq yek ji wan kesa ye ku folklorê bi awayekî giştî wekî ‘hişûbîra hevpar û ezmûna ku tê parvekirin’ îfade dike²⁸. Bedran Hîkmet jî folklorê wekî hîs û xeyalên hevbeş²⁹ pênase dike.

Di derbarê tesbîtkirina naverok û sînore folklorê de gelek angaşt hene. Di kitêba “*Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*” de fikr û ramanên di derheqê naveroka folklorê kurdî de hatine berhevkirin û encamek hatîye derxistin. Li gor vê kitêbê naveroka folklorê ji çar (4) beşan pêk tê:

- 1- Edebîyata Gelêrî
- 2- Adet û Tore
- 3- Bîr û Bawerîyên Gelêrî
- 4- Zanyarîyên Gelêrî³⁰

Li jor jî hate dîyarkirin ku wek peyv folklor ji du peyvên îngîlîzî pêk tê; folk (gel) û lore (zanist) e. Ango ew zanista ku li ser gel dixebite. Loma jî mijara folklorê gel e, hemû tiştên ku bi mirovan re têkildar in, di her dem û di her şertî de dikarin bibin mijara folklorê. Ji ber neqebûlkirina statîkbûnê, folklor bi dem û kesayetan re jî nikare bê sînordarkirin. Folklor tiştêkî zindî ye, bi mirovan re dijî û di avakirina kesayetan de jî roleke wê ya bibandor heye. Ango folklor dize, digihîje û bi heyîneke domdar ji bo gel terxan dibe. Her tiştên maddî û manewî di vê babetê de cih digirin. Di serî de ji hemû motîffên çandî û netewî bigrin heta bi hemû afirederbûna gelan, wek folklor tê pênasekirin. Ji şahîyan bigrin heta şînan, ji xwarinan bigrin heta cil û bergan, ji lawayan bigrin heta nifiran, hemû tişt dikevin bin bask û qadên folklorê. Ji ber vê yekê jî divê em vê têgehê ji wateya wê ya bisînor veçirînin û wê bi wateya wê ya berfireh û rasteqîn binirxînin.

1.3. Têkilîya Folklor û Disîplînên Din

Folklor perçeyek ji jîyana mirovan e. Bo wê ye ku hemû zanistên bi jîyanê re eleqadar dibin, di heman demê de xwe digihînin folklorê wan jî. Li gorî Richard M. Dorson sehayên wek zimanzanî, erdnigarî, mûzikolojî, civaknasî û heta derûnnasî jî bi folklorê ve pêwendîdar in.³¹ Ji ber ku her diçe folklor xwe adapteyê demê dike û li gor

²⁸ Dilawer Zeraq, “Wek Mîrateya Neteweyî Folklor û Kovara Jînê”, *Kovara Zarema*, h. 8, Diyarbakir 2016, r. 59.

²⁹ Bedran Hikmet, *Teorîyên Folklorê*, Weşanxaneya Lîs, Amed 2016, r. 8

³⁰ Ramazan Pertev, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneya Awesta, İstanbul 2018, r. 31-32

³¹ Richard M. Dorson, *Folklor û Teorîyên Folklorê Îroyîn*, Weşanxaneya Awesta, Stenbol, 2017, r. 31

konjoktûrê xwe digihijîne dîsîplînên din loma jî bi zanistên cûrbecûr re jî di nav têkilîyeke xûrt de ye.

Yuri Sokolov jî wek Dorson difikire û li ser ve zêde dike ku folklor tevî ku bi hunera devkî re eleqedar e di heman demê de bi hemû hunerên ku hatîne afirandin re jî di nav têkilîyê de ye. Hunerê wek şano, dawet, lîstik, stran, vegotina devkî û wd. in jî bi dîsîplîna folklorê re tîne nirxandin.³² Xebatên ku di kurdî de hatine kirin jî heman rêç domandîne. Li gor kitêba *'Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî'* têkilîya folklorê bi dîrok, etnolojî, zimannasî, erdnigarî, dêrûnnasî, civaknasî, hiqûq, şûnwarnasî (arkeolojî), pedagojî û bi edebîyatê re heye.³³ Loma jî xebatên ku bîne kirin divê ji nêrîneke giştî zêdetir, xwe bispêren kitekitan. Ger em li ser mînakê biçin, dema em li zimanê miletekî û bikaranîna wê binhêrin, em ê ji aliyê jîyana wan ve gelek agahîyan hîn bibin. Li ser meseleyê wextê di zimanê wan de peyvên di derheqê çîya, kevir, zinar, xweza û wd. in de zêde bin, em ê tîbigihêjin ku jîyana wan nêzî çîyayayan e. An jî di çîrokekê de leheng her dem li keştîyan siwar bibe em ê bizanibin ku erdnigarîya wan nêzî behrê ye. Loma jî divê dîsîplîna antropolojîyê jî baş bê zanîn. Herwiha her tiştên ku wan afirandîye li gor dîsîplînên erdnigarî, antropolojî, civaknasî û hwd. in jî divê bê lêkolînkirin. Lewra bîyê fêhmkirina sedemên derveyî û hûndirîn analîzkirina folklorê dibe ku negihîje armanca xwe.

Wekî em dizanin pêkhatiyên folklorê ne tenê mirov in; ligel vê axa herêmê, rewşa hewayî ya welatî, metal û dewlemendiya erdnigariyê û herwiha nebat û heywanên xwezayê jî di avakirina folklorê de roleke mezin dileyzî. Ji ber ku ev tiştên ku rolên wan hene, ne qetî ne û bi demê re dikarin biguherin, em nikarin folklorê bi dem û kesayeta re sînordar bikin. Lewra dinya diguhere û pê re jî rewş û halê erdnigariya ku mirov tê de dijîn, diguhere. Loma jî em dikarin bibêjin ku folklor jî wek mirovan, nebatan û ajalan zîndî ye û av û xwarina wê jî binehişî û baweriyên gel e. Atmosfera ku folklorê ava dike, ew atmosfer e ku kesayeta mirovan jî ava dike. Jixwe di xebatên folklorê de yek ji pîrsgirêk bi vê zîndîbûnê re tîkîldar e. Lewra çawa ku jîyan her diçe xwe nû dike, folklor jî diguhere û terz û teşeyên nû hildide, divê bi heman şiklî rê û rebazên folklorê jî xwe nû bikin. Ne ku bi pîvanên berê, divê bi pîvanên nûjen jî bê nirxandin. Çimkî folklor ne tenê gotin û edetên berê yê di paşxaneyê de ne. Wekî ku

³² Yuri M. Sokolov, *Folklor: Tarih ve Kuram*, Weşanxaneya Geleneksel, Ankara 2009, r. 14

³³ Kadri Yildirim / Ramazan Pertev / Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneya Zanîngeha Mêrdînê, Istanbul 2013, r. 32-38

Sokolov jî destnîşan dike tevî ku folklor dengê rabirdûyê ye, ligel vê di heman demê de dengê berz ê îroyîn e jî³⁴

1.4. Erka Folklorê

Di derheqê erk û armanca folklorê de gelek angaşt û nêrîn hene. Di vî warî de xebatên ku hatine kirin piranî di bin hûkmê lêkolîner de mane. Loma jî fikr û pênaseyên ji hev gelek dûr û cîyawaz derketine meydanê. Ya rastî di heyamên berê de folklor wekî zanistekê nedihat qebûlkirin û bala gelên Ewropî jî zêde nedikişand. Lewre berê de xebatên gel nezan/karker/nebajarî dihat qebûl kirin û qiymetê wê jî zêde nebû. Lê bi bilindbûna netew-dewletan bi taybetî jî bi şoreşa Frensî re, bala zanyarên Ewropî bêhtir çû ser folklorê û di vê mijarê de xwe pêş xistin. ‘Folklor wek beşeke zanyarî ji aliyê Ewropîyan ve ji bo lêkolînkirina gelên xwe hatiye afirandin³⁵. Jixwe yekemîn xebatên li ser folklorê li Ewropayê bi destê zanyarên wê derê derçûn. Di van xebatên destpêkê de folklor ji koka xwe ya kultûrî hat derxistin û ber bi sazkirina netewetiyê ve hate kişandin. Her çiqas ji aliyê îcrakerê folklorê ve ev xisleta wê ya netewetiyê baş nedihat zanîn û wek kevnadetan ji bo geşkirina şevbihûrkan dihat bikaranîn jî piştî sedsala 19an ji aliyê zana û xwendeyan ve ev rol û ruhê wê yê neteweyî hate ferqkirin û bo avakirina miletî hate şixulandin.

1.5. Folklor û îdeolojî

Li gor Proop folklor dîsîplîneke îdeolojîk e.³⁶ Lê divê baş bê zanîn ku îdeolojîkbûna folklorê ne ku ji folklorê, ji atmosfera serdemê ava dibe³⁷. Proop di avakirina folklorê de balê dikişîne fonksiyona konjoktorîya civatê. Lewre nîrxên civata statîk nîn in û bi demê re û bi tecrûbeyan re diguherin. Lê di vir de tiştêkî mûhim heye, ew jî neguherbûna koka folklorê ye. Li ser mînakê di çîrokekê de ‘revandin’ heye. Ev ‘revandin’ naguhere, kes dîsa tên ‘revandin’. Lê vê carê sedema ‘revandinê’ diguhere. Kok heman dibîne û pê re jî tiştên nû tê de zêde dibin an jî kêr dibin. Çawa ku Proop di berdewamiya wê de mînaka ejderhayan dide ku berê jin direvandin, niha jî Urisa direvînin. Çimkî fikrên nijadî derketine holê û bandor li ser civatê jî kirine û di prosesa

³⁴ Yuri, Sokolov, *Folklor: Tarih Ve Kuram*, Weşanxaneya. Geleneksel, s. 2009. r. 21

³⁵ Avdo, Karataş, “Folklor û Afirandina Çanda Niviskî”, *Kovara The Journal Of Mezopotamian Studies, Zivistan*, s. 2017, r. 34

³⁶ Vladimir Propp, *Folklor, Teori ve Tarih*, Weşanên Awesta, İstanbul 1999, r. 9-10

³⁷ H.b.r, r. 9-10

xwe de rengekî nû hildane. Ji ber vê yekê jî îdeolojîk e û beyî ku ji alîyê yêkî/ê ve bê guhertin ji alîyê hemû civatê ve tê guhertin.

Proop di vê mijarê de hêj pêş de diçe û folklorê aîdê çînên bindestan dibîne.³⁸ Ev fikra hane ji bo xebatên folklorê asoyeke nû vekir. Lewra êdî xebatên ku dihatin kirin di deverekê de asê nediman, hemû sînor hildidan û di nava hemû mirovahîyê de hevparîyek zêft dikirin. Lêkolîner, li deverên cûda li pey heman mijarê diketin. Bî vî awayî di navbera civatên ji hev gelek dûr de heman hîs û xeyal peyda dikirin. Yurî Sokolov jî bi heman rêçê dişopîne û pê de diçe, ew folklorê wekî îfadekirina nefret û hêrsa gundî û karkeran a li hember esîl û axayan dibîne³⁹. Li gor Sokolov di avakirina hêmanên folklorîk de ji serdestan zêdetir karker/gundî çalak in. Rûdanên bo dewletan/serdestan/ arîstokratan tu tiştekî îfade nakin, berevajî wê ji bo gundîyan bandorên qerase pêk tînin. Her wiha Sokolov dema erk û armanca folklorê dîyar dike yek jî peywira folklorê, bi hişyarkirina hestên netewperwerîyê di nava gel de îfade dike⁴⁰.

Bi giştî ev fikr û ramanên di derheqê erk û fonksiyona folklorê de bi rêya rabirdûyê û mirovahîyê ji nû ve li gor pergala xwe ava bikin tevgerîyane. Ji ber ku yên van ritûelan dikin hê jî gundî bûn, loma jî bi şoreşa Sovyetê re qîmeta gundîyan derkete pêş. Ne tenê Êrisat, Almanya jî yek ji wan netewa ye ku bi vê polîtîkaya xwe bûye sedema gelek rûdanên xirab. Dewletên din ên wek Emerîka, Frense û netew-dewletên din jî bi haybûna girîngîya folklorê ve dest bi xebatên vî şiklî kirine û folklorê ji bo gihaştina meqsedên xwê yên etnîk wek amraz bikaranîne. Ji Hîtler bigre heta sovyeta Rusyayê jî di xebatên xwe yên folklorê de ev tişt kirine armanc.

Li gor Mithat Sancar civak bi rêya cejnan, efsaneyan, merasîman û herwiha dûbarekirina ritûelan ku ew jî beşek ji naveroka folklorê ne, bi nasnameya xwe hay jê çêdibe⁴¹ Bi vê fikrê jî rola hişyarkirina folklorê derdikeve pêş.

Ramazan Pertev di tespîtîkirina erka folklorê de balê dikişîne ser dersdayîna çîrokan. Lewre çawa ku di hin çîrokan de xeletîyên şexsî tînin ziman, herwiha em carnan rastî rexne û normên civakî jî tînin. Ê di berdewamîya vê fikra xwe de Çîrokên kurdî yên wek Şenge û Penge, Kêz Xatûnê, Dîkîl Axa, Kejê, Keçelo, Fatfatîlok, Pîra Mirovxer, Hutê Heftserî û hwd. in dide⁴². Li gor Pertev di naveroka van çîrokan de şîretên civakê veşartîne. Loma jî yek ji erka folklorê şîretkirina mirovan bi xwe ye.

³⁸ H.b.r, r. 12

³⁹ Richard M. Dorson, *Folklor û Teoriyên Folklorê Îroyîn*, Weşanxaneya Awesta, İstanbul, 2017, r. 118

⁴⁰ Yuri M. Sokolov, *Folklor: Tarih ve Kuram*, Weşanxaneya Geleneksel, Ankara 2009, r. 34

⁴¹ Mithat Sancar, *Geçmişle Hesaplaşma*, Weşanxaneya Ayrıntı, İstanbul 2010, r. 46

⁴² Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok, Destpêka Pedagojiya Kurdî*, Weşanên Doz, İstanbul 2009, r.93

Ahmet Aras di qada folklorê de giringîyê dide rola dengbêjan. Li gor Aras di navbera folklor û dîrokê de danûstandinek heye. Ji bo piştrastkirina têkilîya folklor û dîrokê jî kilamên dengbêjîyê çavkanîyên xurt in. Herwiha bi mînakên stranan amaje pê dike ku dengbêjîyê erka kitêbên dîrokî pêk anîye. Di derbarê vê meselê de Ahmet Aras wiha dibêje; “bûyerên ku di kilamên dengbêjan de hatine vegotin, ji sedî sed rast in. Mînaka vê yekê ya herî mezin jî şerê mala Ûsivê Seydo ye. Aras dibêje piştî ku min guhdarîya kilamê kir, ez li pey belgeyên fermî ketim. Hin belge ketin destê min de û min dît ku kilam û belge wek hev in. Di ser de hûrgilîyên kilamê zêdetir in. Heger hûn ji min bawer nakin, nevîyên wan jî sax in, herin jê bipirsin. Ew dikarin gotinên min piştrast bikin”⁴³. Wekî ku xuya dike Ahmed Aras di wê bawerîyê de ye ku em kilaman ku ev jî yek jî hêmanên folklorê ye, dikarin wek dokûmentên dîrokî bihesîbînin.

Avdo Karataş di wê fikrê de ye ku folklor qeydkirina çanda devkî, şênber û razber a kurdî ye⁴⁴. Loma jî xizmetkarîya çanda niviskî ya kurdî dike. Wekî ku xuya dike Karataş ji alîyê sazîkirin û bilindkirina wêjeya niviskî ve li folklorê dinêre.

Willian Bascom jî ji bo dîyarkirina erka folklorê, xebatên gelek kêrhatî kirîne û bi giştî çarçoveyek wiha xêz kirîye. Li gor Bascom çar peywîrên sereke yên folklorê hene.

Yekem peywîra folklorê, ji bo xweşderbaskirina demê ye.

Dûyem peywîra folklorê, tradîsyona çanda devkî xurt dike û metirsîya windabûna wan ji holê radike. Bi awayekî giştî folklor erka mamostetîyê tîne cih.

Sêyem peywîra folklorê, derbirîna hestên ku hatine çespendin û tevgerên ji alîyê civatê ve hatine qedexekirin in.

Çarem erka folklorê, edet û toreyên civatê zindî dihêle, bîra civakê diparêze û wê vediguhezîne ji nifşên nû re.⁴⁵

Bi van fikr û nêrînan jî eyan e ku folklor di gelek qadên jîyanê de xwedî erk û rolên girîng in. Loma jî divê bê zanîn ku erk û armanca folklorê ne tenê ji bo derbasbûyîna şevbihêrkan an jî aşkirina zarokan e. Bi saya vê têgehê jihev cudabûna neteweya jî xwe dide der. Çimkî folklor bi xwe re dikare neteweyek û li hemberî wê jî ‘yê din’ ava bike. Lewra civat raborîyê di serî de bo naskirina takekesîya xwe

⁴³ Tekîn, Çiftçi, *Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê: Kilam û Jin*, Weşanxaneya Nûbihar, s. 2014, r. 37

⁴⁴ Avdo Karataş, ‘Folklor û Afirandina Çanda Niviskî’ *Weşanxaneya The Journal Of Mezopotamian Studies, Zivistan*, s. 2017, r. 35

⁴⁵ Metin Ekinci, *Halk Bilgisi Folklor Derleme ve İnceleme Yöntemleri*, Weşanxaneya Geleneksel, 2007, r. 125-126

bikartîne⁴⁶. Jixwe ji ber vê taybetmendîya xwe ya dîyarde, folklor, di sedsalê dawîn de ji bo armancên polîtîk wek amrazekê hatîye bikaranîn.

2. Roman

2.1. Roman Çi Ye

Roman cureyeke wêjeyî ye ku koka xwe ji ‘peyva ‘lingua romana’ latînî û ji peyva ‘romanz’ a frensîzî hildide’. Wexta ku nû peyda dibe, ji ber bandora helbestê lawaz û qels dimîne. Lê bi derbasbûna demê re teşe, terz û naveroka wê hate guhertin. Her çiqas di destpêkê de bi awayekî xurt nehatibe pêşwazîkirin jî, piştî xwedîderketin û cîgirtina wê ya li şûna helbestê, ji alîyê komên mezin ve hate pejirandin.

Roman bi xisleta xwe peyveke bêdawî ye ku niha em nikarin jê re sînorekî dîyar bikin. Qebare romanê û herwiha destpêk û dawîya wê heta kuderê ye bi awayekî qetî nayê zanîn⁴⁷ Loma niha bi navê postmodern cûreyeke nû ya romanê vejîyaye. Lewra her ku diçe teşe û naveroka xwe li gor qaîdeyên cîhanê ji nû ve dirêse. Helbet li vir rola hunermendan jî heye ku mora xwe di hibra xwe de destnîşan dikin.

Roman ji ber heyîna taybetmendîya xwe ya pirwate ji alîyê gelek kesan ve bi çavderîyên cuda hatîye şîrovekirin. Loma jî, ji bo romanê pênasekirineke teqez nehatîye kirin. Ya rastî pênasekirina romanê, piçekî jî bi tespîtîkirina derketina wê re eleqar e. Bi giştî roman wek cûreyeke serdema modern tê qebûlîkirin. Wekî hemû vegotinên din, roman jî xwedîyê mantiq, binyat û sazîyeke taybet e⁴⁸.

Eliot, romanê wek derbirîna demê dibîne⁴⁹. Wekî Eliot amaje pê dike roman eynika dema xwe ye, lê ne ku tenê bûyer an tişteki yekta vedibêje, li kêleka wê awir û hîsên nû bi xwîneran re peyda dike. Bi romanê ve haya me ji nêrîn û çavdêrîyên dîtir çêdibin. Nivîskar bi wateyê re mijûl dibe. Kesê ruh û lîbas li peyvan bar dike nivîskar bi xwe ye. Ger nivîskar ruh û lîbas li peyvan bar neke tu wateya peyvan nabîne û wê wek xêz an dengê belavela bibûna⁵⁰. Roman tevî ku bandorê li hişmendîya mirovan a hûndirîn dike, bêgeha wê ya jîyanê jî ji nû ve saz dike.

⁴⁶Jan Assman, *Kültürel Bellek*, Weşanxaneya Ayrıntı, İstanbul 2018, r. 142

⁴⁷ Selçuk Çıkla, “Romanda Kurmaca Ve Gerçekçilik”, *Kovara Hece* 2002, h. 65/ 66/ 67, r. 111

⁴⁸ Mehmet, Tekin, *Roman Sanatı – 1*, Weşanxaneya Ötüken, s. 2018, r. 9

⁴⁹ T.S. Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, Weşanxaneya Kültür ve Turizm Bakanlığı, s. 1983 r. 67

⁵⁰ Abraham, H. Lass, *100 Büyük Roman - 1*, Weşanxaneya M. E. B, 1998, r. 13-15

Li gor Remezan Alan roman vegotina serborîya şexsan e û di vê pêvajoyê de destnîşankirina guherînên wan e.⁵¹ Alan balê dikêşe ser serborîyê ku bi awayekî qewimîye lê herhal divê lê bê zêdekirin ku roman her çiqas bi rastîyê re têkildar be jî, ne tenê rûdanek qewimandî, divê li ser honakeke ku ji alîyê nivîskar ve hatîye sazîkirin, bê avakirin. Lewra di koka xwe de xeyal û afîrederîyê dihewîne û hemû nivîsê li ser vê bingehê disewirîne. Tevî ku rastîyê vedibêje di heman demê de karakter, mekan, dem û rewşên xeyalî jî dihewîne. Ango romannûs ne ku wêneyê jîyanê digire, belkî wêneyên jîyanê ji nû ve xêz dike.

Wekî li angaştên jor jî eyan e roman rastîyê bi çavderîyeke xweser dinirxîne û li gor perspektîfa xwe dişayesîne. Tevî ewqas taybetîyên xwe yek jî balkêşbûna vê cûreyê ew e ku, di romanê de hîyerarşîya civakê ku li her derê dinyayê bi şêweyeke taybet xwe nîşan dide, têk diçe. Ango hemû pêkhateyên civatê dibê ku di jîyanê de tu carî liqayî hev nebin jî di rûpeleke romanê de têne rûdinin cem hev, diaxifin û hewce bike şer jî dikin.

Hemû cûreyên wêjeyê dikarin xwe di romanekê de vebêjin. Helbest, rexne, ceribandî û wd. in dikare di qada romanê de cî bigirin. Bi vê xisletê ve roman dişibe sîwaneke ku bi saya wê, cûreyên din ên wêjeyê, ji alîyê romannûs ve bi ser navê karakteran derdibirin.

Li dor van fikr û pênaseyan ger em kurteyî bibêjin, roman xisletan dide nasandî, hizran radigihîne, fikran pêşkêşî xwendevanan dike. Mijarên xwe jî serborîyên mirovan, têkilî û rewşa wan, bûyer û dîyardeyên civakî hildide û bi awayê ku nêzî rastîyê yan jî di nava baregeheke sêwirî de vedibêje. Ew tişteki veşartî nahêle û dîmena ku dibîne bi hizra xwe bi awayekî eşkere dinirxîne. Di romanê de sînor tune ye. Tişteki ku di jîyana rastîn de hebe û nikaribe derbasî romanê bibe nîn e. Ji nava van fikr û pênaseyan, romanûsên kurd jî para xwe hilgirtine û di wê çarçoveyê de berhem nivîsandine.

2.2. Folklor û Roman

Bi piranî hêmanên folklorîk him li dora bawerîyekê ava dibin him jî di xeta jîyana rasteqîn de tîn tetbîqkirin, loma zewqeke wê ya manewî heye ku dihêle derdora jîyanê bipêçe. Bi saya xebatên li ser folklorê, ligel derfetdayîna derxistina tespîtên

⁵¹ Remezan, Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman*, Weşanxaneya Peywend, s. 2013, r. 87

sosyolojik ên di derbarê jîyana kesên xwedîyê folklorê de, di heman demê de derbarê jîyan û bawerîyên wan de jî agahîyên gelek bi qîymet tên peydakirin.

Ji ber xisûsîyeta xwe, gotin dikare biguhere û ji alîyê hin qewetan ve dikare were sûtîstîmkirin, loma jî ewle nîn e. Ji ber vê yekê jî hewceyê nivîsînê ye, da ku esasa xwe radestî hêza ne-xwezayî neke. Tam jî di vir de roman rola xwe dilîze û ji ber rewacbûna xwe ya di hemû dinyayê de, wek celeba herî kêrhatî derdikeve pêş. Roman û celebên din ên nivîskî rola qeydkirina cewherên rabirdûyê listîne. Roman bi qeyidkirinê, atmosfera berê ji nû ve pêşkêş dike û adapteyê roja îroyin dike.

Li gor Remezan Pertev pêwendîyeke xurt di navbera folklor û edebîyatê de heye. Lewra wek çîrok, efsane, destan, stran, xebatên folklorîk ên pêşî bi pîranî li ser berhemên edebîyata gelêrî îspata vê yekê dikin⁵². Îcar ji ber ku roman di van salên dawî de yek ji wan celebên e ku herî zêde tê bikaranîn, ev hêmanên folklorîk jî di romanê de zêdetir şax vedidin.

Remezan Alan jî balê dikşîne ser vê meseleye û wiha dibêje; “di dewra modern de dema nivîskar qeneat pê anî ku folklor ne bawerîyên batil in, lê cewhera netewî ne û her wiha dîtin ku em di serdemeke muzaffer a romanê de dijîn, bêşik ev hemû bi hev re dê îştîyaqa romannûsînê teswîr bikin”⁵³. Alan, di wê bawerîyê de ye ku di serdema romanê de, wextê ku qîmeta folklorê hate zanîn, wek îhtîyaceke xwezayî, hêmanên folklorîk herî zêde di romanên de hatin bikaranîn.

Di vê mijarê de Vladimir Propp pêde diçe û folklorê wek malzaroka wêjeyê qebûl dike. Li gor Propp di serdemên kevn de wêje bi temamî ji folklorê pêk dihat.⁵⁴ Di berdewamîya angaştî xwe de Propp mîtên Gilgamiş û mîtên Yewnanê ên antîk wek mînak nîşan dide. Herwiha beşekê jî ji têkilîya folklor û romanê re vediqetîne û balê dikşîne ser nêzîkahîya çîrokên gel û cûreyên romanê. Lê gor angaştî Propp bi qasî ku hevparîya folklor û romanê heye cihêbûna wan jî heye. Yek jî ferqa çîrokên gel û romanê ew e ku xwedîyê çîrokan ne dîyar e, lê nivîskarên romanên li meydanê ne.⁵⁵

Di serdema modern de hema bêje hemû romannûsên cîhanê di berhemên xwe de berê xwe dane folklorê û malzemeyên berê ku bi tefsîreke modern şîrove kirine û bi naverokeke dewlemend berpêş kirine. Di vê mijarê de T. S. Eliot jî hemfîkîr e û ji romanên cîhanê minakekê dide. Eliot di wê bawerîyê de ye ku Romana James Joyce ya

⁵² Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanxaneya Awesta, İstanbul s. 2018, r. 32

⁵³ Remezan Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman*, Weşanxaneya Peywend, s. 2013, r.54

⁵⁴ Vladimir Propp, *Folklor, Teori ve Tarih*, Weşanên Awesta, İstanbul 1999, r. 26

⁵⁵ H.b.r, r. 54

bi navê Ulysses li ser bingeha Odyssey ya Homeros hatîye avakirin⁵⁶. Bi vê mînakê jî xûya ye ku wek celebek folklor her çiqas xwe bigihîjîne demên kevn jî, niha ji ber rewacbûna xwe, roman di serî de, tesîr li hemû celebên modern dike.

Di vê meseleyê de di wêjeya tirkî de jî em pêrgî gelek mînakên bi vî rengî tên. Fatih Tepebaşlı di kitêba xwe de cûreya romanê wek ‘destanên burjuvayê’ binav dike⁵⁷. Lewra berê bi gotinê destan dihatin afirandin, lê di serdema modern de nivîs hûkmê li gotinê dike. Ew destanên kevn îro cihê xwe didin romanên klasik.

Roman yek ji cûreyên edebîyata nûjen e ku di destpêkê de ji nava kakilê gencineya çanda gel ya folklorîk dertê. Jixwe wextekî roman wek metnên ji aliyê gel ve hatine nivîsîn dihat qebûlkin. ⁵⁸. Lê pişt re bi honak û taybetmendîya xwe ya xweser ve û herwiha tîp û lehengên piralî ve roman xwe ji metnên gel dûr xist û wek şeweyeke nû hat qebûlkin.

Yaşar Kemal ji bo nîşandayîna têkîlîya folklor û romanê mînakeke xurt e. Jixwe wekî tê zanîn di hemû berhemên wî de folklor bi awayekî qewî derdikeve pêş. Osman Şahin dîyar dike ku romana Yaşar Kemal a bi navê ‘Filler Sultanı ile Kırmızı Sakallı Karınca’ (Şahê Dezî û Morîya Rî Sor) bingeha xwe ji gotina ‘dijminê te morîya kulek be jî bitirse’ hildaye⁵⁹. Ji xeynî vê mînakê ekoleke bi navê Ekola Anadolûyê di wêjeya tirkan de heye ku raste rast xwe dispêrnê civatê ango folkora civatê. Romannûsên vê ekolê vedigerin nava çanda gelê xwe û ji folklorê wan îstîfade dikin. Li gor Berna Moran du taybetîyên ekola Anadoluyê ya romanê hebûn: Serîrakirina li hember sîstema heyî û îstîfadekirina ji folklorê ya edebîyata gelerî⁶⁰.

Herwiha dema ku kitêbên Mehmet Uzun werin raçavkirin, dê bê dîtîna ku di hemû romanên wî de nîşaneyên folklorê xwe didin dest. Mehmet Uzun di hemû romanên xwe de nîşaneyên folklorîk bi awayekî xurt dirijîne ser berhemên xwe. Herwiha Uzun, di romanên xwe de cî dide karakterên aîdê çanda gelêrî û bi vî awayî romanên xwe bi van karakteran dixemilîne.

Di encama van xebatan de em dikarin bibêjin ku roman, ji nû ve xwendina mîrata folklorê ye (di vir de qesta me romanên folklorîk in). Çavkanîya xwe ji

⁵⁶ T.S, Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, Weşanxaneya Kültür ve Turizm Bakanlığı, s. 1983, r. 67

⁵⁷ Fatih, Tepebaşlı, *Roman İncelemesine Giriş*, Weşanxaneya Çizgi, s. 2012, r. 7

⁵⁸ Fatih, Tepebaşlı, *Roman İncelemesine Giriş*, Weşanxaneya Çizgi, s. 2012, r. 17

⁵⁹ Ji bo zêdetir agahî, <http://yeniedebiyat.blogcu.com/turk-edebiyati-ve-folklor-iliskisi-osman-sahin/367120>, 06.10.2018

⁶⁰ Remezan, Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman*, Weşanxaneya Peywend, s. 2013, r. 61

qencîneya wê hildide, xwe digihijîne esasa çîrokên û bûyerên wê av dide dema ku zîl dide, forma modernîteyê lê dike û ji nû ve tiştên gel diafirîne.

3. Romana Kurdî û Folklor

3.1. Lênêrîneke Giştî, Folklor û Romana Kurdî

Folklor mehsûlên hevpar ên civakê ne. Piraniya wan ji aliyê kî/kê ve kengî û bi çî awayî derketine nayên zanîn. Ev mehsûlên civatê, ji ber nezanîna xwediyê wan wek ‘anonîm’ hatine binavkirin. Gotinên pêşîyan, biwêj, mamik, stran, lorîn, girî, stran, listik û wd.in hemû jî di demên berê de bo îfadekirina hîs û xeyalan wek amraz hatine bikaranîn û ev gencîne derketîye holê. Bi giştî van hemû keresteyan ji hişmendîya civakê re xizmet kirine. Xemgînî, bextewarî, hêvî, kêfxweşî yanê halêrûhîyet û nirxên wan di formên destan, çîrok û efsaneyan de xwe dane der û di derbarê têgihîştina civakê de gelek agahî dane me. Ji ber vê yekê jî, wêjeya modern ji bo fêmkirina paşxaneya civakê qîmeteke mezin dide folklorê.

Remezan Alan di kitêba xwe ya folklor û romanê de, di nav edebîyata kurdî de 16 kitêp hildane û yeko yeko bi paşxaneya folklorê ve nirxandine. Li gor Alan “şewqa ku ji zargotina kurdî dipengize (hafêzeya kollektîf, nasnameya netewî, çandeke qedîm hwd.) li ser rûyê esmanekî derbasî forma romanê dibe.”⁶¹ Alan bi vê tespîta xwe balê dikêşîne ser dewlemendîya hişûbîra civakê ku di serdema modern de xîzmeta civakê di forma romanê de pêktîne. Bi gotîneke din folklor nemirîye, lê form gûhertîye û di şiklê cûreyên modern de xwe dide der.

Gelek eyan e ku romana Kurdî heya ji dest hatîye, ji kelepura Kurdî sûd wergirtîye. Gelek çîrok, roman û şano yên ku niha aîdî serdema modern tînin li ser koka folklorê şîn bûne îspata vê yeke ne. Mehmet Uzun yek ji wan nivîskarane ku bi awayekî eşkere di romanên xwe de şewqa folklorê kurdî dide dest. Uzun bi sedema hebûna keresteyên folklorîk ên di romanên xwe de, xwe şanaz dihesîbîne. Bi taybetî jî nirxeke mezin dide dengbêjan û di gelek cîhên romanên xwe de behsa keda wan dike. Li gor Uzun wejeya modern encax bi hevkarîya rabirdûyê pêk tê û di serî de romannûs, hemû kurd deyndarên çanda devkî û dengbêjan e.⁶²

Folklor ji bo avakirina hişmendîyeke netewî ya kurdan jî roleke sereke dilîze û tesîra wê jî gelek e. Haşîm Ahmedzade li ser vê xalê radiweste û dibêje “bi rastî jî romana kurdî ji bo ku kurd xwe wek neteweyekî ku li ser kokên xwe yên çandî cî girtîye

⁶¹ H.b.r, r. 84

⁶² Mehmet Uzun, *Bir Dil Yaratmak*, Weşanxaneya Gendaş, 2005, r. 25

‘ teheyyûl ‘ bikin bûye çavkanîyeke girîng’’.⁶³ Û karîgerîya folklorê ya li ser romana kurdî bi vî awayî destnîşan dike.

Bi awayekî giştî em digihêjin vê encamê ku di navbera vegotina devkî (di vir de qesta me hêmanên folklorêne ku bûne yekem çavkanîyên nivîskî) û nivîskî de têkilîyeke pir bi hêz heye ku yekem nivîsên destpêkê li ser vê şopê hatine avakirin ku îspata vê yekê dikin. Lewra lêkolîna wêjeya devkî ji wêjeya nivîskî nikare were cihêkirin, herwiha di navbera van herduyan de jî herdem danûstandin hebûye û hê jî heye⁶⁴. Gelek berhemên kurdî jî di vî warî de îspata vê yekê dikin. Di derheqê vê meseleyê de Hecîyê Cindî wiha dibêje: “Çaxa edebîyata kurdî hêdî hêdî, kirasê xwe guhert û ket qalibê nivîskî de, berî her tiştî, hingê klasîkên folklorê kurdî, mîna Memê Alan, Sîyamend û Xecê, Dimdim, Zembilfiroş, Binevşa Narîn û Cembelîyê Hekarê, qulipîn ser kaxizan û hatin nivîsîn. Ev nimûneyên pêşîn ên edebîyata nivîskî û pexşanê ne⁶⁵. Wekî ji mînakên Hecîyê Cindî de jî dîyar e, yekem nivîsên ku di serdema modern de hatine tomarkirin ji edebiyata klasîk û xebatên folklorîk bûn. Loma em dikarin bibêjin ku; destpêka pexşana kurdî xwe spartîye folklorê kurdî û yekem tiştên ku hatine nivîsîn jî piranî ji folklorê kurdî sûd wergirtine.

Wekî xûya dike wêjeya kurdî ya nûjen di destpêkê de pala xwe daye koka kevneşopîya kurdî. Kelûpûra milletê xwe bi rengê modernîteyê şîrove kirîye. Herwiha em bi rehetî dikarin bibêjin ku bi saya edebîyata devkî ya kurdan, gelek kereste gihiştîne hetanî rojên îroyîn. Tarîxa wan, çanda wan, edet û bawerîyên wan, keleş û kevneşopîyên wan û wd.in, bi rêya edebîyata devkî, ji mirinê felîtîne. Lê îro edebîyata devkî nikare xwe mîna berê mihafeze bike, ji bo vê jî divê xwe zû bi zû adaptayê nivîsê jî bike. Lewra dewr û zeman digûhere û her wextê tê nîş digûherin, dem bîra mirovan dikûje û her ku diçe ber bi windabûnê ve dibe. Loma jî divê formên nivîsan hilbide. Ji ber rewabûna wê di hemû dinyayê de roman bêhtir guncaw dibe. Ev serdem qîymeta gotinê bînpê dike û ger neyê nivîsin wan ji holê radike, ji bo vê jî hewcedarê qelemê ne. Loma jî wexta ku rewşenbîr ruhê vê dewra modern ferq kirine, berê xwe dane hêmanên folklorîk. Wekî ku Kamûran Elî Bedîrxan gotî, “edebîyata welatan ew edebiyat e ku ji jîna millet, ji hiş û dilê wî, ji çîrok û çîrçîrokên wî, ji lajeyên wî hiltê”.⁶⁶ Û pêre jî bi

⁶³ Haşim Ahmedzadeh, *Romana Kurdî Û Nasname*, Wer. Fahriye Adsay, Weşanxaneya Avesta, İstanbul 2011, r. 17

⁶⁴ René Wellek û Austin Warren, *Edebiyat Teorisi*, Weşanxaneya Dergah, s. 2013, r.54

⁶⁵ Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiya Kurdî*, Weşanxaneya Ithaki, s. 2007, r. 38

⁶⁶ Kamuran Bedîrxan, “Edebiyata Welatî”, *Kovara Hawar*, s. 1932, j. 1, r. 5

hewla derxistina cewherên folklorê tevgerîyane. Lê di pêşveçûna zimanê kurdî de ji xebatên kollektîvî zêdetir xebatên takekesî berbiçav in⁶⁷. Loma jî lawaz bûn.

Wekî ku em dizanin di demên berê de çîrok, destan û efsane pîranî ji bo derbaskirina şevbihûrkan dihatin vegotin û gel bi wan şeva xwe derbas dikir. Lê belê di serdema netewperwerîyê de ev rewş gûherî û divê helbestvan ne ku bo razanê divê bo hişyarkirinê helwesta vebêje.⁶⁸ Herwiha roman ne ku ji bo xwendinê bête nivîsîn, belkî divê ji bo derbirîn û peydakirina fikreke nava civatê were nivîsîn. Loma jî ew kerseteyên berê yên di nava civatê de pal dane û tenê bo zewqhildanê dihatin bikaranîn, êdî ji bo çêkirina fikrek û hişmendîyeke nû tê bikaranîn. Loma jî di konaxa modern de rewşenbîrên civatê berê xwe didan kerseteyên folklorîk, wan ji nû ve xwendin û hêmanên netewî destnîşan kirin. Di kurdî de jî heman tişt gergûhez bû. Rojname û kovarên kurdî berê xwe dan folklor û destxetên kurdî û di rojname û kovarên xwe de bang li kesan kirin ku bila her kes biçe gundan û li ber kal û pîran rûnê û çîrok meselokan berhev bike.

3.2. Di Romana Kurdî De Rengvedana Folklorê

Wekî Haşîm Ahmedzade jî destnîşan dike, di pêşketina cûreya romanê de rola rojnamevanîyê gelek e⁶⁹. Herwiha di destpêkê de roman, wek tefrîka di rojnameyan de dihat çapkirin ku îspata vê yekê dike. Jixwe rojnamegerî jî mîna romanê di sedsala 19an de pêşdeçûneke berbiçav dest xist. Roman û rojname bi hev re zan û bi hev re mezin bûn. Îjar di vê babetê de ji ber ku rojnamegeriya kurdî li gorî ereb, fars û tirkan dereng destpêkir, bandor li roman û çîrokên kurdî jî kir. Yekemîn rojnameya kurdî ku di sala 1898an de ji alîyê Mîqdat Elî Bedirxan ve derket, tevî ku di çapemenîyê de gaveke mezin bû, wîsa jî rêya modernîzma wêjeya kurdî re vekir. Çawa ku tirk, ereb, faris û rojavayîyan roman û çîrokên xwe beş bi beş di rojnameyan de didan weşandin û cûreyên êwra modern di xebatên xwe de derdixistin pêş, lê her çiqas ne qasî wan be jî, nivîskarên kurd jî heman rêç domandin.

Beyî ku behsa romanê bikin heta sedsala 19an ji xeynî çend hewldanan em di kurdî de xweşikayî liqayê pexşanê jî nayên. Bi kurdî, pexşan heta sedsala 19an nehatiye bikaranîn û kurdan hema bêje qet berê xwe nedanê⁷⁰. Kurd jî tê de, di nava welatê

⁶⁷ Amîr Hassanpour, *Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil*, Weşanxaneyê Avesta, s. 1997, r. 630

⁶⁸ Barry Sanders, *Öküzün A'sı: Elektronik Çağda Yazının Çöküşü Ve şiddetin Yükselişi*, Weşanxaneyê Ayrıntı, s. 1994, r. 15

⁶⁹ Haşîm Ahmetzadeh, *Ulus ve Roman*, Weşanxaneyê Pêrî, s. 2004, r. 184

⁷⁰ İbrahim Seydo Aydoğan, *Guman 2*, Weşanxaneyê Rûpel, s. 2014, r.103

rojawayî de di qada wêjeyêde cûreya herî meşhûr helbest bû. Bi hostabûna helbestan xwe şanaz dihesibandin. Heta ku Amîr Hassanpour dibêje di sedsala navîn de helbest bo ravekirina matematîkê jî dihat bikaranîn⁷¹. Ji bo wan cûreya pexşanê hinekî di formê fermiyetê de xûya dibû. Loma jî belavbûna pexşanê û pê re jî cihgirtina di nava wêjeya wan de li gorî rojavayê zehf dereng ket.

Ji ber şertên coğrafîk berê kurdan li Stenbolê bû. Kurdan cûreyên edebiyata modern li stenbolê teqîp dikir. Sedsala ku kurdan celeba romanê nas kir, di destpêkê de vê celebe, ji ber şertên ku li jor hatin eyankirin ji hûnerê zêdetir di çarçoveya hestên netewperwerî de xebatên xwe dikirin. Bi gotineke din roman amûrek bû ji bo derbirîna wan. Îjar beriya hatina romanê di kurdî de ji dêvla wê çîrok, efsane, helbest û wd. in hebûn. Bi cîgirtina romanê, ev mijarana ku piranî wek hêmanên folklorîk dihatin nasîn kîrasedê nû hildan û binyada yekemîn romanên kurdî dagirtin. Loma jî di destpêka romana kurdî de bandora folklorê bi awayekî eşkere xwe nîşan dide.

Wekî hatîye tespîtîkirin, celeba romanê konekî mezin e û di hundirê xwe de gelek xisletan dihevine. Li ser her mesele û mijarê roman dikare bê nivîsîn. Bi giştî romanên wek; dîrokî, otografî, civakî û derûnî berbelav in. Her millet li gor şertû mercên xwe ast bi ast vê pêvajoyê derbas dike. Ji ber tunebûna pergalekê ku ji aliyê otorîteyê serdest vetê birêvebirin, di destpêkê de romanên dîrokî û otografî zêdetir cî digirin di wêjeya kurdî de. Şivanê Kurmanca jîyana Erebê Şemo bixwe ye. Dimdim behsa destaneke kurdan a kevnare dike û ji nû ve şîrove dike. Romana Şer Li Çiya ya Elîyê Evdilrehmanli ser hîmê serhildana agirî hatîye nivîsîn. Ev hin ji wan nimûneyên destpêkê ne ku di naveroka xwe de tevî bûyerên dîrokî jî dihevin, di heman demê de li ser hişmendiya rizgarkirina welatê xwe hatine nivîsîn.

Di nirxandina folklor û romanê de gelek hêman hene. Atmosfera ku folklorê avakirî û niha li sehayê edebîyatê bandor dike û diguherîne, divê baş bê zanîn û heqê wê bê dayîn. Zanîna paşxaneya hêmanên folklorîk, di analîz û têgihiştina wan de bikêr e. Me di behsa romanê de amaje kir ku, destpêkirina nivîsê li hin deran dereng destpêkir. Lewra li gor pêvajoya wê çaxê, wan xwe hewceyê nivîsê nedidîtin. Hin kesên di civatê de vî karî hildabûn ser mile xwe û çand, edet, tore, bawerî û wd.in jî bi rêya ziman, di hafîzeyê wan hosteyan de xwe diparast.

Li her derê dinyayê di her heremê de miheqek hin kes hebûn ku ev erk bi sirûştî û ji dilî hildidan piştî xwe û paşeroj di hişê xwe de vedişartin û bi wê hostehîya derbirîna ziman xwe didan guhdarkirin û her tiştên aîdê çanda gelê xwe ji pêşerojê re

⁷¹ Amîr Hassanpour, *Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil*, Weşanxaneya Avesta, s. 1997, r. 605

dihîştin. Her tim hilgirên hefizeya kulturî hebûn. Şaman, hozanên kelt ên ku weke "bard" dihatin nasîn, grîot, rahîb, mamoste, nivîskar, feylesof, mandarîn û navê wan her çî dibe bila bibe, kesên ku ew rayedarîya hilgirîya zanistê radestî wan kirine hemû daxilî vê xalê ne⁷². Helbet dengbêj, çîrokbêj û destanbêjên kurd jî di vê pênaseyê de cîh digirin. Ew nedîçûn mektebê, xwendin û nivîsandina wan tunebû. Lê xwedîyê hefizeya pirr bi quwet bûn. Bi vê hefizeya xwe ya xurt gund bi gund, bajar bi bajar digerrîyan û hemû bûyerên ku tesîr li civatê dikirin, bi dengê xwe yê dawûdî û vebêja bi honak her derê welat vedigotin. Her bûyerên ku li welêt diqewimîn, bi saya wan kesan jî lokalîteyê vediçirîyan û li hemû perçeyên welêt belav dibûn. Bi vî awayî hemû rûdanên pêkhatî jî halên xwe yê cihî derdiketin û dibû aîdê hemû welatîyan. Ji bo civatên ne xwedîyê çanda nivîskî ne, erka ku dengbêjan pêk dianîn, pir bi qîymet bû. Lewra hem cihê nivîsê digirtin û nedihêştin tiştê heyî bimre û hem jî hilgirên hafizeyan bûn ku bîra civatê zindî dihiştin. Ev rewş hetanî sedsala 19an jî bi awayekî xurt xwe domand. Lê piştî vê sedsalê rewş di cî de gûherî. Şoreş û înkîlabên wisa pêk hatin ku împêratorî li hev ketin, dewletên mezin belav bûn, pê re jî jîyaneke nû hat sazîkirin.

Helbet edebîyatê jî di nav vê teşqeleya mezin de para xwe girt û ew jî ket bin atmosfera wê çaxê. Piştî sedsalên dûv û dirêj êdî nivîsê hêdî hêdî di nava civatê de cih digirt. Qîymeta nivîsê gelek bû, çimkî nemirbûnek li peyva bar dikir. Herwiha nivîs aîdîyetek jî îfade dikir, loma jî herkesî her hewl dida gotinan binivîsîne. Awazê dengbêjan nedikarî di bin tîrbûna dewra modern de zêde li berxwe bide. Loma jî divê ev erk jî alîyê hin kesên din ve bihata bicîhkirin. Lê wekî Remezhan Alan gotî “de baş e, di dewrên modern de ev erk jî alîyê kî ve tê pêk anîn? Elbet jî alîyê nivîskaran”⁷³. Loma jî ev karê ku nivîskaran pêk dianî di heman demê de veguherîna erkê hilgirtinê yê bîra civatê bi xwe bû.

Wekî ku Mehmed Uzun îdia dike: “Ji her netewe û gelî bêtir, kurdan bawerî bi gotina devkî anîye û bi edebîyata devkî û folklorê ve girêdayî mane”⁷⁴. Berê qîymeta gotinê hebû, lê niha ew rewş guherîye û li gorî nivîsê xweşikbûn tê diyarkirin. Her kes jî gotinê zêdetir jî nivîsê bawer e. Ev hal di nav civatê de jî xwe nîşan dide. Berê digotin gotina te bo min sened e, lê îro bi guhertina jîyanê re bêyî ku nivîs hebe, kes jî kesî bawer nake. Însanên berê şevbihûrkên xwe bi guhdarkirina çîrok û efsaneyan derbas dikirin û zewqek zêde jê digirtin. Lê însanên niha her ku diçe ber bi tenêtiyê ve diçin û

⁷² Jan Assmann, *Kültürel Bellek*, Weşanxaneya Ayrıntı, s. 2015, r. 62

⁷³ Remezhan, Alan, *Li DorTexeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman*, Weşanxaneya Peywend, s. 2013, r.70

⁷⁴ Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiya Kurdî*, Weşanxaneya Ithaki, s. 2007, r. 31

loma jî şevên xwe ji yekî guhdarkirinê wêdetir bi xwendina nivîsan derbas dikin. Ev jî dibe sedem ku vegotina devkî ber bayekî dijwar dikeve û her dişikite, lê ligel vê yekê nivîs jî her ku diçe li ber vê bayê dijwar bilind dibe.

Romannûsên ku li ser folklorê dixebitin, hewl didin ku wan berhemên di nav gel de yên wek destan, çîrok û mîtan, bi kirasekî modernbûnê ji nû ve biafirînin. Lê helbet di nivisandina metneke li ser babeteke folklorîk de hin xalên mûhîm hene. Lewre ne tiştên berê, dive tiştên nû û moderntir bêje, da ku bala gel û xwîneran bikişîne. Herwiha divê teksta devkî ji dubarebûnê xilas bike û mohra xwe lê bide. Loma jî nivîskar teksta devkî dide ber bayê û tiştên zêde jê dibe. Di ser de jî tekstê li bêjingê dixê û bi vî awayî ji dûrî xwezabûnê ber bi rastîyê ve kaş dike. Belê Xanî jî ev tişt dikir. Bi hostebûna hibra xwe naverok bi raz û hûnerê tijî dikir û ew pêşkêşî wêjeya kurdî dikir. Loma jî Mem û Zîn ne wek versiyoneke Memê Alan e, destanek nipûnû ye.⁷⁵

Wêjeya her gelî -di folklorê de jî wiha ye- li gor şert û qaîdeyên wê demê tê dîyarkirin. Nivîskar li gor şert û mercên tê de dijî metneke folklorîk hildide û li gorî fikr û feraseta xwe gelek tiştan li metnê zede û kêmkirî dike. Wisa ku nivîskar bûne eynika xelqê xwe. Herwiha eynik di destê kî de be û çî nîşan bide em ê jî wê tiştê dibînin. Loma divê ew eynik di destê kesên kamil de be, da ku tiştên hêjayî dîtîne nîşanî me bide. Ger li ser navê romanê em tenê rastî hêmanên folklorîk bînin, vê carê wê edebîyat neçe serî. Lewre eynik ji armanca xwe hatîye dûrxistin û folklor ne tenê ew tişt e ku kirasê cureya romanê li xwe bike û biqede. Divê naverok, şêwaz û teşe jî di cih de be û neqşa wêjeyê û ehilbûna nivîskar jî xwe bide dest.

⁷⁵ Di derheqê vê meseleyê de ji bo zêdetir agahî bnr: Îzeddîn Mustafa Resûl, *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvîf olarak Ehmedê Xanî ve 'Mem û Zîn'*, Weşanxaneya Awesta, s. 2007. r. 60

BEŞA DUYEM

1. Romannûsiya Qafqasyayê Û Elîyê Evdilrehman

1.1. Nêrîneke Giştî Li Ser Romannûsiya Qafqasyayê

Wekî ku me di beşa romanê de jî anî ziman, romana kurdî ji ber hin sedeman li gorî hevçerxên xwe dereng derketiye. Di wê heyteholâ dinyayê de kurd ketibûn ber bayekî çetîn ku di qadeke teng de û bi awayekî dezavantaj bûn. Di nav wan şert û mercên zehmet de dîsa jî qasî ku ji destê wan dihat li ber xwe didan. Hin ji wan kesayetan, nivîskarên êwra qafqasyayê ne ku hetanî salên 1970an jî pareke mezin a romana kurdî ji destê nivîskarên êwraqafqasyayê derçûye. Sedema vê jî atmosfera komînîzmê ya sovyetan e ku pêşiya nivîskaran vedikir. Nivîskarên mîna Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Seîdê Îbo û Elîyê Evdirrehman bingeha ewil a romanên kurdî daniye. Hem ji ber atmosfera welatê wan û hem jî ji ber nêrîna wan a birdozî mijarê romanên wan bi giştî li ser babetên hevpar hatine nivîsîn.

Di edebiyata kurdî de êwra qafqasyayê di sala 1920an dest pê dîke⁷⁶ Wekî em dizanin ev sal teqabûlê şerê yekem ê cîhanê tê ku gelek kurd ji ber zor û zehmetîyan bi mecbûrî koçî Êrisatê kirine. Ev koça wan a bi êş û kul ji bo kurdî derîyên nû dida vekirin û kurdên wêderê bi xebat û berhemên xwe ji bo zimanê kurdî gelek xizmetên nivîskî dikin. Bi sêrkêşiya kesên mîna Heciyê Cindî, Elîyê Evdilrehman, Cerdoyê Genco, Qanadê Kurdo, Wezîrê Nadîrî, Casîmê Celîl, Etarê Şero, Erebe Şemo û Ahmedê Mirazî gelek kovar, rojname, piyes, kitêb û helbest wd in derçûn. Helbet ev hemû tişt jî bi destûra revebirîya hûkimeta Sovyetê pêk dihat ku rê vedikir û dihêlişt kêmetewe bi zimanê xwe berhemên xwe çap bikin. Bi saya vê destûrê, kurd ketin hewldana pêşxistina zimanê xwe û ji bo edebiyata kurdî gelek berhem afirandin. Lê helbet berdelek ya vê azadî û serbestîyê hebû ku hûkimeta Sovyetê ji nivîskaran dixwest bi awayekî xurt behsa Sovyetê û propogandaya Sovyetê bikin. “Di salên Sovyetê yên ewil de li hemû Qafqasyayê, her wiha li Ermenistanê jî ji bo pêşxistina sosyalîzmê mafên milletên kêmhajmar hatin parastin û ji aliyê meseleyên civakî, çandî û perwerdeyî ve ji bo wan milletan hewldanên mezin dihatin dayîn. Ev yek jî bandorê li ser nivîskarên kurd dîke û metnên kurdên Qafqasyayê bi piranî di bin bandora vê îdeolojiya sosyalîst de tên

⁷⁶ Sedat Ulugana, “Di Nav Kurdên Yekitiya Sovyetan ên Berê de Edebiyata Kurdî!”, <https://krd.riataza.com/2015/10/12/di-nav-kurden-yekitiya-sovyet-de-edebiyeta-kurdi/>, 15/06.2020

nivîsîn’’⁷⁷ Ev jî bû sedem ku naveroka romana di hin mîjara de ‘sûnî’ ma, û nivîskar mecbur man ku berhemên xwe li gor daxwaza pergalê saz bikin.

“Hevalê Çolo! Welatê me welatê pale û gundiyan e. Di welatê me de, milet gişk bi hev re heval in, bira ne û extiyariyên wan wekî hev in. A ha seba vê yekê jî em ji hev re dibêjin, heval, Çoloyê delal, ez ji te hêvî dikim êdî ji min re nebêjî efendî qumandar, ji min re bibêje, hevalê qumandar.” (G.M – 84)

Di nav wê atmosfera sovyetê û kêma-azadîyê de kadroyên kurd digihaştin hev û yek bi yek kitêb li pirtûkxaneyê kurda zêde dikirin. Erebe Şemo bi pênc romanên dibe serkêşê wê kedê. Navê romanên wî ev in; Şivanê Kurmanca, Berbang, Jiyana Bextewar, Dimdim, û Hopo ne. Hecîyê Cindî ku piranî xebatên wî di derbarê folklorê de ne, bi navê ‘Hewarî’ romanek nivîsiye. Eliyê Ebdilrehman, di sala 1957an de novela bi navê ‘Morof’ li Erîvanê çap dike. Du sal şûn de jî novela xwe ya bi navê ‘Xatê Xanim’ çap dike. Piştî van herdu novelan wê carê dest bi nivîsandina romanên dibe û yekemîn romana xwe ya bi navê ‘Gundê Mêrxasan’ dinivîse. Piştî wê romanê jî wê carê berê xwe dide serhildana Agirîyê û derbarê wê serhildanê de romana xwe ya bi navê ‘Şer Li Çiya’ dinivîse. Di edebiyata kurdên Sovyetê de yek jî nivîskarên xurt û jêhatî Şehîde Îbo ye ku bi navê Kurdê Rêwî romanek nivîsiye. Egîde Xudo jî bi navê ‘Dê û Dêmarî’ romenek nivîsiye.

Wekî em dizanin romanên kurdî yê ewilîn li xeribîyê ji destê Kurdên Qafqasyayê derçûne. Ev berhem piranî klasîk in, xwe dispêrin paşxaneyê kurdî û rengê wan ê folklorîk derdikeve pêş. Piştî van berhemên her ku diçe romana Kurdî dikemile û niha em bi rehetî dikarin bibêjin ku gihaştîyê astekî. Her çiqas yekem roman û novelên kurdî ji alîyê teknîka romannûsînê ve qels bin jî ji alîyê naverok û zimanê wan ê xwerû ve ezmûneke baş dane. Loma jî di nixandina van berhemên de ji alîyê teknîkî bêhtir, hewla nivîskar û rengê berhemên folklorîk di pêş de were nixandin dê ji van berhemên zêdetir sûd bê wergirtin.

1.2. Romannûsiya Eliyê Ebdilrehman

Eliyê Ebdilrehman yek jî ji wan nivîskarên hevçerxên xwe ye ku êş û azara herî kambax ya wê serdemê bi her awayî dîtiye û di berhemên xwe de jî behsa wan kiriye. Lê Eliyê Ebdilrehman hin aliyan ve ji wan nivîskarên ku me li jor navê wan dabû, cûda ye. Lewre beriya her tiştî divê em bidin zanîn ku her çiqas nivîskar bi wûcûdî ne li

⁷⁷ Cumhuri Ölmaz, ‘‘Temsîlen Romanên Dîrokî Yê Eliyê Ebdilrehman’’ *The Journal Of Mesopotamian Studies*, Summer 2018, r.47

welatê xwe be jî mijar, cih û warên di romanên wî de derbas dibin bi temamî axa kurda ne. Ango ji aliyê hişmendiyê ve ji welatê xwe qet neqetiyaye û bi saya berhemên xwe, xeta di navbera welêt de her tim xurt hiştiye.

Eliyê Evdîlrehman roman û novelên xwe bi hest û ramanên kesîf nivîsiye. Loma jî her dema ku di romana wî de zêrandineke diqewime, ji dêvla tîp û karakterên berhaman ew bi xwe xeber dide. Heta ku çol û çiyayan, hewce bike ajal, ewr û asîmanan jî dide axaftin “Hûn li kurdan neheq in, xwîna cimaeta tam û tam seba tiştêkî neheq nerêjin”(G.M – 39) û midaxaleyî li berheman dike. Ji ber ku nivîskar di berheman de terafê xwe bi me didin hîskirin, vegotina heyî jî qels dibe. Çendî ku vegotin wekî ji devê sêyemîn xûya dike jî û her çiqas di hin cihan de leheng diaxivin jî li me gelek ‘eyan dibe ku yê ku diaxife nivîskar bi xwe ye.’

Bi piranî, qedera roman û novelên qafqasyayê di bin karîgeriya nivîskar de ye. Nivîskar hukim li rabirdû û dahatûyê dike. Zülküf Ergün sedema vê yekê di gotara xwe ya bi navê ‘*Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê*’ de wiha îfade dike; Bêguman ev diyarde bi cextkirina vêkxistina berhema edebî re bêtir derdikeve holê û cihgîr dibe, lê di romanên pêşî yên edebiyata kurdî ya Sovyetê de ji ber karîgeriya bihêz a vegêrana folklorîk nivîskar carinan di rola çîrokbêj de erka vegêranê digirin ser xwe û xweseriya gotara vegêr binpê dikin. Di vê rewşê de nivîskar û vegêr dibin yek û ciyawazî di navbera wan de namîne.⁷⁸ Bi gotinek din dema em metna berdest dixwînin, ji karakterên romanê bêhtir dengê nivîskar bi xwe tê bihîstin. Nivîskar, her wexta ku bixwaze tiştêkî baş bide zanîn, bêhnokek diavêje honandina bûyerê û bi dest bi hînkirin/şîretkirin/propagandaya mijarê dike.

“Partiya Komûnîst bi serkariya Lenîne mezin serkarî li şerkariya sinifa pale û gundiyan xebatkar dikir û di Oktyabra sala 1917’an de, li Ûrisêtê hukimeta kapîtalîstan û milkedaran hate walgerandin, li dewsê Hukimeta Xebatkaran a Sovyetiyê hate sazkirin, ku di temamiya rûbarê dinyayê de ya sinifa pale û gundiyan xebatkar dihate hesabkirin” (M.R - 74).

“Paleyên niftê yên Îranê li miqabilî qayde û qanûnên Îranê şer dikirin, sebaba duduyan jî ew bû ku Kurdên Sawûcbûlaxê ji bo azabûna xwe li miqabilî Şahtiya Îranê şerekî zor dikirin. A wiha seba vê yekê jî şerê li miqabilî Kurdên Çoloyan hate sekinandin.”(G.M – 63)

⁷⁸ Zülküf Ergün, “*Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê*”, *Kovara Mîkaddime*, s.2018, r. 135

“Ax, çiya, çiya û dîsa çiya! Hûn çiqas bi însaf rehm in. Hûn di roja çetîn de dê û bavê mirovên feqîr, belengaz û jar in”(Ş.L – 17)

Wekî ku xûya ye, vegotinên bi vî şiklî metnê ber bi vegotinên folklorîk ve dibe. Loma jî bi giştî em dikarin bibêjin wexta ku kurd dest bi hûnera romanê kirine, qelema wan di bin karîgerîya çîrokbêjî de maye. Loma jî hevokên vî şiklî ku vegotinê qels dikin, di gelek cihan de dertê pêşîya me.

Eliyê Evdilrehman di berhemên xwe de yekî heqperez xûya dike. Her dem û di her wextî de aligirê rastiye ye. Herçiqas ji aliyê cîranan ve neheqî li tîp û karakterên wî hatibe kirin jî ew dîsa mafê cîrantiyê diparêze û xwedî li *tirkên kedkar* û birayên *ermen* û *ezerî* derdikeve. Ji wî aliyê ve em bi rehetî dikarin bibêjin ku; nivîskar bi awayekî romantîk li cîhanê dinhêre û dibe ku ji ber pergala komûnîzmê di bin karîgeriya fikrên mîna biratiya gel de mabe. Bi awayekî aşkere tê xuyakirin ku Eliyê Evdilrehman di berhemên xwe de di nav dudiliyekê de ye. Ev dudilî jî xwe dispêre hest û ramanên nivîskarên ên neteweyî ku her çiqas di bin saziyên komûnîzmê de perwerde dîtibe jî winda nebûne, û di berhemên wî de bi vî şiklî şîn bûne. Lewre, li kêleka vê fikra wî ya biratiya gelan jî tiştê ecêb di berhemên wî de kurd bi heman gelan re di nav şer de ne. Nivîskar jî bi qasî ku ji destê wî tê di wan şeran de pesnê kurdan dide û mêrxasiya wan derdixe pêş. “Binihêre qîza kurd û zêdeyîya li ser qîza dijminê cimaeta Şewrê ya xedar çawa li miqabîlî dijminan şer dike, û ya sere li miqabîlî bavê xwe yê helal...”(Ş.L – 186) Lehengên van berheman, herçiqas neçûbin şer jî wekî mekteba şer xelas bikin hemû rê û rebazên şer dizanin û ji her alî ve dijminê xwe bin dixin.

Divê em behsa zanebûna nivîskar a derheqê erdnigariya welatên Kurdistan de jî bikin ku hêjayî gotinê ye. Bi taybetî jî di wextên şer û pevçûnan de ew zanebûn xwe digihijîne lûtkeyê. Eliyê Evdilrehman behsa cih û warên wiha dike ku ji afîrederbûnek xeyalî zêdetir, cih û warên Kurdistan yê rasteqîn jî hene. Xwîneran, bi kesên di roman û novelê wî de derbas dibin re, kolan bi kolan, çiya bi çiya, gelî bi gelî heta zinar û şikeftên bajaran digerin. Helbet ev jî bi zanîna nivîskar bi welatê wî re dikare bê şîrovekirin. Ser mînak, di Morofê de di despêkê de bûyer li gundên *Bilîsê* û deşta *Îdirê* diqewimin, paşê bi pêşdeçûna novelê ve hinekî behsa Qersê jî tê kirin û di dawiya novelê de nivîskar êdî me ber bi Êrisatê ve dibe û hin deverên Qefqas û Sovyetê (Bakû, Tiflîs û Rewan) jî di novelê de cih digirin. Ji xeynî van ciyan hin cih û mekanên din jî di novelê de derbas dibin. Wek mînak: *Geliyê Qetlê*, *Zinarê Şîn*, *Zaxa Gera Dewatiya*, *Qendîla Dawetiya*, *Mixareya Şivanan*, *Çiyayê Elegez*, *Çemê Erez*, *Horgov(gund)*, *Kaniya Şivanan*, *Fitirpol*, *Sari Moskov* û hwd...

Herwiha roman a Gundê Mêrxasan jî li Îranê dest pê dibe û paşê bi koçkirinê heta Êrîsatê ve diçe. Nivîskar li wê derê jî vê zanebûna xwe dide der. Di romana Şer Li Çiya de nivîskar vê zanebûna xwe ya cih û waran bi hostebûna şer ve girê dide. Şervanan geh têdixe şikeftan geh wan dibê gelîyan û bi vî awayî zanebûna xwe ya di derbarê cih û waran de nîşanî me dide. Em dikarin ji bo tîp û lehengên ku nivîskar afirandine bibêjin; qeder û terza wî ji wan nivîskarên din cudatir nîn e. Jixwe bi awayekî zelal em nikarin behsa tîp û karekerek xurt jî bikin ku wî di berhemên xwe de afirandibe. Roman û novelên wî nivîsîne nêzî romanên dîrokî ne. Jixwe di dawiya romana xwe ya bi navê Şer Li Çiya de jî bi me dide zanîn ku, ew çûye li ber kesên tevî şoreşa Agiriyê bûnê runîştîye û romana xwe jî li ser wan rastiyan honandiye. Herwiha li gorî hewcedariya atmosferê taybetiya karekterên xwe kêm yan jî zêde kiriye.

Bi giştî em ji bo Eliyê Evdilrehman dikarin bibêjin ku di xewn û xeyalên wî de tevî ewqas zêrandin û tahdebûnê jî welatekî têrxweşî, civateke şên û dostaniyên herî bi qîmet têkneçûne. Herwiha ew her tim bîr û baweriya xwe ya paşerojê ku dê welatê wî bigihêje aramiye di dilê xwe de diparêze û her hewl dide ku ew hestên xwe, ji xwîneran re jî bide hîskirin. Loma jî roman û novelên wî jî eger ji nêrîneke edebî wêdetir, bi nêrîneke folklorîk bîn nirxandin, wê dewlemendiya naveroka berhemên wî û mîrata ji me re hiştîye baştir bê fêmkirin.

2. Kurteya Romanan

2.1 Kurteya Morof

Pênaseya Pirtûkê:

Navê Nivîskar: Eliyê Evdilrehman

Navê Pirtûkê: Morof

Cureya Wê: Roman

Çapa Yekem: Di sala 1957an de, di nava berhevoka Nivîskarên Kurdên Sovyetê de.

Çapa Duduyan: Weşanxaneya Lîs, Amed, Gulan 2012.

Hejmara Rûpelan: 102

Eliyê Evdilrehman bi berhema xwe ya bi navê Morof ve vê carê dest diavêje serpêhatîyên sedsala 20an, ku kurd ji ber zordestiya axa û began koç dikin û berê xwe didin welatê Êrîsa ku dibêjin warê pale û karkeran e. Di vê novelê de tevî zêrandina navxweyî, koça mezin a kurdan ya sedsala borî jî bi propagandaya sosyalîzmê tê behskirin. Karakterê sereke Morof e û hemû bûyer li derdora wî diqewime. Morofê ku di destpêkê de şivan e û bi demê re dibê yek ji şoreşgerên herî mezin ên sosyalîzmê,

gundîyan organîze dike û ber bi Ûrisatê ve dibe. Tevî ku armanca novelê propagandaya sosyalîzmê ye jî di novelê de derheqê e'det, bîr, bawerî û bi taybetî jî derheqê dengbêjîyê de gelek nimûne tên dayîn.

Morof xortekî nûgihaşti ye û li gundekî derdora Bilîsê şivantiyê dike. Di wî gundî de axayekî bi navê Xalît beg heye ku ji berê de zilmê li kesîban dike. Morof jî şivantiya pezê Xalîd Begî dike. Di destpêka novelê de Morof mîna her rojê diçe ber keriyê pez. Wê rojê piyê mihekê li kevîrekî dikeve û dişkê. Wexta ku haya Xalîd Beg ji şikestina piyê mihê çêdibe, gelekî hêrs dibe û bêpîrs û lêgerîn Morof dide ber coyan. Wiha ku laşê wî reşû heşîn dike û ji bo ku bimire, 'emir dide xûlamên xwe ku Morof biavêjin Geliyê Qetlê. Piştî hevalên wî yê pale û xebatkar Şemo û hinekî din, haya xwe ji wê bûyerê dibin û bi dizîka xwe digihînin laşê Morof û ew bi dizî dibin Şikefta Şivanan. Hemû pale, xebatkar û şivanên ku ji Xalîd Begî aciz in li wê derê dicivin. Di encamê de vê biyarê didin, heta ku Morof li şikeftê be ew ji bo wan tê maneya mirinê. Loma jî wî bi dizîka ji gund derdixin û dişînin cem Memoyê xalê Şemo. Tiştê ecêb ew e ku Memo gava ku Morof dibîne lê germ dibe xwîna wî diçigê. Lewra kurê wî nîne û her çiqas hatibe zêrandin jî hebûna lawikekî mîna Morof li wî tê. Bi demê re, bi alikariya qîz û xanima Memo, Morof baş dibe û wekî kurê malê tê hesibandin. Jixwe Memo jî ji derdorê re dibêje Morof biraziyê min e, dê û bavê wî mirîne loma jî êdî Morof mîna kurê xwe qebûl dikim. Morof li wê derê jî mîna berê dest bi şivantiyê dike û jiyana xwe dewam dike. Lê bextê belengazan reş e; li wî gundî jî axayekî bi navê Selîm Beg heye ku bi zordestiya xwe ya li ser gel piyê xwe bi piyê Xalît Beg dixê. Heqê pale û xebatkarên kêr dide û nanî ji devê wan direvîne. Morofê ku hêj di destpêka romanê de li ser neheqîya axayan xeber dida, li vî gundî jî rehet nasekine û ji bo serwextkirina gel li çareseriyên digere.

Di novelê de bi carekê em hîn dibin ku Morof xwediyê dengê zîz û repertûareke têr û tije ye. Tam di wê demê de jî Selîm Beg ji bo dîwana xwe bide naskirin û serbilind bibe li dengbêjekî xurt digere. Rojekê diçe neçîrê û bi awayekî leqayê dengê Morof seh dike. Bi saya dengê xwe, Morof dikeve dîwana beg û axayan û her tim methê wî tê kirin. Morof hem bi dengê xwe, hem bi ehlaqê xwe û hem jî bi sûretê xwe xortekî lihevhatî ye. Loma jî heta qîza Selîm Beg jî çav berdide lehengê me. Lê dilê Morof û qîza Memo ya bi navê Nurê li hev de ye û bi awayekî bi hev re dizewicin.

Morof bi saya dengê xwe bajar bi bajar ligel Selîm Beg digere. Di van geran de haya wî ji bayê dinyayê û îsyana paleyan jî çêdibe. Di serî de feqîrên welatê Ûris û

hemû xebatkarên din ku rastî zordestiyê tên, tev radibin û heqê xwe dixwazin. Morof di van geştan de her çi dibîne û dibihîse, dema vedigere gund ji kesib, şivan û gavanên gund re dibêje û wan li ser reva bo welatê Êris organîze dike. Di vê beşa romanê de haya me ji taybetiyêke din ya Morof çedibe ku ew tevî her tiştî, ji aliyê sîyaset û birêvebirina gel ve bêqisur e.

Morof ji bo revê plan û dezgehekê amade dike. Pere û zêrên ku ji bo revê hewce ne ji Selîm Begî temîn dike û tîfingan jî bi wan pere û zêran peyda dike. Bi wî awayî xwe bi obe û kesibên xelqê dide bawerkirin. Herwiha rojekê Selîm Beg ne li gund e, tevî gundiyên kesîban bar dikan, çemê Erezê derbas dibin û berê xwe didin welatê pale û kesiban. Li wê derê gundê kurd û ermenyan hene. Li kêleka paleyan, li hemberî dijminê sinifê şer dikan. Di dawiyê de dijminê sinifê têk dibin û bi altindarî digihijin mîrazê xwe.

Di beşa dawiya romanê de, em pergî hin salên borî tên ku xelq di nav telaş dawet û zarok şandina mektebê de ye û xweziya xwe bi van rojên xweş tîne. Bi van telaş û jiyana wan em têdigihêjin ku şer û pevçûn qediyaye û bi gihastina welatê Êris û pergala wan kurd di nav aramiyê de dijîn. Novel bi vî awayî bi dawî dibe.

2.2. Kurteya Xatê Xanim

Pênaseya Pirtûkê:

Navê Nivîskar: Eliyê Evdilrehman

Navê Pirtûkê: Xatê Xanim

Cureya Wê: Roman

Çapa Pêşîn: Neşîreta Hayatsan, Yêrêwan, 1968

Çapa Duduyan: Weşanxaneya Lîs, Amed, Gulan 2012.

Hejmara Rûpelan: 78

Çawa ku ji navê wê jî diyar e, Xatê Xanim, mijara xwe ji serokeşîreke jin wergirtiye. Di ve berhemê de li ser navê Xatê Xanim, tekîliyên kurdên qeza Dêrsîmê û dewleta tirk tê vegotin. Lê ji ber ku serlehengê romanê jinek e, ev berhem gelek bala xwîneran dikişîne. Lewra, li gorî Güneş Kan wek romana kurdî, jin cara ewil di vê romanê de roleke girîng dilîze.⁷⁹

⁷⁹ Güneş Kan, *Îmaja Ermenî Di Romanên Kurdî Yên Sovyetê De*, Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Çand û Zimanê Kurdî, Teza Mastirê ya Çapnebûyî. s. r. 58

Roman bi mirina serokê elê Temûr dest pê dike. Bi mirina wî re qeymeqamê Ezîrganê dixwaze xeracê li ser qezaya Dêrsîmê zêde bike. Ji bo hevdiştinê, Sultanê kurê Xatê Xanim diçe cem qeymeqam. Lê qeymeqam yekî xerab e û Sultanî diavêje zindanê. Piştî vê yekê eşîr bêxwedî dimîne, tam jî di wî wextî de Xatê Xanim derdikeve pêş û hemû giregirên eşîrê berhev dike. Tevî ku jin e xwe dide guhdar kirin û eşîra xwe organîze dike. Herwiha xeber ji eşîrên din ên Kurdan re jî dişîne û bi vî şiklî yekîtiyeke xurt di navbera kurdan de ava dike. Xatê Xanim hem xeracê û hem jî girtina kurê xwe qebûl nake û li ber hukmê qeymaqemê Ezîrganê serî radike. Di vê serhildanê de tiştê ecêb û zêdetir balê dikişîne ser xwe ew e; nivîskar li ser navê Xatê Xanimê hebûna ‘jinê’ bilind tarîf dike. Wekî din beyî ku şer û pevçûnek biqewime bi saya feraset û tevgerên aqilane yê Xatê Xanimê, kurd serdikevin û hem Sultan tê berdand û hem jî xeraca zêde tê betalkirin.

Wekî berhemên din yê Eliyê Evdilrehman di vê berhemê de jî biratiya kurd û ermenan dîsa derdikeve pêş. Dema Sultan tê hepskirin Xatê Xanim ji bo şewrê diçe mala Karapetê ermen û pê re şewrê dike. Wekî din di novelê de xuya dibe ku piçûk an jî mezin her şerê ku diqewime bi awayekî ji lokalîteyê difire û reng û rûyekî neteweyî hildide ser xwe. Helbet ev jî bi fikr û ramanên nivîskar pêk tê ku me di beşa jor de behsê kiribû.

2.3. Kurtiya Romana Gundê Mêrxasan

Pênaseya Pirtûkê:

Navê Nivîskar: Eliyê Evdilrehman

Navê Pirtûkê: Gundê Mêrxasan

Cureya Wê: Roman

Çapa Pêşîn: Romana wî ya pêşîn, Gundê Mêrxasan, di sala 1968an de, li Yêrêwanê hate weşandin.

Çapa Dûduyan: Weşanxaneya Lîs, Amed, Gulan 2012.

Hejmara Rûpelan: 206

Yekemîn romana Eliyê Evdilrehman a bi navê Gundê Mêrxasan ji sê paran pêk tê. Destpêka vê romanê berevajiyê novel û romanên din ê nivîskar, ne li herema serhedê, li rojhilatê diqewime. Mîjar dîsa her yek e. Kurd bi zilm û zordariya va tèn

êşandin û riya xelasbûnê digerin. Lê, mîna qedera piranî berhemên Qafqasyayê helbet riya xelasîyê li Êrisatê ye.

“Welatê Êrisatê welatekî baş e. Padîşahê wê qanûnekê wisa danîye, kesek ji xatirê kesekî nakeve, mîna bira dijîn. Li wir niha dest pê kirine xweliyê ji dewlemendan, axa û begleran dîstînin, didine gûndîyên kesîb...”(G.M – 72)

Ev roman ji sê paran pêk tê. Di para yekem a romanê de em li pergî şerê di navbera kurd û eceman tîn. Ev beş têra xwe bi şer û pevçûna tije kirîye. Piştî şerê dûv û dirêj eşîr biryar didin ku biçin welatê Êrisatê. Beşa duyem ya romanê mijara xwe li ser vê mijarê hildide û berdewam dike. Piştî beşa yekem ku têra xwe bi şer û êşa tijebû, nivîskar navbereke kurt dide û behsa aramîya welatê Êrisan dike. Ev beş bi giştî bi propagandaya sosyalîzmê tijî ye. Para sêyem ya romanê jî bi heman mijarê dewam dike. Lê vê carê em hîn dibin ku kurd ji bo pêşdebirina sosyalîzmê bûne komsomol û parastina wekhevîyê dikin. Ev beş jî bi giştî behsa serpêhatîyê civata kurd dike ku bê çawa di parastin û pêşdebirina sosyalîzmê de cih girtine.

Para Yekem

Di para yekem a romana Gundê Mêrxasan de behsa sê eşîrên kurdan tê kirin ku di bin zilm û zordariyê de dijîn. Di kitêbê de sê eşîrên kurdan ên Banokan, Hecîmkan û Xirmîşkan hene ku ji ber zilm û zextan di sala 1920 an da koçî Îranê dikin. Serkarê hersê êlan Çoloyê Têmûr e. Nivîskar Çoloyê Temûr bi her awayî îdealîze kiriye û li gorî wî haya Çoloyê Temûr ji geşedanên dinyayê jî heye. Lewre wî gelek heps û zîndan dîtiye û li ber zilma romê serî netawandiye. “hay ji bayê dinyayê hebû; di vî emrî de, gelek tehlî tengasî dîtibû, çendik û çend carankatibû zindanê û gelek caran reviyabû, bi salan firartî kiribû, komek dabû cimaeta feqîr û belengazan.”(G.M – 17).

Di romanê de tiştê balkêş ew e ku başbûna lehengê me bi serhildana xwe ya li hemberî neheqiyê tê taswîrkirin. Ji ber ku nirxên civatê nîşanî me dide, ev jî hêjayê gotinê ye. Dema ku diçine bajarê Xoyê dixwazin di qîşlaya Riza Efendî de bi cî bibin. Herçiqas di serî de ne qayîl be jî, ji ber hezkirina xwe ya pere û bertîlê Riza efendî di dawîyê de dipejirîne û li ser kaxizê peymanê çêdikin. Li gor peymanê, êl wê her sal di demeke diyarkirî de xeraca heywanan bidine Riza Efendî. Midetekî ev rewş wisa didome, lê Riza Efendî dixwaze zêdetir li ser êla Çolo hikumdar be û nehêle ku hersê êl bi hêz bibin, zêdetir xeracê dixwaze. Herwiha tevî eşîrê nemaze jî, ji Çolo zehf ditirse û dixwaze wî bikuje. Bi çend hewldana dibîne ku kuştina Çolo ne hêsan e, bi fitne û

fesadî, bi bertîl û rişwetan wekîlê Xoyê îkna dike û bi destûreke leşkerî ya Tehranê hêzan dişîne ser Çoloyan. Lê çoloyan li ber xwe didin û hêzên Îranê têk diçin. Di wî şerî de Riza Efendî jî dikujin. Lê tiştê ecêb di derbê de behsa qîzeke bi navê Gogê jî tê kirin, ku bi bikaranîna jinintîya xwe Riza Efendî kuştîye. Piştî vî şerî vê carê Şahê Îranê tabûreke leşkerî dişîne ser kurdan, li ser vê yekê Çolo ji eşîrên kurdan komekê dixwaze, li ser vê xwesteka wî hemû eşîr bi qasî ji destê wan tê alîkariyê ji Çoloyan re dişînin. “Çolo dît ku wê şer dirêj bikişîne, Şahtiya Îranê jî wê dîsa ekser û cebirxaneyê bişîne îmdada eskerên xwe, wî jî dîsa du qasî ber bi êla Şikakiyan û çar jî ber bi êla Heyderan û Celaliyan ên welatê Romê ve şandin.”(G.M – 58), Di cîh de ev şerê ku seba Riza Efendî û xeraca wî derketibû, rengê neteweyî hildide û dibe şerê kurd û dewleta Îranê. Ji ber heybeta şer, kurd dîsa koç dikin û xwe dispêrin Çiyayê Xezalê. Li ber êrişên Îranê bi çiyayîbûna xwe û bi saya hemêza çiyayan dîsa ser dikevin. Herçiqas Şahê Îranê serwext dibe û fêhm dike ku di vî şerî de kurd heqdar in jî dîsa şer didomîne. Lê axiriyê de di carekê de Îran hew dixwaze şer bike. Paşê nivîskar sedema kişandina şer a Îranê bi propogandaya neteweyî û îsyana paleyan ve girêdide. “Paleyên niftê yên Îranê li miqabilî qayde û qanûnên Îranê şer dikirin, sebaba duduyan jî ew bû ku Kurdên Sawûcbûlaxê ji bo azabûna xwe li miqabilî Şahtiya Îranê şerekî zor dikirin. A wiha seba vê yekê jî şerê li miqabilî Kurdên Çoloyan hate sekinandin.”(G.M – 63). Bi vê hevokê hemû armanca nivîskar jî xwe dide der. Lewra di hemû parên romanê de ev rûhiyeta nivîskar xwe nîşan dide û hema dixwaze balê bikîşîne li ser van her du mijaran. Herçiqas dewlet leşkerên xwe paş de kişandibin jî, lê çolo ji Îranê bawer nake. Tam di wextê şerqedandin û biryara koçkirina kurdan de, karekerekî bi navê Mehmet dertê holê ku ew jî wek îmdatçî bi eşîrên kurdan re hatibû, ji Çoloyan re behsa welatê Êrîsan dike. Bi wî awayî nivîskar her tiştî li hev tîne. Jiber pesndayîna welatê Êrîsan Çolo jî diçin welatê Êrîsan. Li wê derê bi awayekî gelek qenc tî pêşwazîkirin ku kurdan tiştê wiha qet nedîtibû. Çolo û eşîra wî li bajarê Nexçivanê li gundê Sûsê tî bicîhkirin. Ev gund jî gundekî kurdan e û navê wê jî ji peyva tirkî ya ‘sus’ e hatiye.

Para Duyan

Para duyem ya romanê bi giştî di nav sehaya propogandayê ya pergala sovyetê de derbas dibe. Di vê para romanê de mirov dibê qey nivîskar, di nava romanê de bêhnvedanek vekirîye û Êrîsan bi xwîneran şêrîn dike. Kurd bi awayekî gelek baş ji aliyê hevalên Êrîs ve tî pêşwazîkirin û hemû kêmasiyên wan jî ji aliyê cîranên wan ên kurd û azerîyan ve tî temamkirin. “Hevalê Çolo! Welatê me welatê pale û gundiyan e.

Di welatê me de, millet gişk bi hev re heval in, bira ne û extiyariyên wan wekî hev in. Aha seba vê yekê jî em ji hev re dibêjin, heval, Çoloyê delal, ez ji te hêvî dikim êdî ji min re nebêjî efendî, qumandar, ji min re bibêje hevalê qumandar.”(G.M – 84). Di vê beşê de bi awayekî xurt biratiya kurd û ezerî û ûrisan derdikeve pêş. Di vê beşê de yek jî beşa mûhîm, behskirina nexweşî û doxtoriyê ye. Nivîskar di gelek cihan de bi me dide zanîn ku, kurd di destpêkê de ji nexweşxane û doxtorên dewletê ditirsin. Lewra newêrin birînê xwe teslîmê wan bikin. Û paşê têdigihijin ku ev doxtor û îmdatçî baş in, loma jî bi dilekî aram nexweşên xwe teslîmî wan dikin. “Mala we bişewite, wexta Dîwana Îranê mala we şewitand! Ez ê beriya gişkan kurê xwe bidim, paşê hûn dizanin. We dinya li serê me anî hev. Mêrikan ew qasî ji me re qencyê dikin, ev jî pêş qencya wan ve? Mêrekî mîna Çolo ev saetek e ji we hêvî dike, hûn giliyê wî di pişt guhê xwe re davêjin.

Gelî doxtoran, kurê min beriya gişkan bibin kî jî naxwaze, şuxulê wan e...”(G.M – 81)

Bi giştî em dikarin bibêjin ku ev beş li gor beşa yekem ku bi têra xwe aksîyon bû, hinekî din westayîye û ji bo beşa sêyem girîzgahekê amade dike. “Welatê Ûrisetê welatekî baş e, padişahê wê qanûneke wisa daniye, kesek ji xatirê kesekî nakeve, mîna bira dijîn. Li wir, niha dest pê kirine xweliyê ji dewlemendan, axa û begleran distînin, didine gundiyan kesîb. Karxaneyan û fabrîqayan didine paleyan. Kêf kêfa gundiyan û paleyan e.”(G.M – 72)

Ev hevok mijara romanê jî dide der. Lewra ew axa û beg bi dilekî rehet malê xwe bernadin û seba malê xwe li hemberî sinifê şer dikin. Jixwe beşa sêyem ya romanê jî li ser vî şerî tê bicîhkirin.

Para Sêyem

Dewleta ûris alikariya kurdan dike û di bin baskê pergala xwe ya wekhêvîxwaz de wan diparêze. Di wan deman de rewşa Çolayan baştir dibe û dest bi karê perwerdehiyê dikin. Ji bo zarokan dibistanan ava dikin û wd in. Bi vî rengî ku jiyana didome dijminê sinifê jî derdikevin holê û li gundê Dugendê ku girêdayê Şarûrê ye serê bavê Qasim tê jê kirin û malbata wî hemû tê kuştin. Nivîskar kûştina bavê Qasim ya ji bo parastina pergala sovyetê bi zimanekî pesndayînê vedibêje. Di van rojên tevlîhev de jî Qasimî ji xwendina xwe ya bakûyê vedigere û ji bo ku bibe katîbê gundê Sûsê tê erkdarkirin. Qasim gava ku tê gund di hevdîtina pêşiyê de dilê wî dikeve qîza Heso Axa ya bi navê Xezalê. Di gund de xebatên

komînîst bi pêş dikevin. Qasim û çolo pev re tevdigerin û rêxistinê xurttir dikin. Pê re jî rêxistin û tehdîdên li hember pergala komsomolan(komînîst) jî zêde dibin.

Li gundê Sûsê, herkes ji vî hal û dewrana nû ne razî ye, lewra hin kesên ku dixwazin kolxozê birûxînin û desthilatîya axatî û begîfîya berê dîsa saz bikin hene ku hin ji wan jî ev in: Hesên Beg, Efo, Xalit Beg, Mele Biro, Edo Beg û Kemalê Firqecî ne. Xalit beg qaçax e û li hêla Îranê dijî û car caran bi dizîkî tê gundê xwe. Ji bo êrîşkirina gundê Sûsê jî planan çêdikin ku serekê wan jî Heso Axayê bavê Xezala komsomol e. Xezal dilsozeke pergala komsomolê ye. Loma jî her hewl dide ku bavê wî xerabiyê negihîjine pergala wekhevîxwaziyê. Bi zimanekî xapînok li pey bavê xwe digere û dixwaze plana wî ya talankirina malên gel deşîfre bike. Xezal, plana bavê xwe di dawiyê de hîn dibe û ji Qasim û Çolo re eşkere dike. Di dawiyê de dijminên sinifan dikevîne telê û têne qelandin.

Wekî romanên Eliyê Evdirrehman yê din, di vê beşê de jî karektereke jin derdikeve pêş. Lê rol û rêya ji Xezalê re hatiye veqetandin ji karekterên din piçekî cûda ye. Lewra Xezalê ji bo komsomolê bavê xwe daye kuştin. Li ser navê tevgerên Xezalê bilindkirina pergala sovyetê digihîje lûtkeyê. Bi vî rengî di dawiyê de daweta çend lehengan tê kirin û bi dilekî hevpar û rihet dimînin.

2.4. Kurteya Romana Şer Li Çîya

Pênaseya Pirtûkê:

Navê Nivîskar: Eliyê Evdilrehman

Navê Pirtûkê: Şer Li Çîya

Cureya Wê: Roman

Çapa Pêşîn: Romana wî ya duyemîn Şer Li Çîya, di sala 1989an de, li Êrîwanê hatiye weşandin.

Çapa Yekemîn: Weşanxaneyê Perî, Stenbol, Gulan 2011.

Hejmara Rûpelan: 351

Duyemîn romana Eliyê Evdilrehman a bi navê Şer Li Çîya di sala 1989an de li Êrîwanê hatiye çapkirin. Mijara xwe ji bûyereke dîrokî ku em wekî Serhildana Agiriyê nas dikin, digre. Wekî tê zanîn piştî tîkçûyîna serhildana Şêx Seîd, bi alîkariya rêxistinê Xoybûnê û bi serkêşîya Îhsan Nûrî Paşa serhildaneke nû destpêkir. Vê serhildanê bandoreke mezin li kurdan kir, piraniya eşîr û rewşenbîrên ku piştî damezrandina dewleta tirkîyê hatibûn sirgûnkirin vegeheriyên welêt û tevî vê şoreşê bûn. Di destpêkê de

her çiqas wekî ku heçko serhildan serbikeve jî bi alîkariya teyare û dewletên din dewleta tirk bi serdikeve û şoreş bi qirkirineke mezin tê bidawîkirin. Komkujiya Zîlanê ku di sala 1930î de tevî jin û zarokan bi hezaran kes hatibûn kuştin û di bîra civakî ya kurdan de yek ji karesata herî mezin e, perçeyek ji vê serhildanê ye.⁸⁰ Roman tevî hin rastiyên dîrokî li ser navê karekterê kurd Şêx Zayîr bi paşxaneyêke kurdewarî îdealîze dike. Kemereya vegotinê ji destpêkê heta dawiyê li ser Şêx Zayîr e û tevî ku agahiyên di derbara dîrok û jiyana kurdan de dide jî, şerê wî yê li hemberî dewleta tirk jî rave dike.

Romana Şer Li Çiya bi pesndayina çiyayan destpêdike ‘Gelî û çîya! Hûn biraderên Kurdan ên bi salan, sedsalan, dewr û deman in(Eliyê Evdirrehman, 2011: 17)’ bi vê destpêkê em ji bo şer û berxwedanê tîn amadekirin. Lewra çîya hîmê kurdayetiyê ye, parastina netewê ye li hemberî ‘êdin’ e ku sedan sal kurdan parastiyê. Nivîskar wiha tevdigere ku dersa dîrokê bide xwîneran. Ji ber vê yekê jî di gelek cihan de bi aşkere midaxele li romanê dike û ne karekter, nivîskar bi xwe diaxive. Helwesta van hevokan encamên pir bi tesîr derdixin holê. Lewra hebûna kurdan bi hebûna çiyayan ve girêdaye, polîtîkayên tûnekirinê bi saya çiyayan têkçûye lewma jî çîya berî her tiştî dirûşma sedan salan e ku hêzê dide û nahêle ‘êdin’ bi ser kevin.

Di destpêkê de em malbata lehengê me ku navê wî şêx Zayîr e nas dikin. Pêvajoya ku leheng dibe ser çîya û dibe serleşkerê serhildana gundê wî, bi guhdarkirina gundî û malbata wî dest pê dike. Helbet ev jî bi xurtbûna çanda devkî ve girêdaye ku em ê di beşeke din de behs bikin. Lehengê me ji ber ku jêhatî ye li medreseya tirkî ya bajarê wanê tê qebûlkirin. Di vesalkirina cîhekî de rola perwerdehiyê pir mûhîm e. Ji ber vê yekê jî rola ku nivîskar daye vê mektebê û tesîra wê ya li ser lehengê me pir balkeş e. Herçiqas medreseya tirkî be jî, nivê xwendekaran kurd in. Dewletê bi mebesta ku xwendekarên zîrek ên kurd biqulibîne ser fikra tirkayetiyê medrese vekiribû. Jixwe di dema çûyîna de jî bavê wî çîroka vekirina medreseyê û taybetiya wê ji lawê xwe re wiha dibêje. ‘‘Ez bi guman im ku tu her dem îmdadê bidî zarokên me Kurdan û zarokên kedkarên mayî. Tişteki jî bizanibe, ku ev medreseya Wanê sedema xatirê Tirkan vekirine, lê zarokên Kurdan tenê bi bertîlê tîne qebûlkirinê, ew jî zehf kême (Ş.L - 53).’ Lêbele Şêx Zahir wek xortekî zana ku hay ji bayê felekê heye tê taswîrkirin. Loma jî bi hişmendîya kurdayetiyê hem xwe hem jî hevalên xwe ji gefa dewletê xelas dike. Balkêş e ku ev medreseya bo pûçkirina zarên kurdan vebûbû bi saya Şêx Zayir dibe hêlîna tovê serhildêrên kurd. Di dibistanê de wek xwendekar ji aliyê fêrbûnê ve yê herî

⁸⁰ Fahriye Adsay, *Romana Kurdî (Kurmançî) Ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname*, Teza neçapbûyî, Mêrdîn, 2013, r.39

zîrek ew e. Lê zîrebûna wî tenê ji dersan pêk nayê, beriya her tiştî ew bi nasnameya xwe ya kurdî derdikeve pêş. Tevî dersên xwe yên ilmî dest bi xebatên netewî jî dike û di dibistanê de, di navenda dewletê de tevgerên li dijî dewletê dide despêkirin. Berxwedêr di avaniyên dewleta ku cîhên herî ewle yên dewletê ne de xwe organîze dikin û navenda otorîteya bişaftinê dibe kelha berxwedanê. Di xebatên xwe de wiha hoste û xwe bawer e ku rêvebirên medreseyê qet hay ji xebatên wî çênabin. Heta ku piştî kemilandina şoreşa Agirî destpê dike û di nav welêt de belav dibe, Şêx Zayîr dev ji mektebê berdide û tevî hevalên xwe yên şoreşger tevî vê raperînê dibin. Nivîskar bi mînaka medreseyê, sedema hebûna dewleta tirk li axa kurdan vedikole û bi sembola Şêx Zayîr û tevgerên wî yên medresêyê jî polîtîkayên vê medreseyê hêdî hêdî pûç dike.

Em di romanê de hin taybetiyên din ên kurdan hîn dibin ku, tevî hemû deq û dolaban jî tirk nikarin şervanên kurd bi şer têk bibin. Lewra karakterên kurd ên baş wiha tîkên îdealîzekirin ku hemû tevgerên wan biazilane ne û bi tu awayî nakevin defika 'êdin'. Neçûne mekteba şer, lê xwediyên xisletên hûnera şer in, plan û organîzasyonan çêdikin û tevî bêîmkanîya bi mêrane şer dikin. Lêbelê dijmin ne wisa ye. Ji dereveyê ehlaqê şer tevdigerin bêrehmin û her ku dikevin zorê fêlbaziyê dikin. Loma jî berê xwe didin olê û li ser pîroziya baweriyê dikeve nav xapandinan. Ol di destê 'êdin' de bûye amûr û bo bînpêkirina wan bi her awayî tê şixulandin. Ev bikaranîna ol bo xapandina kurdan di gelek cihan de derbas dibe 'Dîwana romê ji roja xuliqandina xwe û heta niha her dem bi pêpezkirina Quranê, fêl û finazên xirab û xayintiyê êrişî ser kurdan kiriyê(Ş.L - 25)'. Di van hevokan de jî gelek aşkere xuya ye ku sîyaseta dijminan bi her awayî li ser têkbirina kurda hatiye avakirin. Lewma di rihê wan de para camêrîyê nemaye û durûtî jî ehlaqê wan e. Di vî ehlaqê de têkbirina kurdan, ji bînpêkirina Qûran û olê mûhîmtir e. Jixwe di gelek cihan de li ser nerastbûn û bêdadbûna tirkan em pêrgî gotinên wiha tîkên 'Kurdan dîwana Tirkîyeyê nas nedikir. Gel nedixwest û nediçû dîwanxaneyê Romê. Gilî û gazincên xwe bi serekvanên wan nedikirin. Ji ber ku wan zanibû ku heke şikayeta wan here cem dîwanê nayê safîkirinê (Ş.L - 37)'. Di vir de jî wekî ku xuya dibe otorîteyeke tirkan heye lê belê ev otorîte ji aliyê kurdan ve nayê qebûl kirin. Lewra dîwana tirkan wek cîhekî 'bêdadiyê' tê binavkirin.

Tirk, di roman û wejeya kurdî de, her ew kes e ku; dara desthilatê di destê wî/ê de ye û ew wê darê her ji bo têkşikandin, daşikandin, kuştin, tehdelêkirin, zorgankirin, bêrûmetkirin û hwd., bi kar tîne û loma jî pir bi hêsanî dikare di nav têrma, 'zordest' de

bê cîbicîkirin⁸¹ Bi rastî jî berhemên ku wê demê hatîne nivîsîn tirk û kurdan li ser lihevketina paqij-qirêj, heq-neheq, kûştin û talankirinê palbûye. Di vê romanê de jî heman tişt gergûhêz e û jixwe mijara romanê jî şerê di navbera artêşa tirk û serhildêrên kurd de ye. Di vî şerî de kurd çiqas baş in, tirk jî ewqas xerab in ‘...zilmkarên Romê ne xwedanên soza xwe ne. Tûkî erdê dikin û lez jî dialêsin(Ş.L - 86)’. Mêrane şer nakin şerê wan jî wek jiyana wan li ser xerabiyê avabûye. Şerê di navbera wan de her heye û hejmara kuştîyan ne diyar e. Herî dawî gelek kurd bi Şêx Saîd re hatine darvekirin û kuştin. Loma jî em di gelek cihan de pergî zordestiya tirkan tîn. Heta ku zordestiya ‘êdin’ digihêje raddeyeke wisa ku êdî ne mirov, dar û berên axên kurdan jî şikyeta xwe tînin zimên. ‘Ewr bi kelebela xwînêrêta neheq pey hev dikevin, berî hev didin û dixwazin dewsa baranê bi ser dagirkerên Dîyarbekirê de kevir û kûçikan bireşînin û bibarînin wekî tola Kurdên bêgûneh hildin(Ş.L - 26)’. Ji ber neheqîya ku li kurdan tê kirin, dar û ber jî êdî stara xwe ji wan tînin. Vegotîneke bi vî rengî dijwarbûna şiddeta şer li welatê kurdan dîyar dîke û em hay jê çêdibin ku ‘êdinbûna êdin’ ne tenê bo mirovan e, ji nebat û ajalên welêt re jî ‘êdin’ e.

Di romana Şer li Çîya de têgeha ‘êdin’ jî netewekî bêhtir bi çînekê tê binavkirin. Helbet ev jî bi jiyana nivîskar ve girêdayîye. Eliyê Evdirrehman li sovyetê di binê desthilatiya sosyalîzmê de jiyaye. Rêvebirên sosyalîzmê jî rewşenbîran dixwastin ku bila di berhemên xwe de propagandaya pergalê jî bikin. Ji ber ku mijara romanê şerê di navbera kurd û tirkan de ye û cîhê şer jî ne li Êris li welatê kurdan e û romaneke dîrokî ye, zêde propogandayeke rejîmê xuya nake. Lê ew fikra sosyalîzmê ku çînen bîndest wek bira qebûl dikirin û qedr û qiymeteke mezin didayê wan di romanê de heye. Loma jî di çêkirina ‘ez’ ê de tevî kurdan, ermen û tirkên kedkar jî hene. Lê hin cihan nivîskar nikare xwe ji aliyekî xwe yê realîst-sosyalîst dûr bixe û bi mafên kurdan ên neteweyî re, behsa parastina mafên kedkarên tirkan jî dîke⁸². Herwiha di romanê de hevalê Şêx Zayîr yê herî nêzik kesekî Ermen e. Di vir de tiştê mûhîm tirkên kedkar in ku di gelek cihan de li ser vê meseleyê disekine û wan ne wekî ‘êdin’ lê wekî bira qebûl dîke. Nivîskar heta ku ji dest hatiye hewldaye “me” “wan” ku zêde homojenîze neke. Kedkarên “me” û kedkarên “wan” jî hene. “Ew” çiqas aliyê xirab temsîl bikin jî kedkarên “wan” bêguneh

⁸¹ Dilawer Zeraq, *Rajena Kurdî*, Weşanxaneya Lîs, 2014, r.30

⁸² Betül Çoban, “Lehengên Erenî û Şoresger di Romanên Kurdî yê Sovyeta Berê de”, *Kovar: Wêje û Rexne*, Hejmar: 9/10, 2018, r. 121

û masûm in.⁸³ Helbet vegotinek bi vî şeklî bê bandora sosyalîzmê nikare bê şîrovekirin. Ev hewldana ku nivîskar pêk aniye ya têgeha ‘ez’ û ‘êdin’ê li ser çi hîmê daye rûniştandin jî li me dide nîşandan. Lewra di nav gelan de hevpariyek hatiye zevtkirin ji aliyê mezlûmbûnê ve kedkarên tirk dostê wan in, lê dewletên wan neyar in. ‘em gelê Tirk gişk nikarin wek zilmkar hesab bikin. Gelê Tirk ê resen û kedkar jî mîna Kurdan tenê zêrandine(Ş.l, 2011: 53)’. Jixwe di romanê de bi sernavê kesayeta Elîqûlî rewşa biratiya di navbera tirk û kurda jî tê ravekirin. Elîqûlî kesekî tirk e û berê demekî li gundekî Wanê tevî kurdan bi aramî jiyaye, lê ji ber hin sedeman dewleta Romê dixwaze kurdan li wir sirgûn bike, lê belê tirk vê tiştê qebûl nakin û li hemberî dewletê şer dikin. Di dawiya vî şerî de jî Elîqûlî jî tê sirgun kirin. Piştî ku hîn dibe li welat serhildanek destpêkiriye tê û bi dil û can beşdariyê serhildanê dibe. (Ş.L - 182-183). Lewra ew şerê di navbera kurd û tirkan de ne şerê dû miletan e, ev şerê xerabî û başiyê ye. Ji ber vê yekê jî têgeha ‘ez’ bûye ‘em’ û li hemberî ‘êdin’ dîwarek ava bûye. Di vî diwarî de jî tevî ermenan her çiqas dewleta tirka zilmê li kurdan bike jî tirkên kedkar jî hene.

Leheng di hûnera vegotinê de hem amûr hem jî meqsed e.⁸⁴ Li ser avakirina karakteran em di derheqê ‘ez’ û ‘êdin’ de gelek taybetiyên hîn dibin. Şêx Zayîr û hevalên wî ne ku ji ber kurdbûna xwe baş in. Başbûna wî û hevalên wî ji heqûbûna wan tê. Loma jî di romanê de gelek kurd hene ku ji ‘êdin’ bêhtir heqeret li wan tê kirin. Mînak dema di şer de gelek leşkerên dewletê tîr desteserkirin, Şêx Zayîr hîn dibe ku di nava wan leşkeran de hin kurd jî hene, Şêx Zayîr hêrs dibe û wiha dibêje ‘ Em Kurd alîgirên heqîyê ne, heta neheqîyê li me nekin em destê xwe nadine tu kesî! Lê hûn Kurdfiroşan, we ji birayê xwe xêr e? We xîret û namûsa xwe firotîye dîwana Tirkên erzel(Ş.L - 127)’. Jixwe di dema taswîrkirina ehlaqê wan de jî em liqayî gotinê wek ‘ xwefiroş, bênamûs, rûşvetxwar û hwd in’tên.

Di honaka bûyeran de kurdfiroş û dewlet hertim li hev dikin. Di bin siya vê lihevkerinê de jî zilmê li kurdan dikin, dest diavêjin keçikan, mala dişewîtînin. Di romanê de karaktera Simbil jî pir bi balkêş e. Simbil hezkiriyê Şêx Zayîr û keça kurdfiroşê Edo axayê ji dewletê re xîzmetê dike ye. Ew û Şêx Zayîr bi nameyan xeberê ji hev dîstînin, di gelek nameyên xwe de Simbil jî bavê xwe wek kurdfiroş binav dike ‘ez ne keça xayînan im’ û di dawiya nameyên xwe de jî wek ‘keça neteweya xwe(Ş.L - 63, 75)’

⁸³ Fahriye Adsay, *Romana Kurdî (Kurmançî) Ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname*, Teza neçapbûyî, r. 46, Mêrdîn, 2013

⁸⁴ Mehmet Tekin, *Roman Sanati*, Weşanxaneya Ötüken Neşriyat, Çap: 15, 2016, r. 95

binav dike. Ev binavkirin di gelek cihan de derbas dibe. Di mala kesayetekî ‘êdin’ de karekerekî wiha baş ku hetanî dibe hezkiriyê lehengê me gelek balkêş e. Tê dîtin her kurdê ku tekiliya wî ya bi menfeatî bi dewletê re heye ehlaqkerab e û ji ber van taybetiyên xwe jî ‘nejime’ ye.

Êdin her wextê rola xwe ya dîrokî listî ye û heta ku ji dest hatiye hewl daye çalakiyên xwe yên di mêtîngê de bi ser bikeve. Ji ber vê yekê jî polîtîkayên xwe yên asîmîlasyonê ji axê zêdetir li ser hişmendîya kesayetan ava kiriye. Loma jî dest dide hin kesayetên herêmê, wan wek namzedê xwe hildibijêre û ne ew lê bi ‘ez’ê re tê lihevixistin. Bi gelemperî jî ev rol li ser karmendên kurd ên bo dewletê dixebitin û axa û begên xwediyê otorîteyekê ne tê runiştandin. Lewra dagirkirina kesayet û hişê milletekî ji dagirkirina ax û welatê bêhtir ziyane dide neteweyekî. Bo vê yekê jî bi piraniya romanên kurdî de kesên têkiliyên wan bi dewletê re heye, wekî kesên xerap û nebaş tê qebûlkirin. Edo yê bavê Simbil hem xwediyê hêz e û hem jî karmendê dewletê ye, jixwe hemû kesayetên xerab hêza xwe ji dewletê distînin. Zagon li aliyê wan e û bi şûrê dewletê fermanan radikin. Ji ber van taybetiyên xwe ew di kategoriya ‘êdin’ de ye û ji aliyê keça xwe wek ‘Kurdfiroş’ tê binavkirin. Bi hiş û tevgerên xwe Edo û kesayetên wek wî sembola ‘êdin’bûna kurdan e. Bi saya van karekteran em dibînin ku kesayetiya kurda ji axa xwe hatiye dûrxistin û di welatê xwe de wek ‘êdin’ maye.

Di vê romanê de ‘ez’ li hemberî ‘êdin’ di nav berxwedanekê de me. Nivîskar li ser navê şêx Zayîr pêvajoya dîroka kurdan û serpêhatiya hebûna kurdayetîyê li hemberî zilma dewletên serdest tîne zimên. Bûyerên di romanê de diqewimin tevî ku çavkaniya xwe ji dîrokê hildigrin jî nivîskar hin tiştan li ser ve zêde dike. Loma jî şêx Zayîr êdî ne karekerekîyê romanê ye, ew dibe sembola serpêhatiya berxwedana kurdayetîyê, bi saya vê simbolê haya me ji van texrîbatên serdestan ku li civakê kirine, dibin.

Nivîskar romana xwe wekî ku bibêje berdewama wê yê bê diqedîne. Di dawîya romanê de jî behsa beşa duyem dike, lê belê xwesteka nivîskar pêk nayê û cîlda duyem nayê nivîsîn.

BEŞA SÊYEM

1. Hêmanên Folklorîk Di Romanên Elîyê Evdirrehman De

1.1. Wêjeya Gelêrî

Wêjeya gelêrî bi wateya xwe ya din mehsûlên edebî yên ku ji aliyê gel ve hatiye çêkirin. Lê belê ne diyare ku ji aliyê kî/kê ve hatiye afirandin. Yanê di eslê xwe de wêjeya gelêrî ne li ser plan û projeyan, xwe bi xwe serobero derketiye. Nivîskaran jî ev amûr û mehsûlên gelêrî herdem kirin bingeha berhemên xwe û ev gencîne piya hiştin û gihandin roja me. Lê belê tesnîfkirin û dahûrandina van berheman de niqaşek hebû ku nêrînek çawa wê herî zêde ji berhemê sûd werbigre. Piştî ku bi salan hat niqaşkirin (hê jî tê niqaşkirin) ku analîz, dê kîjan cure sernavan di nava xwe de bihewîne û sernav dê çawa bê tesnîf kirin. Her sala ku hat, ji bo berhem baştir bê fêhmkirin û her gencîne bê derxistin sernavek li ser wêjeya gelêrî hat zêdekirin û nêrînek berfireh derket holê. Lewre nivîskar wexta ku ew berhem dinivîsand, diket bin bandora dema tê de dijîya û bi vê bandorê behrem serbixwe dibû neynika wê demê û me hînî gelek tiştan dike. Êdî gava ku em berhemekê analîz dikin çî aliyê dîrokî, olî, rêzimanî, çandî, hûnerî, ehlaqî, kelepor û kevneşopî, eded, tore, terz û hwd. êdî bi pûtepêdî em radixî ber çavan.

1.1.1. Yên Helbestkî (Menzûm)

1.1.1.1 Kilam

Kilam li ser her tiştî û her rewşê tê strîn. Ji baweriyên hilde heta kêfxweşiyê ji alema hilde heta rûhîyeta civatê hemû jî dikarin bibin mijara kilaman. Ji ber ku mirov di kilama de xwe dibîne, ji kilama gelek hez dike û di dema şahiyande jî di dema şînan de jî serî li kilamê dide. Thomas Boîs di wê qeneatê de ye ku kurd li her derê, her gav stranan dibêjin. Hemû pîrozbahiyên di nava malê de, bûyîna zarokan, sinet, dawet, şevbûhêrk, dem û zikir, heya dema ku yek dimire jî, li her qadê û gavê kilam tene gotin.⁸⁵

Yek jî çavkaniya çanda kurda kilam in. Lewra hezkirin, şikestin, xweşbînî û hemû hîssiyatên mîrovahiyê di kilama de xwe didin der. Bi gotineke din hemû xweşûbeşiya gel di kilama de xwe der dixê. Di hinek cihan de em hew dizanin ku

⁸⁵ Tekin Çifçi, *Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê– Kilam Û Jin*, Weşanxaneya Nûbihar, r. 160, 201

kilamek tê gotin ji xeynî vê tu agahî nîn e “Ev sazbandî û kilam ji dûr ve zehf li xweşa Selîm Begê dihat (M.R – 34). “paşê Morof dest bi stranê kir”(M.R – 56).

Di hinek cîhan de gotinên strana derbas nabin, tenê ji aliyê mijar û wateyê ve behs lê tê kirin.

“Lawo ca çend qaydeyên mêran û began bibêje, bila begê te bibihê” (M.R – 36) “Di odeyekê de jî dengbêj kilamên siwaran û yên bengitiyê dibêjin” (M.R – 101), “Lê kilamên dayikên ewladkuştî”(Ş.L – 18) “Cimaeta Kurdan çi qas kilam avêtine ser qehremanên xwe, lê mêrxasên wisa ne yek û ne dudu ne, temamiya cimaeta Kurd e”(X.X – 10) “kilamên siwaran û yên mayîn digotin”(X.X – 77)“...bi dû girîn û kilamên siwaran re, cimaeta hatî di konan de rûniştibû.”(G.M – 71) “Zimezim ketibû nava êlê. Nalenala nexweş û birîndaran, kilamên jinan, ku davêtine ser kuştîyên xwe, dilê merivan dipertandin”(G.M – 75)

Hinek stran tenê bi navê wan tên behs kirin. “Paşê kilama evdalê Zeynikê got. Wî gote biguheze îcar Morof ya Şerê Gîrîdaxê got, ... Morof ya Axao, Ezê Li Eleganê Ketim got û bilûrê xist” (M.R – 37). “Hema di nava vê xeberdanê de, wî kilama Filîte Quto qirandê” (M.R – 38) “Wî berê kilama Sîyabend û Xecêzerê got” (M.R – 39). “Keçikan Hoy Narê gotin, li dora wê listin” (M.R – 98), Seba ewled ne axir dê lay û lay gotiye, kilama *Cibrî wîlandiye*. Xew neketiye çavan, bêşik hêjandiye”(G.M – 99)

Di hinek cihan de ji bo atmosfera rewşê bide hîskirin tenê nav û meqama kilaman tê gotin “û di axiriyê de meqama Sîyabend û Xecêzerê digot û bi wê re kewgirî dibû ” (M.R – 34)

Di romana morof de tevî navê kilamê, çîroka Sîyabend û Xecê jî tê gotin û bi vî awayî vegotin jî tê xûrttir kirin. “Morof dest bi kilama Sîyabendê Silivî kir. Dengê morofê zîz û zelal dilê merivan diheland”(M.R – 36)

“Kê dît min meha Sibatê

Du gul şîn bûn li Xelatê” (M.R – 37)

Di hin beşên romanên de kilam ji aliyê lehengî ve ji bo derbirîna hest û kêfxweşiyê tê vegotin. Xanimzer, eşq û evîna di dilê xwe de bi vê kilamê tîne zimên:

“Ez bengî me, ez bengî me
Sêveke sor e Xelatî me
Li ser kurapê keleş bengî me
Wextê ez bejna bilind nabînim
Ez ji huba wî firîme” (M.R – 97)

Di Şer Li Çîya de dengbêj kilam diavêjên li ser Şêx Zayîr û fedayîyên wî yên ku li hemberî dijmin tol hildane. Navê kilamê ‘Kilama Şerê Girîdaxê’ ye. Gotinê kilamê ev in:

“Bê lo, lo, wî, lo, lo, lo, lo,
Bê lo, lo, wî, lo, lo, lo, lo,
Kesekî xwedan xêrê tu nîn e,
Bersivekê bide bereka Girîdaxê.
Bê Şêx Zayîr, Birahîm Axa, Ferzendê,
Ehsan Nûrî û Reşoyê Silê we mal xirab be,
Bizanibin sed û pêncî hezar leşkerên Romê
Bi nîzam top û teyare hate ser we.

Ez ê Wanê, Qulpê, Agdaşê ketim nava dinê,
Arteşa Tirkan kişîya ser Kurdan bi êrîşa lêxistinê,
Şêx Zayîr kire gazî: Birano çêbin, çê bixebitin,
Tirkên decal, ji welatê xwe derxînin,
Herke zilamên xelqê mirovên dereken e.
Fesadê me Edo Axa Îsayê Qotî Hodikê dîn e.

Bê de dayê rebenê şerekê me qewimî
Gelî, newal, beralê binetara Girîdaxê,
Qaleke me qewimî qeya, zinarê Girîdaxê,
Nêzikî zagê şikevtên bereka çîyê,
Dengê teyaran û topan tê ji jorê ve,
Na waleh, xwîşk û birano, hinda belekîyê.

Şêx Zayîr kire gazî: çêbin, çê bixebitin,
Jor qeweta me Xwedê ye, jêr guman Kurd in,
De, fedayî nolêxin, bav û birano lêxin,
Piştê li leşkerê Kemal bistînin, revê pê xin,
Leşker qir kin, top û teyaran bişewitînin,
Nav û dengê Kurdan bi dinê xin...

Şerekê me qewimîye bereka Girîdaxê
Qeya, zinara, kol û kosa li hember e,
Gava Şêx Zayîr efendî Nijdî siwar dibe,
Bi hezaran lawên Kurdan xwe didine ser e,
Şêx Zayîr gumana bextê jaran e,
Dijminê qayde-qanûnên decalan e.

Qesasê serê xwînmijên Tirkan e,
Mêrxas e, leheng e, ji mala şêxan e.
Şerek e qewimîye Girîdaxê jorê başkendê,
Li rasta hinda pirê,

Destê leşkerên Romê de top, reşaş, gumbaran e,
Lê destê lawên Kurdan de piçûkçapê qundaxgir e.

Bê wayê, wayê, wayê, l imin wayê,
Top qumbarên vî kafirî ser lawên.
Eşîretê de tenê fenanî kayê,
Xwedê mêr dizane îsal çend sal e,
Lawên eşîretan pêşîya Tirkîyayê asê bûne,
Ne tên kuştin û ne jî têne rayê...

Me nizanibû şert û şîrûtên dewletê wê li me wa be,
Wê teyaran bide xebatê tamam ordîyê rabe,
Fedayîno, birano, de lêxin, lêxin û dîsa lêxin,
Revê bi artêşa decal Mistefa Kemal xin,
Ji wargeh û welatê xwe derxin,
Navê Kurd û Kurdistanê bi dinê xin...’’(Ş.L – 338)

Eliyê Evdirrehman jî di roman û novelên xwe de û gelek cihan de behsa kilaman dike. Bi taybetî jî di novela Morof de ev behs zêde berbiçav e. Dibe ji ber ku Morof şivane û pê re jî dengbêjek jêhatiye loma jî nivîskar bi hewla ku repertûara Morof dewlemend nişan bide tevgeriyaye. Herwiha nivîskar, naveroka romana Şer Li Çiya jî bi kilamên mêrxasiyê tije kiriye. Tê dîtin ku kilam di van berhemana de li gor atmosfera ku karakter tê de dijîn hatiye bikaranîn.

1.1.1.2. Helbest

Di roman de bi awayekî xurt behsa helbest û helbestvanan nayê kirin. Tenê di hinek cihan de derbas dibe û bi me dide zanîn ku haya karakterê me ji helbest û helbestvanan heye. “Wexta hinek helbestvan û kurdzanên welatên derve li Kurdistanê geriyar” (Ş.L – 25) “Ew helbest û beytên helbestvan û nivîskarên Kurda heylo ji sedsala derbazbûyî hatine” (Ş.L – 25), “Ji bedlîsê helbestvan Kemalê Feyzo dibêje” (Ş.L – 27)

Di berhemên Eliyê Evdirrehman de tevî ku kilam û stran gelek in û şahî, şevbûhêrk û civat zêde ne jî, ji xeynî romana Şer Li Çiya behsa helbest û helbestvanan nayê kirin.

1.1.2 Yên Pexşan

1.1.2.1. Destan

Destan yek jî hûnera herî girîng ya gelan e ku di hemû wêje û çanda dinyayê de bi awayekî derketiyê holê. Koka destanê ya rastî nayê zanîn, lewre xwe digihîne demên gelek kevn. Destan bi giştî xwediyê xisletên xurt in. Çawa ku di serî de hiş û dilê milletan îfade dike, herwiha hemû hal û rewşên jiyane çî şer be, çî eşq be di naveroka destanê de cih digirin. Loma jî bi saya destanan em di derheqê civakê de dibin xwediyê gelek agahiyên bi qîmet. Lewre destan li ser hîs û xeyalên hevbeş ên civatê pal dide. Hiş û bîra gelan bi rêya destana derdikeve holê.

Wekî hemû gelan di nav kurda de jî gelek destan hene. Lê destanên evîni û qehremaniyê di kurdî de zêdetir derdikevin pêş. Destanên kurdî piranî helbestkî nin û ji aliye çîrokbêj û dengbêjan ve tên strîn.

1.1.2.1.1. Siyabend û Xecê

Yek jî destana xwerû ya bi kurdî Siyabend û Xecê ye ku, bi nav û deng e û di şevbihêrkan de ji aliye dengbêjan ve bi gelek awayan hatiye strîn. Di novela Morof de jî Selim Beg ji morof dixwaze ku bila çend qaydeyên mêran û began bibêje û cimeta rûniştî şên bike. Li ser vê xwestekê Morof tevî kilamê, çîroka Siyabend û Xecê jî vedibêje. “Morof dest bi kilama Siyabendê Silivî dike. Dengê Morofê zîz û zelal dilê merivan dihelîne. Cimaeta li dora wî xwe winda dike, di fikra xwe de ew derbasî êlê Mîrê Ereban bû, li pêşberî wan konê mîrxasên Kurda, heft birayên Xecê hebûn, li aliye din jî zorbetiya Mîrê Ereban bû. Li miqabilî wan, du dilên hev hebandî sekinîbûn; Siyabend û Xecê. Va ye daweta Xecê ye, ew dawet ne bi dile milletî Kurd e, lê kesek

turuş nake ku miqabilî wê nepakiyê şer bike. Gelo Milet ji lebat ketiye? Millet miriye? Nikare yekî wisa ji paşila xwe derxîne, ku li hemberî wê bêqaydetiyê şer bike? Na. Milet nemiriye. Yekî nolî Siyabend ewladê wî milletî ye. ew li ser piştê hespê, nolî birûskê xwe bi dawetê re digihîne. Kî ku dixwest ew bê namûs bikira, ew wan bê namûs dike. Li ber çavên hemûyan Xecê davêje terkiya xwe û direvîne. Lê zordestî û xerabiya zilmkaran li pêşiya mirazê wî sekiniye. Çiqlên darê di paşilê re diçin xwarê. Serê Sîpanê Xelatê dûman û mij e. Ew dûman û mij zilma dewlemendan e. Hêsirê Xecê zêlûliya milletê Kurd e. Xecê qîza milletê xwe ye, wexta ku ew nebû xurê ewladê vî milletî, ew naxwaze bibe xûrê dewlemendan. Ew xwe ji jor de davêje û her du dimirin. Belê, zilmkaran ew kuştin, lê nikaribûn huba dilê her duyan bişkînin. Û Morof distrê:

Kê dît min meha Sibatê

Du gul şîn bûn li Xelatê” (M.R – 37)

1.1.2.1.2. Mem û Zîn

Yek jî destana evîniya herî bi nav û deng ya kurda bêguman Mem û Zîn e. Di hin pasajên romanê de dema dildar bêhteng dibin û dikevin hubbê, evîna Mem û Zînê tînin bîra xwe, ji wê eşqê hêz digirin û ber xwe didin.

“Bengîti her qewimandineke giran û çetîn *alt* dike, bi wê gumanê li ber her çetinayiyê bi mêrxasî şer dike. Însan carinan seba evîntiyê mîna Mem û Zîna me dibe xwelî û ji dinyaya ronik koça xwe bar dike.”(G.M – 98) “Evdilmecîd axeke kûr kişand, bi cureyekî çavên xwe vekirin, ecebmayî li Gogê mêze kir, te yê bigota wê demê wî Mem û Zîn anî bîra xwe, lê wî dîsa *îna* nekir ku ew Gogê ye li pêşberî wî sekiniye, lê paşê *îna* kir, xwest baz de ser xwe, Gogê hembêz bike, lê birînen wî îmkan nedan ew rabe ser xwe.”(G.M – 106) “Hela wexta civata firqeyê, ku Qasim katibê uzeka wê hatibû bijartin, xût wê rojê huba her du cahilan ber bi hev keliya, te yê bigota mîna Mem û Zînê wan bi şev gustîlên xwe bi hev guherîne û bûne hezkiriyên hev” (G.M – 181)

“Ew şev bo Sultên û Zeynê şeveke herî kifş bû. wan bi zimanê xwe yê şêrîn gul û sosin bi ser hev de dilerandin. Qisekirinên wan ên xweş mîna belgên gulên ên bi bêhn ji ber hev û du derdiketin. Axiriyê wan bi hezkirina Memê û Zînê hev û du hembêz kirin û ketin xewa ya şêrîn” (X.X – 48)

Bekoyê Ewan yek jî karakterê destana Mem û Zînê ye ku, bi xerabî û xayintiya xwe ve tê nasîn. Di demên berê de kesê nebaş be, ji ber ehlaqê xwe yê nebaş wekî Bekoyê Ewan tên binav kirin. Di novela Xatê Xanim de jî pasajek bi vî wayî heye ku, qîz ji ber xayintiya wî, bavê xwe mîna Bekoyê Ewan dinasîne.

“Mala bavê te neşewite, gelo cayîz e tu ji niha ve pirsên wisa dibêjî? Tu her tim jî giliyên berê dikî, lewma jî cimaeta Dêrsimê ji Kurdan girtî heta milletên mayîn ji te hez nakin. Hurmeta te bûye kapêkek. Xelq te nas dike çawa Bekoyê ‘Ewanî. Rast e, li ber te ve tiştê nabêjin, lê li piş te ve navê te danîne Bekoyê ‘Ewanî, merivfiroş, geweze.’”(X.X – 60)

Ji xeynî van herdû destanê xwerû bi kurdî, di cihekî de jî behsa Leyla û Mecnûn tê kirin. “Tu carinan jî hinekan heta hetayê bedbext, rûreş, sergerdan berdidî çol û bestan, mîna Mecnûn dikî dinê dinyayê, ew bi şev û rojan li ciyekî nabetile, diçe ku bibe xwedanê nêta xwe, lê axirî dibe risqê tebayan, teyr û tûyan.”(G.M – 98)

Naverok û karakterên ku di destanan de hatine afirandin ji bo nasîna gelê kurd çavkaniyên xurt in. Lewre nêrina wan a civatê derdixîne pêş. Bi saya karakteran ve edet, ehlaq, bawerî û nirxên gelan jî tê destnîşankirin.

1.1.3. Vegotinên Qalipgirtî

Ev beş bi sernavên; Gotinê Pêşiyar, Biwêj, Dua, Xwestek, Nifir, Sond Xwarin û Soz Dan, Xatirxwestin û Xêrhatin, Heyirîn, Şîret, Bang Kirin, Leqeb (Navûnûçik), Berketin/heyfanîn, Gefxwarin, Bangkirin, Gotinên Lihevhatî pêk tînin. Naveroka van sernavan bi nasandina têgehên wan dest pê dike. Paşê jî bi mînakên ku di roman û novelan de hatine bikaranîn ev mesele hatiye bidawîkirin.

1.1.3.1. Gotinên Pêşiyar

Gotinên pêşiyar an gotinên mezinan em dikarin bi gelek navên cûda vê beşê pênase bikin. Lê naverok her yek e. Bi vê cûreya zargotinê her millet hest, raman, bawerî, ehlaq û jîyana xwe derdibire. Ev tişt pêvajoyek bê sero bin e, cara pêşî ji aliye kê/kî ve û kengê hatine gotin nayê zanîn. Gotinên vî şiklî bi demê re dibin xwediyê qalibek, ji aliye gel ve tînin qebûlkirin û dibin malê gel. Yek jî rola gotinên pêşiyar ew e ku di navbera rabirdû û dahatûyê de pîrek ava dike ku bingeha vê pîrê jî bi şîret û heqiyê tije dibe.

“Gotinên pêşiyên di nava pêvajoya dîrokê de weke zagonên neteweyan e ku şiklê wan jîna wan, kevneşopî û edetên wan destnîşan dikin. Gotinên pêşiyên di nava demsal û sed salên dût û dirêj de dişikilin û nîrxên dînyewî, olî û exlaqî yê civakan berpêş dikin. Çanda dîrokî ya civakê ji nîfşekê derbasî nîfşên din dikin.”⁸⁶

Ji gotinên pêşiyên re mesele jî tê gotin. Lewre gotina tê gotin ji meselê diniqûte. Bûyereke diqewime û encamek derdikeve holê. Piştî demên dirêj ev bûyer ji bo paşhatiyên xwe dibe mînak. Loma jî beriya ku tiştêkî pêk bê, mesele tê gotin. Mînakên bi vî rengî di romanên de gelek in. Çavkaniya gotinê dibe ku ji bûyerekê dînî an jî qewimandinek dirokî yan jî li ser efsaneyekê pêk hatibe.

Gotinên gotinên pêşiyên kurt û têr wate ne. Di derheqê vê meseleyê de Kadri Yıldırım wiha dibêje “Gotinên pêşiyên, gotinên qalibgirtî yê ku di demên berê de ji aliyê pêşiyên ve hatine gotin û ceribandînan wan ên cûr bi cûr nîşan didin û nîfş bi nîfş heta roja me neqil kirin wekî ‘gotinên pêşiyên’ tînin binavkirin.”⁸⁷

Bi awayekî giştî em dikarin bibêjin ku, gotinên pêşiyên di derheqê jîyan, ehlaq, edet, bawerî, wêje, hûner û edebiyata gel de fikrek dide me. Bi saya van gotinan em pêrgî nîrxên civatê tînin. Lewra ji kana pêvajoya sedesala dinizile û tê digihije rojên îroyîn.

1.1.3.1.1. Gotinên Pêşiyên Yê di Romana Morof de

Xwînxûr ji cimaetê re nabin yar

Gidîno di bextê we de me, zilma wiha nabe... Xwînxûr ji cimaetê re nabin yar(M – 14)

Dar li ser koka xwe şîn dibe

Lawo, dar li ser koka xwe şîn dibe(M.R – 16)

Xwedê pezê nêr bo kêrê daye

Kal û bavan gotine, Xwedê pezê nêr bo kêrê daye(M.R – 19)

Hoste necar, razê mîna her car, Xwedê yek e, dergah hezar

Xwedê kerîm e. Gotine, Hoste necar, razê mîna her car, Xwedê yek e, dergah hezar (M.R – 19)

⁸⁶ Hasan Çiftçi, “Ortak Atasözlerinin Hikayeleri: Farsi-Kurmanci-Zazaki”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2016, h. 3, r.8

⁸⁷ Kadri Yıldırım, *Kürtçe Dilbilgisi*, Weşanxaneyê Mardin Artuklu Üniversitesi, 2012, r. 389

Zêrker qedrê zêr dizane; kesîb dizane ku kesîp birçiye

Gotina kal û bavan e, dibêjin, zêrker qedrê zêr dizane; kesîb dizane ku kesîp birçiye(M.R – 22)

Ji valabûnê tişt dernayê

Apo can ji valabûnê tişt dernayê, ez jî dixwazim bixebitim, komekê bidime te.(M.R – 30)

Meriv bi sebrê hewleyê çêdike, eger bêsebirî hebe, hewle yê bişewite

Na lawo, hela ew roj dûr e, sebir bike, pêşiyar gotine, meriv bi sebrê hewleyê çêdike, eger bêsebirî hebe, hewle yê bişewite.(M.R – 30)

Ku xwedê pişta êtîman bûya, çima maran li ser pişta devê lê dixistin.

Eyşanê got:

- Ku xwedê pişta êtîman bûya, çima maran li ser pişta devê lê dixistin.(M.R – 33)

Li kê derê rastî heye, li wê derê xapandin tune

Nûrê ku ew pirs vekir, ew pirs bo gişkan zelal bû û ez ê îşev rehet razê. Çimkî li kê derê rastî heye, li wê derê xapandin tune(M.R – 33)

Aqil aqilan zêdetir e

Ew gelekî fikirî, tu rê nikaribû vebijarta, qerar kir here cem Eyşanê, aqil i aqilan zêdetir e, bê ew çi dibêje. (M.R – 41)

Bûk e bi dilê zavê ye

Lawo, belkî Nûrê li xweşa te nayê, dibêjin, bûk e bi dilê zavê ye, lê ev yek her derî derbas nabe, lê di nava kesîban de derbas dibe. (M.R – 47)

Gulî ye dirêj, aqil î kê e

Zînê xanim, de werin l imin û li vê qîza min binêhêrin. Lewma jî pêşiyar gotine, gulî ye dirêj, aqil î kê e. (M.R – 49)

Yek e heq û deh e neheq

Bavo, yek e heq û deh e neheq(M.R – 49)

Tu lingên xwe weke orxana xwe dirêj bike

Dêmek, Memik, ez li vir ne beg im, erê? Tu lingên xwe weke orxana xwe dirêj bike, xeyn ji qîzên began û dewlemendan, tiliya qîza kî bikî...(M.R – 52)

Ji rûto re vî berê avê jî yek e, wî berê avê jî

Lê wê çî bibe, kal û bavan gotine, ji rûto re vî berê avê jî yek e, wî berê avê jî, kul li kesî nayê, bila dewlemend ji xwe bitirsin.(M.R – 59)

Şîn û şayî birayê hev in

Şîn û şayî birayê hev in, lê gotinên min yên şayiyê ne.(M.R – 63)

Di tengasiyê de, meriv ji yarê diya xwe re dibêje, bavo

Na lawo, hûn her du jî rast dibêjin, kal û bavan gotine, di tengasiyê de, meriv ji yarê diya xwe re dibêje, bavo. (M.R – 68)

Yek yek e, dudu komek e

Hinekî bi pêş de werin, em bifikirin çawa pêşiyên gotine, yek yek e, dudu komek e (M.R – 75)

Avê ku li ser masî dibirrin, masî bi xwe hişk dibe

Çawa dibêjin, avê ku li ser masî dibirrin, masî bi xwe hişk dibe, bi rastî jî wisa ye (M.R – 77) (Dibe ku ev meseleyek nav gel de be)

Êtîm mekuje, bi tenê nanê wî ji dest bigire, bila here⁸⁸

Kal û bavan gotine, êtîm mekuje, bi tenê nanê wî ji dest bigire, bila here, êdî wê çaxê, ew bi xwe ji birçînan dîmir. Xelas bû çû. (M.R – 76)

Kar arê naxwaze

Zarokên xwe bidine ber xwendinê. Kar arê naxwaze, xebat li welatê mey ê aza de bûyeşûxûlê hûrmet û siyanetê (M.R – 90)

Meriv bi sebrê digihîje dûmika dirêj

Paşê min qerar kir, ku kal û bavan gotine, meriv bi sebrê digihîje dûmika dirêj. Û mine w qaxiz nexwend. (M.R – 99)

⁸⁸ Ev meseleyek e gelek berbelava nav gel de ye.

1.1.3.1.2. Gotinê Pêşyan Yên di Romana Xatê Xanim de

Berxa nêr her bo kêr⁸⁹

Çawa ku kal û bavan gotine, berxa nêr her bo kêr’’(X.X – 17)

Mêr ji mêran dikevin

Helbet lawo, mêr ji mêran dikevin, goştê mêran nayê kişandin.’’(X.X – 23)

Meriv bi sebrê digihêje mirazê xwe

Lawo, kal û bavan gotine, meriv bi sebrê digihêje mirazê xwe.’’(X.X – 23)

Meriv bi kulmê naçe dirrêşê

Meriv bi kulmê naçe dirrêşê! Yanê ez vê yekê meseleya kal û bavan çima dibêjim? Çimkî Rom hukimet e. Quweta wan hem bi sîlehan, hem jî bi ordiyê zehf e.’’(X.X – 30)

Mirina tevî êlê dawet e

Eger ew bimirejî, tişt nabe. Çawa ku kal û bavan gotine, mirina tevî êlê dawet e; tişt nabe, kurê min seba cimaeta hatiye zêrandin.’’(X.X – 39)

Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e⁹⁰

Zehf rast e. Xatê Xanim rast dibêje. Xatê Xanim, kal û bavan gotine, şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e’’(X.X – 53)

Hoste necar razê mîna her car, Xwedê yek e, dergeh hezar

Xatê Xanim, diya me! Li ber xwe nekeve, kal û bavan gotine, hoste necar razê mîna her car, Xwedê yek e, dergeh hezar. Qet fikaran neke’’(X.X – 53)

Gilî ji giliyan derbas bûye

Dayê can, lewma jî ez dibêjim, hûn bi ‘emrê min ve qet mijûl nabin. De dayê, gilî ji giliyan derbas bûye.’’(X.X – 54)

⁸⁹ Ji bo heman gotinê pêşyan binêre (X.X – 44)

⁹⁰ Ji bo heman gotinê pêşyan binêre (X.X – 75)

Roja reş a tevî cimaetê dawet e

Bila Xatê Xanima xwesiya min rind bizanibe, ez ne jin im, ez mêr im, li pişta wê sekinîme. Roja reş a tevî cimaetê dawet e.”(X.X – 62)

Ga şerjêdikin çerm dibîne, mêr dimire nav dimîne

Çawa ku kal û bavan gotine, ga şerjêdikin çerm dibîne, mêr dimire nav dimîne”(X.X – 62)

Jin bê xweyî dimîne har dibe; mêr bê xweyî dibîne, jar dibe

Ew meriv şaşmayî diman û di dilê xwe de digotin, kal û bavan gotine, jin bê xweyî dimîne har dibe; mêr bê xweyî dibîne, jar dibe.”(X.X – 62)

Meriv bi sebrê digihîje mirazê xwe

Lawo, bibêjine Kurdan, bila lez nekevin, meriv bi sebrê digihîje mirazê xwe.”(X.X – 73)

1.1.3.1.3. Gotinên Pêşyan Yên di Romana Gundê Mêrxasan de Strûyên nanê genimî hene

Cimaeta Kurdan di wextê de gotiye: “Strûyên nanê genimî hene.”. Bi rastî jî, strûyên nanê genimî te yê bigota zikê Riza Efendî qul dikirin..”(G.M – 19)

Namûs avêtine ber sê, sê jî qebûl nekiriye

Ne axir namûsa her kesî li wî şêrîn e, çawa ku dibêjin, namûs avêtine ber sê, sê jî qebûl nekiriye.”(G.M – 22)⁹¹

Tu çi bireşînî, tu yê wê jî hilinî

Ji vir û wiha de tu çi bireşînî, tu yê wê jî hilinî”(G.M – 22)

Rî dibine bihost, lê dijmin tu wextan nabine dost

Cimaeta me di wextê de gotiye: Rî dibine bihost, lê dijmin tu wextan nabine dost.”(G.M – 27)

⁹¹ Wersîyonekê din jî wiha ye: De dibêjin, namûs avêtine ber kelban, kelban jî qebûl nekiriye.(G.M – 164)

Mêr gotî mêraniya mêran ji bîr nekin

Silêman, kurê min, kal û bavên me gotine ku mêr gotî mêraniya mêran ji bîr nekin. Niha ez mêraniya wî mêrikî heta roja mirinê nikarim ji bîr bikim’’(G.M – 32)

Her tişt ji her tiştî derbas bûye

Lêbelê êdî her tişt ji her tiştî derbas bûye, alaya eskerê Xoyê hatiye ser me.’’(G.M – 40)

Mêr ew e ku paşê bikene, lê ne ku di pêş de

Dilê min vê carê rihet bû, - wî got, - mêr ew e ku paşê bikene, lê ne ku di pêş de’’(G.M – 41)

Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e.

Cimaeta me rast gotiye, şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e.’’(G.M – 45)

Meriv di roja teng de ji yarê diya xwe re dibêje bavo.

De gelî xwîşk û birayan! Meriv di roja teng de ji yarê diya xwe re dibêje bavo.’’(G.M – 46)

Goşt bê hestî nabe

Ev îsal çend sal in ez li ser hidûd im, xên ji çend merivan, min ji xelqê mayîn tu xerabî neditiye. De cimaet dibêje, ‘Goşt bê hestî nabe’.’’(G.M – 77)

Gilî li erdê namîne

Cimaeta me di wextê de gotiye, gilî li erdê namîne’’(G.M – 93)

Mî ber bi berxa xwe dikale û diçe, xezal jî ber bi kara xwe.

Belê, di dinyayê de, tu tişt mîna bengitîtiyê şêrîn nîn e. Her tişt rind e di wexta xwe de. Mî ber bi berxa xwe dikale û diçe, xezal jî ber bi kara xwe.’’(G.M – 105)

Kurmê darê ne ji darê be, dar ê hezar salî bijî, reh bide, ber bide

Cimaeta me Kurdan çi qasî rind, çi qasî letîf gotiye, ‘kurmê darê ne ji darê be, dar ê hezar salî bijî, reh bide, ber bide.’’(G.M – 135)

Mêr bê xwedî dibe, jar dibe; jin bê xwedî dibe, har dibe

Çawa ku cimaeta me dibêje, mêr bê xwedî dibe, jar dibe; jin bê xwedî dibe, har dibe.’’(G.M – 160)

Gîha li ser koka xwe hêşîn dibe

Elo efendî! Axir gîha li ser koka xwe hêşîn dibe.”(G.M – 161)

Heta nebe qal, nabe mal

Cimaeta me rind gotiye, heta nebe qal, nabe mal. Belê, her pirseke hucet gerek bibe qal û paşê bê safikirin.”(G.M – 167)

Culhet rewşa mêran e

Çawa ku kal û bavan gotine, culhet rewşa mêran e.”(G.M – 171)

1.1.3.1.4 Gotinên Pêşyan Yên di Romana Şer Li Çiya de

Mal û êl maka mîrovan e⁹²

Xezê Xanimê got: ‘Bes e, bes. Hûn bavê xwe bipesînin, bavê we jî we. Mal û êl maka mîrovan e(Ş.L – 44)

Giliyên malê ji sûkê derbas nabin⁹³

Çawa gel dibêje giliyên malê ji sûkê derbas nabe(Ş.L – 45)

Kî derê birê mezin heye, birê piçûk serê xwe erdê xistiye

Bira! Wisa nîn e, kî derê birê mezin heye, birê piçûk serê xwe erdê xistiye(Ş.L – 48)

Aqil ji aqilan zêdetir e

Zayîr paşê hat ser wê nêrînê ku wekî gazî Ûsivê bira bike da wê pirsgirêkê bi hev re çareser bikin; aqil ji aqilan zêdetir e(Ş.L – 63, 279)

Tu vî camerî nas dikî?” yê mayî dibêje: ‘Min bi wî evdî re hevaltî nekirîye

Na axir gele me di wextê de rind gotiye: Tu vî camerî nas dikî?” yê mayî dibêje: ‘Min bi wî evdî re hevaltî nekirîye(Ş.L – 66)

Ji deveyê mezintir fil e.

Ji min re bibêje, bes e. Ji deveyê mezintir fil e. Vê carê ez ê rasterast herim cem serkarê navçeyê, de te bihîst”(Ş.L – 68, 91)

⁹² Versiyoneke din jî wiha ye: Êl maka mirovaniyê ye(Ş.L – 180)

⁹³Versiyoneke din jî wiha ye: Axaftina malê li sûkê derbas nabe(Ş.L- 51)

Her çêlek tê dotinê, lê her gilî nayê gotinê

Ax, lawo, Her çêlek tê dotinê, lê her gilî nayê gotinê.”(Ş.L – 71)

Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e

Birako, şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e”(Ş.L – 76, 148, 333)

Xwedê berxê nêr ji bo kêrê daye

Ji meydana şer rev ne mêranî ye. Xwedê berxê nêr ji bo kêrê daye”(Ş.L – 83, 115)

Ji piran pir, ji hindikan hindik

Ji piran pir, ji hindikan hindik! Heya tilfya min û Etar bixebite em ê dijmin fena gîhayan li erdê raxînin”(Ş.L – 83)

Ter û hişk tev hev dişewitin

Dû fermana Walî re, efserê cendirmeyan û Memo di nava çend rojan de çawa dibêjin agir û alav bi gundên Kurdan xistin. Ter û hişk tev hev dişewitin”(Ş.L – 107)

Namûs avêtine kuçikan û seyan jî qebûl nekirine

“Gel dibêje wekî namûs avêtine kuçikan û seyan jî qebûl nekirine”(Ş.L – 132)

Sêwî ne bigire ne jî bikuje, nanê wî ji destê wî bigire, bedre. Ew ê xwe bi xwe li ser kulîlkan ji birçîna hişk be!

Çawa gelê me û wîsa jî yê we bibêje: “Sêwî ne bigire ne jî bikuje, nanê wî ji destê wî bigire, bedre. Ew ê xwe bi xwe li ser kulîlkan ji birçîna hişk be!”(Ş.L – 141)

Serê beraz tînin datînin ser xalîçê, ji wir dişiqite dikeve nav zibil

“Gel di wexta xwe de rast gotîye: ‘Serê beraz tînin datînin ser xalîçê, ji wir dişiqite dikeve nav zibil”(Ş.L – 147)

Jin diçine xwînan, xwîn safî dibin

Eger wan ku xwestina bavê te red kirin, layê, **Jin diçine xwînan, xwîn safî dibin.** Ez dê herim ji wana hêvî bikim”(Ş.L – 157)

Merî germegerm hesin dikûte û çî dixwazî jê dikarî çêkî, lê wexta ku sar bû, êdî ji hesin nikarî tişteki çêkî

“Gelî lawikan, kal û bavên me di wexta xwe de rast gotine: ‘Merî germegerm hesin dikûte û çî dixwazî jê dikarî çêkî, lê wexta ku sar bû, êdî ji hesin nikarî tişteki çêkî’”(Ş.L – 199)

Bila mirov kuştî be, kuştîyê mirovê çê be, wexta ku bikuje wê çal ke jî⁹⁴

“Şêx Zayîr, min ji zû ve bihîstîye ku wekî xelqê we dibêje: Bila mirov kuştî be, kuştîyê mirovê çê be, wexta ku bikuje wê çal ke jî”(Ş.L – 205)

Goşt bê hestu nabe

“Belê, goşt bê hestu nabe”(Ş.L – 212, 273)

Serê hezar newalî, newalek e, serê hezar mêmî mêmek e

“Gelê me di wexta xwe de gotîye: ‘Serê hezar newalî, newalek e, serê hezar mêmî mêmek e.’ Tu wê gotina gelê xwe jibîr nekî?”(Ş.L – 254, 312)

Heke mirîyê xêr be, qazî û axwînd bi xwe tene ser wî

“Ehmed, milletê we di wexta xwe de rast gotîye, ‘heke mirîyê xêr be, qazî û axwînd bi xwe tene ser wî’”(Ş.L – 283)

Kîder xar bû, bona wan ew der war bû

“Çawa gel dibêje, ‘kîder xar bû, bona wan ew der war bû’”(Ş.L – 297)

Mêrxas him di rojên qenc de û him di roja reş de rastî hev tên

“Gel dibêje, wekî ‘Mêrxas him di rojên qenc de û him di roja reş de rastî hev tên’”(Ş.L – 321)

Aqilê xwe bi golika biharê nefroşe

Qazî, a wisa ereba xwe daxêre rastê, were ser rêya rast û bikeve lawayan, aqilê xwe bi golika biharê nefroşe, çî hatî ser min dikî diredir.”(Ş.L – 321)

⁹⁴Versiyonekê din wiha ye: Kal û bavên me di wexta xwe de gotine ku: ‘Bila merî bibe kuştîyê wî mêmî ku dikuje û him jî defin dike, bira nebe kuştîyê wî mêmî ku dikuje, lê defin nake.’”(Ş.L – 282)

Gilî û behs siwar in, li erdê namînin, zû digihîjin cîyan

De çawa dibêjin, ku gilî û behs siwar in, li erdê namînin, zû digihîjin cîyan’’(Ş.L – 325)

Gîha ser koka xwe hêşîn dibe

Ne axir gîha ser koka xwe hêşîn dibe. Lê, ew lawên bavçê din av pêşmergeyên kîjan çîyan de ne, tu kes nizane!’’(Ş.L – 348)

Gotinên pêşiyên xwediyê wateyên têr û tije ne. Heta ku ji bo van gotinan kurd wiha jî dibêjin giliyên mezinan tu yê bibêjî ji ber belgên Quranê hatine girtin(G.M – 162). Vegotinên bi dûv û dirêj bi gotinên kurt rave dike. Di roman û çîrokan de wextê ku leheng dixwaze heqbûna xwe îspat bike yan jî rastîyek derxîne holê berê xwe dide van gotinan. Bi saya van gotinan mebesta lehengên romana baştir tê cih.

1.1.3.2. Biwêj

Herçiqas ji gelek aliyan ve biwêj û gotinên pêşiyên bişibin hevdû jî, di navbera wan de hin ferqên mezin jî hene. ‘‘Lewre beriya her tiştî di gotinên pêşiyên de darizandin heye. Hukim dide ku ev yek wiha wiha û wiha ye. Gotinên pêşiyandê şîret heye lê belê di biwêjan de şîret tune. Bi gotinek din, gotinên pêşiyên rewşê dinirxîne, sentezan dike û biryara erênî yan neyînî dide nîşandan. Lê belê biwêj ji aliyê teşeyî ve xwediyê awayên cîhereng in, an jî ya hê rasttir, biwêj teşeyeke hevpar zêde nadin xûyandan’’⁹⁵

Gelek formên biwêjan hene, hin biwêj di forma pirsan de ne, hinek bi tena serê xwe çîrokek dûr û direj in, hinek ji bo rewşeke bi taybet tîk bikaranîn, hinek jî wekî gotinên pêşiyên bi erka şîretkirinê tîk bikaranîn. Bi kurtayî em dikarin bibêjin ku hemû rengê jiyandê bi rengê taybet di vê qadê de cîh digre.

Biwêj jî wekî gotinên pêşiyên xwe dispêre tecrûbeyên gelan. Lê ji hûkme zêdetir îfadeyên qalipgirtî ne. Hinek wan mecaz in, hinek ji wan rastî ne, hinek ji wan dibe ku tu car nehatibe tecrûbe kirin jî. Biwêj bi giştî hevokên kin in ku hêza xwe ji hostebûna afirindêyî milletan ve hildigre û bi wateya xwe kur dagirî ne.

⁹⁵ Mustafa Borak, *Ferhenga Biwêjan*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Sal: 2014, r: 13-17

1.1.3.2.1. Biwêjên di Morof de

Ji xwe çûyîn

Û carekê din kesereke kûr hatê û ji xwe çû(M.R – 13)

Kûl rijandin

Lê wî dixwest kulên xwe li ber hevalan birêta (M.R – 13)

Di bextê yekî da bûn

Gidîno di bextê we de me (M.R – 14), (M.R – 84)

Dil hêsa bûn

Dilê wî hêsa nebû (M.R – 14)

Ketina belayê

We ez aza kirim, lê hûn ketin belayê (M.R – 15)

Hesabê ku di tizbiyê de tê derbas kirin

Heyf ku min wê çaxê hesabê wî di tizbiyê de derbas nekir (M.R – 16)

Agir li dil ketin⁹⁶

Agir li dil û hinavên wî ket(M.R – 17)

Xezeb hatin

Beg li me hatiye xezebê (M.R – 17)

Dil qîyarkirin

Dilê Morof qiyar nedikir(M.R – 18)

Xwîn xwarin

⁹⁶ Versiyonên din wiha ye: Agir û alav li dil û hinav ketin (M.R – 22), Agirê kulê li dil ketin (M.R – 25), Huba dilê min avête dilê wî (M.R – 99)

We êdî xwîna me xwar(M.R – 19)

Serê yekê/î xwarin

Yanê na beg ê serê wî bixwe (M.R – 19)

Dilê yekî/ê bûn

Zava gelekî dilê wan bû(M.R – 24)

Li xwe hesîn

Gulistan bi xwe hisiya (M.R – 25)

Li ber xwe ketin

Morof ji valabûnê roj bi roj bi şûn de diçe, li ber xwe dikeve(M.R – 31)

Post kişandin devexanê

Tu dizanî Selîm kul e, wê me bibîne, postê me bikişîne devexaneyê(M.R – 31)

Meniyan li yekî girtin

Wê êvarê me'niyan li me bigire (M.R – 39)

Pêsira xwe xelas kirin

A wiha ez ê bi vê yekê ve pêsîra xwe xelas bikim (M.R – 47)

Şerm ji şermê derbas bûyîn

Weleh êdî şerm ji şermê derbas bûye(M.R – 47)

Heft pihîn li gora bavê xwe xistin

“... Lê kurê wî Evdile êdî mêrekî lapî ‘eyan e, heft pihîn li gora bavê xwe xistiye, tucariya Wanê, Qaxizmanê, Qersê gişk hildaye destê xwe” (M.R – 50)

Dest hildan

Qersê gişk hildaye destê xwe (M.R – 50)

Berê xwîn reş kirin, û paşê dil geş kirin

Lawo, te çima ev pirsên aqilane ji berê de dest pê nekirin, Berê te xwîna me reş kir, û paşê bi van giliyên aqilanê ve dilê min geş kir (M.R – 50)

Pifkirina tozê li ser çavan

Lawo tu rast dibêjî. Lazim e hinek toz pif bikine çavên wî (M.R – 50)

Dil fireh bûn

Lawo, min digot, dilê xwe fireh bikin (M.R – 58)

Ji xwînê derbas bûn

Na lo, kî ji xwîna xwe derbas bûye (M.R – 64)

Xwelî li serê xwe kirin

Bavo çi xweliyê li serê xwe bike, gerek tu jî, Morof jî bi wan gotinê xanimê re razî bin (M.R – 68)

Ji çavan derxistin

Ez ê di çavên we re bînim! (M.R – 76)

Zik têr bûn

Dibe zikê wan têr bûye, lewma wiha dikin (M.R – 76)

Xwîna ku didin ber çavan

1700 malên Kurdan xwîna xwe dan ber çavên xwe, hatin welatê aza (M.R – 87)

Her du destan kor be û bi destan şil bibe

Kesek vê rastiye nikare bi cureyên mayîn bide guhestin, wê bi her du çavan kor be û bi destan şil be (M.R – 87)

Xwedanê gotinê

Milletê Ermenî çi milletekî baş e, xwedanê gotina xwe ye (M.R – 82)

1.1.3.2.2. Biwêjên di Novela Xatê Xanim de

Pî avêtin li ser cihekî

Dibêjin ku çi qas ordiyên dijminan, ku ji Rojhilat û Rojava hatine ser Kurdistanê, bi wana re li hev nehatiye piyên xwe bavêtana ser Dêrsîmê” (XX – 11)

Kelem di pišta dijmin de nikandin

Şukir ji vê rojê re û hezar şukir ku cimaeta min bi mêrxasî li miqabilî Romê şer kir û me kelemê xwe di pišta dijmin de nikandiye, ne ku wan di pišta me de...’’(X.X – 15)

Erebeya xwe daxistina rastê

Milazim erebeya xwe daxiste rastê, got’’(X.X – 21)

Xwîn avêtina mêjî

Îskenderê milazim ji wê xeberdana Sultên hêrs bûbû. Xwînê avêtibû mêjiyê wî.’’(X.X – 22)

Serê meselê vekirin

Cimaet li hêviya Xatê Xanimê bû, ku serê meseleyê veke, lê wê hela xwe giran digirt û digot.’’(X.X – 28)

Fikrên xwe cem kirin

Ya rast ew bû ku vê gavê bi zimanekî şêrîn Sultên bidine berdan. Karapêt fikrên xwe cem kirin, serê xwe bilind kir,’’(X.X – 33)

Tayekî bi tenê bûn

Diya te jî heye, dibe ku tu ji tayekî bi tenê bî wek Sultanê min’’(X.X – 34)

Dil qiyar nekirin⁹⁷

Dilê Xatê Xanimê qiyar nekir, gote dergehven’’(X.X – 34)

Ji şabûnê ling erdê neketin

Ji şabûnê lingê cimaetê erdê nediket. Şukirbûna xwe dianîn ku mêrekî mîna Sultên vê carê jî ji wê zilma Dewleta Romê derket.’’(X.X – 40)

Heft kiras xwe kirin û hef kiras jî qetandin

Ji xofa cimaeta hatî û tifaqa Kurdan, her cendirmeyekî heft kirasên teze li xwe kirin û heft jî qetandin’’(X.X – 46)

Kêra ku digihije hestî

⁹⁷ X.X - 59

Ya duduyan jî, gunehên Sultên ne ew qasî pirr in, ku wî dardabikin, yanê ji bikujin, lê wexta ku kêr ghişte hestî, ez bi guman im ez li Kurdistanê têkime hewar’’(X.X – 46)

Xem kişandin

Sultan, birayê min! Qet xeman nekişîne, em Kurdên Dêrsimê nemirine, hela sax in’’(X.X – 49)

Bi esmanîre xeberdan

Êh canim, ev sed û pêncî zêr e, lê mal û dewleta Têmûr têkeve destê min, ez ê bi esmanan re xeber dim’’(X.X – 57)

Dil pola bûn

Canim, dilê vê jinikê pola ye. pênc rojan û bi şûn de, wê kurekî mîna Sultên dardabikin, qet telaşa wê nîn e’’(X.X – 58)

wîn dan ber çavan

Canim, van Kurdên qezaya Dêrsimê xwîna xwe dane ber çavên xwe. Ji kuştin û ketina xwe natirsin.’’(X.X – 68)

Dest ji erd û esman qetandin

Xatê Xanimê caba têla duduyan jî nolî ya ewilîn stand. Destê wê ji erd û esmên qetiya, gumana wê bi tenê ma cimaeta Kurd a li qezaya Dêrsimê.’’(X.X – 69)

1.1.3.2.3. Biwêjên di Romana Gundê Mêrxasan de

Hay ji bayê dinyayê hebûn

Serkarê her sê êlan Çoloyê Temûr bû. Rast e, ew î cahil bû, ‘emrê wî dighişte sî û heft salan, lê çawa dibêjin, hay ji bayê dinyayê hebû(G.M – 17)

Koma li ser tasê bûn

Hûn koma li ser tasê ne, xên ji nê û xwarinê hûn dermanê tiştekî nîn in, nanê min li we heram be.(G.M – 20)

Aqilê xwe berhev kirin

Ji îro de aqilê xwe berhevî serê xwe bike, çawa ku lazim e bi me re xeber de.(G.M – 22)

Xwîna xwe kirina kevçî

Canim, weleh ev mêrik lapî qafseqet e, xwîna xwe kiriye kevçî, raberî cahilan kiriye.(G.M – 23)

Post kişandina devexaneyê

Dizanibû hinekî û bi şûn de wê postê wî bikişînine devexaneyê(G.M – 26)

Hol hatiye ber kaşo⁹⁸

Lawo, niha hola te hatiye ber kaşo, gidî, lê xe!(G.M – 27)

Hêsîr ketina ber devê kêrê

Hêsîrên me wê dîsa bikevine ber devê kêrê(G.M – 28)

Hêsa bûn

Riza Efendî hêsa be, çend rojan bi şûn de were cem min, bila Kurd jî rind arxayîn bibin.(G.M – 34)

Stû ziravbûn

Em hazir in her fermaneke Şahê Îranê biqedînin û stûyê me li ber maqûlên mîna te zirav e, hûn çi bibêjin, em hazir in...(G.M – 35)

Şayîş kişandin

Arxayîn be, şayîşa malê dinyayê mekişîne.(G.M – 36, 90)

Perdeya çavan tunebûn

De efendiyê me jî zor mêr e, perdeya çavên wî tuneye.(G.M – 37)

Kêr lêxistin, xwîn nehatin

Cimaeta çîtgirtî gişk posîde bûn, te kêr lê xista, piçik xwîn ji wan nedihat.’’(G.M – 45)

Lingê xwe gûhê xwe xistin

Di nava du saetan de, qumandarê eskerê Tehranê û serekê bajarê Xoyê dardabikin! Bila yên mayîn bizanibin ku lingên xwe li guhê xwe nexin.’’(G.M – 53)

Te derzî biavêtina dihate kifşê

Ew şeveke taveheyv bû. Te derzi bavêta erdê, wê bihata kifşê”(G.M – 80)

Pişt guhê xwe re avêtin

Mêrekî mîna Çolo ev saetek e ji we hêvî dike, hûn giliyê wî di pişt guhê xwe re davêjin.”(G.M – 81)

Dil dax kirin

Kurê min, Çolo! Bila hûn sax bin, me ji derdê dinyayê gelekî dîtiye, dax di ser dilê me re hatine kişandin”(G.M – 88)

Kelem di pišta neyar de nikandin

Eferim ji we re, lawo, we kelemê xwe di pišta neyaran de nikandiye û heyfa me gişkan ji wan hildaye.”(G.M – 88)

Mirov di çal salîya xwe de hînî sazê nabe

Navê te li temamiya dinyayê belav bûye, gelo ev gilî layîqî te ye, tu êvarê ‘erz û ‘eyalên xelqê bînî, gişkî têkî odeyekê, li ser navê xwendinê? Hûn di çilsaliyê de merivam hînî lêxistina sazê dikin”(G.M – 114)

Kevir ji pêşa xwe avêtin

Were keviran ji pêşa xwe bavêje û were ser riya heqiyê”(G.M – 114)

Pêşîr jê xilas kirin

Kuro Evdilmecîd, tu di van kincan de qet nayêyî naskirin. Diranê te kişandin, pêşîra te jê xelas bû, erê?”(G.M – 127)

Destê yekî ji erd û ezman qetandin

Destê Ezîm ji erd û esmên diqete, gelek pereyan ji bavê xwe distîne û diçe Tehranê”(G.M – 128)

Ling erd negirtin

Bavê, wexta ku heft heşt giliyên paşîn ji kur dibihîst, lingên wî erd nedigirtin.”(G.M – 129)

Dudu nekirina gilfyan

Wextekê, rispiyê gundê Dudengê, Reşoyê Şamilê Kurd bû. Rast e, ew di ‘emrê xwe de ne gelekî mezin bû, lê di nava cimaetên Kurd û Ezerî de giliyekî wî nedibû yê duduyan’’(G.M – 134)

Hevîrê ku avê gelek distîne

Yeqîn gunehê wî heye ku xwestiye bireve. Kifş e, ev hevîr ê gelek avê hilde’’(G.M – 140)

Hûkî kirine mûkî⁹⁹

Bavo, tu zanî, niha gundê me bûye ciyê nemanan, meriv gerek ‘etbara xwe bi tu kesî neyne, hûkî dikine mûkî. Giliyên gotî bi elbê re digihînine serkarê gund’’(G.M – 153)¹⁰⁰

Bayê dinyayê re belê kirin

Gedeyê duh na pêr, ku dihatine ber tenûrên me, stûyên xwe arşûnekê seba pariyekekî nan dirêj dikirin, lê îro qurre qurre destên xwe dikine cêba xwe, cixareyê dikine orta tiliyên xwe, bi bayê dinyayê re belê nakin.’’(G.M – 158)

Xwelî li serê xwe elek kirin

Ew jî nabe. Lê axirî çi bikim? Xweliya kê derê bi ser xwe de elek bikim ku yeke mîna Xezalê bedeyb nebe?’’(G.M – 163)

1.1.3.2.4. Biwêjên di Romana Şer Li Çîya de

Mêş di odê de bifiriya wê bihata bihîstîn

Xeberdana wî ewqasî şîrîn balkêş bû kumêş di odê de bifiriya wê bihata bihîstîn(Ş.L – 21)

Ser guhekî razan

Çawa gel dibêje, ser guhekî ranezabû(Ş.L – 29)

Xwelî di ser xwe de elek kirin

Wexta ku çav li mala bavê xwe ket xwelî di ser xwe de elek kir(Ş.L – 31)

⁹⁹ G.M - 167

Serî girtin

Helbet, ew meram û xwastina xwînmijan serê we nagire(Ş.L – 33)

Ketina xewa hingorê

Kurd jî neketibûne xewa hingorê(Ş.L 34)

Pişt sitandin.

Zayîr piştê ji ûsiv distîne û wexta ku şûr dide nav şûrê birayê xwe, şûrê Usiv di nivî de dibe du par(Ş.L – 40)

Rû dayîn

Bavê te gelek rû daye te(Ş.L – 40)

Ji qalib derxistin

Evda Xwedê! Xezê, tu mîrovan ji qalibê wan derdixî. Mine ewana hîn kirine, ew dê qet carekê zîrê nedine hev.(Ş.L – 40)

Tayê yekî bûn¹⁰¹

Ez dê çavên te derxim. Tu ne tayê wî yî(Ş.L – 42)

Ocax korkirin

Tu dê mala min bişewitînî, ocaxa min kor bikî(Ş.L – 42)

Gotin li erdê nexistin

Şêx Emer, gotinên helala xwe li erdê nexist(Ş.L – 42)

Qetla sor avêtin

Te qetla sor avêtiye stûyê Zayîrokî(Ş.L – 43)

Ber dil de çûyîn

Jin ber bi dilê wî de hat û te yê bigotaqy hinekîhêrsa wî danî û got(Ş.L – 43)

Tama şîr ji dev hatin

¹⁰¹Versiyonekê din wiha ye: Tayê malê ‘ Tayê me tenê nekujin, em hurmet guneh in’’(Ş.L – 114)

Lê hela tama şîr ji devê we herdûkan tê.(Ş.L – 44)

Rakirina zora zêran.

Tirk dixwazin beraz bibînin, lê Kurdan nebînin. Lê em ê rakine zorê zeran(Ş.L – 45)

Serî dew kirin

Me îşev ji êvar de serê xwe kire dew(Ş.L – 45)

Rûhê hev xwarin

Me di êvar de ruhê hev xwarin(Ş.L – 47)

Agir berdan û xwe dan alîyekî

Te agir berî zomê daye û xwe daye alîyekî(Ş.L – 49)

Pirs barandin

Derheqê wê rasthatina wan aji nişke ve Êsiv gelek pirs bi ser de barandin!(Ş.L – 54)

Namusa ku hatî bin av kirin

Wekî wî gawir kurê gawiran, pêzevangê pêzevengan namûsa xwe avêtiye bin avê û bûye tirkê eslî(Ş.L – 55)

Şîr dayîn

Hêdî hêdî pê dileyîzin, berê şîr didin gede; gede çend rojan ji wan dibe. Çawa dibêjin tahm dide devê gede(Ş.L – 57)

Aqil berhev kirin

Here aqilê xwe berhevî serê xwe bike(Ş.L – 62)

Por spîkirin

Lawo, min porê xwe li ber tavê spî nekiriye. Min qasî xwe jî xwandiye.(Ş.L – 78)

Şayîş kişandin

Wekî ku J1 min re bigota û ez bidana serwextkirinê, min ê wa şayîş nedikişandin(Ş.L – 85)

Çavê xwe reş kirin

Ji te bawer nakim, lewre te xwîna xwe daye ber çavê xwe(Ş.L – 86)

Nanê sêlê bûn

Ew nanê sêlê ye. Mêzîn di kîjan alî ve giran be xwe dide wî alî(Ş.L – 90)

Qîr û sîr bûn.

Lê dersdar bûye qîr û sîr, bûye lekeya run bi pêşîra zîlamî ve zeliqîye(Ş.L – 91)

Hesabê yekî di tizbiyêde kişandin

Here bila şikayet û hesabê teyê tizbiyê re bê kişandinê û ji bot e li rûyê dinyayê tu ronîyek tune be(Ş.L – 91)

Ser hesê hesan ketin

Bavê min, van çaxên paşîn, tu yê bibêjî qey ser hese hesan ketiye! Îtibara xwe ewqas bi min nayîne(Ş.L – 94)

Hay ji bayê dinyayê hebûn

Ew hay ji bayê dinyayê ve tune ye(Ş.L – 100)

Berik avêtin

Tu bê nîşangirtin di nav hev de berikan diavêjî”(Ş.L – 101)

Post anîn xwarê

“Em bêjin bila zanibin, ne ez ê postê wan di stûyê wan de dê bînime xwarê...”(Ş.L – 101)

Aqil jê negirtin

Kuro, Îsa! Tu tejikan çawa hîn dikî ku wisa dibin gur, aqilê min ji vê avê naxwe(Ş.L – 102)

Aqilê serê xwe anîn

Kurê min, şaş nebe, guh nede xelqê! Aqilê xwe bîne serê xwe (Ş.L – 102)

Hola Memo hatibû ber kaşo”(Ş.L – 105), 142

Gilî ji devê yekî kişandin

Simbil xwe kêleka dê de berdide, gilîyên ji dêya xwe vedikişîne û Simbil bi her tiştî ve dihese(Ş.L – 107)

Di kîs de mayîn

Wî zanibû zilmê bîne serê kê dê di kîsê wî de bimîne(Ş.L – 108)

Asê mayîn, di kefa dest de mayîn

Hûn di nav kefa destê me de ne, li ber xwe nedin(Ş.L – 109, 114)

Ber xwe ketin

Ez gelekî ber xwe ketim(Ş.L -111)

Mezindîtina ronahiyê

Di wê şeva tavahev de, te derzî biavêta erdê wê bihata kifşê(Ş.L – 118)

Post kişandina hêştirxanê

Ew ê postê min bikişînin hêştirxanê(Ş.L – 122)

Xwîn fir kirin ‘

Qet kê dîtîye ku bira miqabilî birayê xwe derê. Xwîna wî fir ke, dest û çavên xwe bi wê bişo(Ş.L – 123)

Ruh hatina serê pozan

Te dê bigota rûhê wan hatîye ketîye serê pozê wan(Ş.L – 127)

Pifî ezmana kirin

Edo çawa dibêjin, ji wezîfa xwe ya nû pifî asîmanan dikir(Ş.L – 145)

Tiştê lingê wî zane, serê me nizane’’

Bavo şixulê xwe ji me rinttir dizane; ya lin gê wî zane, sere me nizane!(Ş.L – 146)

Bi çavan kor bûn

Layê, qet mirov dixwaze ku bi çavên xwe kor bibe!... yanê tişteki xirab bê serî wî, kulfetên mal wî(Ş.L – 146)

Dilê xwe vekirin

Paş pir axaftin û mîtalan re bavê wê, çawa dibêjin, ereba xwe daxiste rastê, dilê xwe li ber qîzê vekir, her tişt jê re got’’(Ş.L – 150)

Rû reşkirin

Wê cem dîwanê xwe li qelema qencîyê xe, we te bide rûreşkirinê(Ş.L – 151)

Gûhê xwe lingê xwe xistin

Qurbana dîwana Alî Osman be, anîye gîhandîye dereca min û niha jî guhê xwe lingê xwe dixê, min tişteki hesab nake(Ş.L – 154)

Hişê xwe eleg û bêjing kirin

Ew bi hişê xwe, çawa dibêjin, dinê elek û bêjing dike. Lê hesab yek bû(Ş.L – 160)

Avêtina hûbê li ser dil

Hûb avêtin dila(Ş.L – 160)

Pîja bûn

Rizgan dît wekî Şêx Zayîr bi lezê dikeve, çawa gel dibêje, ser pîja ye(Ş.L – 180)

Wekî kefa destê nasîn¹⁰²

Wekî Şêx Zayîr li wanê dixwand, bi bajêr re beled bû, hemû kuçên wê weke kefa destê xwe nas dikirin(Ş.L – 199)

Kêr hatiye ber hestu

Çawa dibêjin, kêr hatiye ber hestu sekinîye(Ş.L – 212)

Keviran ji pêşa xwe avêtin

Werin keviran ji pêşa xwe bavêjin. Gelê hejar belasebeb nedine qirê, bila gel aza û serbest bijî(Ş.L – 218)

Hola me bê ber kaşo¹⁰³

Wê çaxê êdî hola me bê ber kaşo(Ş.L – 227)

Destê Xwedê li pišta yekî ketin

Xwedê carê destê xwe li pišta wî xistîye. Em çawa pê nikarin(Ş.L – 228)

¹⁰² Versiyonekê din wiha ye: Êdî mîna pênc tilfîyên xwe dizanibû(Ş.L – 245)

¹⁰³ Mînakek din (Ş.L – 227)

Xwelî bavêjî li erdê neketin

Birayo, li bajarî ewqas leşker hene, ewqas leşker hene, tu xwelîyê bavêjî li erdê nakeve(Ş.L – 246)

Çav kirina çaran

Kurê min, eferim, di rojên me yên wiha çetîn de, her fedayîyekî me du çavên xwe gere bike çaran, bi hişyarî di qeleçeya xwe de bisekine.(Ş.L – 276)

Bi ziman mar ji qulê derxistin

De, zimanê Şêx Zayîr, çawa dibêjin, mar ji qulê derdixist, wî casûs da razîkirinê(Ş.L – 278)

Gihaştina pela goşt

Çawa dibêjin, wekî dijmin êdî hatiye gihîştîye pela goştê me”(Ş.L – 280)

Hêkê li diranê xwe xistin

Wî di nava canfidayîyan de, eşkere, mînetî xwe ji artêşa dijmin a reşayîyê nedikişand, çimkî Kurdan, çawa dibêjin, hêka wan li diranê xwe xistibû.”(Ş.L – 285)

Şayîş kişandin

“Mala min ê, rengê te jî zehf firyaye, qet şayîşan nekişîne, wê te qenc bike”(Ş.L – 287)

Qelem di pişt te nikandin

“Gelî xwîşk, bira û Simbila min! Hûn rind bizanibin, wekî em îro jî şehîd bikevin talaşa me nîn e, çimkî me qelem di piştî dijmin de nikandîye, dijmin heta sax be derdê leşkerên kuştî... ji bîr nake”(Ş.L – 311)

Hildana destê xwe

De, serkeftin jî min hildaye destê xwe, devê şûrê min jî û piştî wî jî dibire, gilîyekî min cem seredîwanê û wezîrê leşkerîyê nabe duduyan”(Ş.L – 314)

Rabûna ku kêrê dide şikandin

De gel e, wexta ku rabû kêran dê bişkê”(Ş.L – 340)

Eliyê Evdirrehman civata ku di romanên xwe de vedibêje baş nas dike. Loma jî heya ku ji destê wî hatiye her hewl daye bi nimûneyên biwêjan berhemên xwe

dewlemendtir bike. Wekî ku bi mînakan jî xûya dike nivîskar ji aliye zanebûna biwêjan ve serkeftiye.

1.1.3.3. Dua

Dua, bi dengekî lawayî ji Xwedê xweşhalî û mihrîbanî xwestine. Dua carina bi dengekî bilind, carina bi dengekî zîz û tê xwestin û dibe ku ji aliyê koman ve pêk bê. Duayên tê kirin bi giştî di çarçoveya baweriyên kesayeta de şikl digire.

Hin duayên di romanên de hatine tespît kirin ev in:

“Şukir ji te Xwedê, Sultan hat. Xatê Xanim, çavên te rengayî, kurê te hat!”(X.X – 28)

Bi saya tifaqa cimaeta me ya Kurd îşalah em ê Sultên ji dardakirinê bidin xelaskirin.”(X.X – 65) “Sargîs lawo! Xwedê tu roja xerap nede. Lê Xwedê wê rojê bîne, ez ji ber qenciya birayê Karapêt û te derkevim”(X.X – 40) ‘Ew çi ku min dîtiye, bila neyê serê dijminê min’(X.X – 40)“Çavên me gişkan rengayî! Şukir ji vê rojê re! Em dîsa ghiştine nê û meremên xwe! Bila bijî tifaqa Kurdan! Quwet û sehet ji meta me re. Bila meta me ya Xatê gelekî bijî!”(X.X – 77)

“Hesen got: Bide xatirê Xwedê”(M.R – 20), “Şêx Zayîro, ez qûrbana te me! Şûrê te bila her dem di bîra wan de be. Desteya te di ser desteyên walîtiyan re be û em jî di bin sîya desteya te de, bi serbilindî bijîn”(Ş.L – 163), “Bila kevir ber lingên te bibe penîr, şûrê te di ser şûran re be!”(Ş.L – 171), “Şêx Zayîr, Xwedê me qurbana cedê mala we bike! destê we her demê li ser xelqê me bibe sî!”(Ş.L – 210), “Xwedê, berê tu tamamîya milletên di çetînahîyê de bêyî rehmê, xelqê tengasîyê, sirgûnîyê, feqîr û fiqaran, birçîyan, nexweşan û paşê hê li Şêx Zayîrê mey î balgîyê ber serê êl û eşîretan û hevalên wî yê qezametê bêyî rehmê!”(Ş.L – 325) “ew alîkariya qenckirinê ji Xwedê dixwazin”(Ş.L – 29) “Şikîrbûna xwe bi xwedê dianîn wekî ku Xwedê şêx Êsiv, Şêx Zayîr, Şêx Evdilrehman, Şêx Tahir û Şêx Hebîb daye wan.”(Ş.L – 38) “Nanê min li we herdukan helal be! Her bijîn, barîkela ji we re!”(Ş.L – 40) “Lê Xwedê jiyana min rojek be jî qurbana te bike, tu derdê min bibinî, ne ku ez”(Ş.L – 49) “Apê min ê Şêx Sefo, rehma Xwedê lê be, cîyê wî bihûşt be”(Ş.L – 57) “Ya Şêx Evdilqadirê Gêlanî, tu li hewara min bêyî!”(Ş.L – 36) “Xwedê ji we razî be”(Ş.L – 47), Ya Rebilalemîn, destên te di ser destan re ne, li me maqûlan were rehmê!”(G.M – 109), Şukir ji Xwedê re”(G.M – 86)

Wekî her olî di ola îslamê de jî rola duayê gelek girîng e. Wisa ku kurdan ola îslamê pejirandîne û dua bûye parçeyek ya jiyana kurda. Lewra heta Xwedê jî wiha ferman kiriye ger duaya we nebûya, çî mûhimiya we jî heye. Duayên bêhtir kifş dibin di berhevan de piranî li ser xebatkar û şervanên gele xwe ne. Her wiha ji bo xûrkirina duayan şervanan didin ber xatirê şêx û melayan.

1.1.3.3.1 Xwestek

Xwestek jî cûreyek duayê ye. Bi rêya xwesteka fikr û ramanê me û herwiha nêta me ya heyî derdikeve holê. Bi gotinê xwestekî axaftina me şên dibe.

Bo nimûne; ji bo kesên nû zewicî wiha tê gotin “Têr kur û qîz be, li ber hev du kal û pîr bibin”(M.R – 53), “Xwezil ji heft mîrên mirazan re”(M.R – 90)¹⁰⁴, “Xwezil ji hevmîrê mirazan”(M.R – 73), Xwedê mirazê we bi hev bike! hûn li ber hev kal û pîr bibin!”(G.M – 186), Xwedê Gogê ji te re xwedî bike, tu tehlî û tengasiyê nede we.”(G.M – 124)

Dema bixwazîn razîbûna xwe nîşan bidin wiha dibêjin “Şên û qedîm be¹⁰⁵, ji serê me zêdetir e”(M.R – 43), “Xwedê çetinayîyan nede”(M.R – 55), “Xwedê tu kul nede”(M.R – 60), Xwedê rûyê te û cimaeta te rûspî bike ku we vê êvarê qedrê me girt”(G.M – 88) Lawo, Xwedê bextê tê bilind bide te, serfiraz bî”(Ş.L – 54), Xwedê çetinayîyê li bajêr nede”(Ş.L – 58), ‘Xwezila heft mîrên mîrezan’(Ş.L – 69), ‘Xwedê ber destê wî kêr neke’(Ş.L – 71), Çavê te rengayî! Şukir ji vê rojê re!”(G.M – 124) “Xwedê kurê te bihêle! ‘Emrê te dirêj be! Siya te li ser me kêr nebe! Ez bi qurbana ruhê te me!”(G.M – 125) “Zayîr, ez di bextê destê mîrê çê de me!”(Ş.L – 80) “Kevir li ber lingê we bibe kevir”(Ş.L – 94), “Xwedê serê min qurbana wî ke”(Ş.L – 116), Ez qurbana gav û seheta te me”(Ş.L – 134), De bila heft mîrê mîrazan re tu kur bûyayî”(Ş.L – 145) “Gelî cimaetê! Hêviya min ji Rebil alemîn ew e ku hûn jî mîna min sax û silamet rastî merivên xwe bîn, ku di tengasiyê de ne.”(X.X – 75) “Xwedê wan ber hevûdu kal û pîr bike”(Ş.L – 36) “Xwedê tevî şixulê te be!”(Ş.L – 41) “Wey lê dayîk qurban bûyî”(Ş.L – 47)“Çavê te li ser gulên be”(G.M – 192) “Xwedê qebûl neke”(M.R – 45), “Mala te neşewite”(M.R – 52) “lingê te çî carekê li keviran

¹⁰⁴Xwezil ji heft mîrên mirazan re”(G.M – 164) (X.X – 28)

¹⁰⁵Şên û qedîm be(Ji dêvla spaskirinê) (Ş.L – 27)

nekeve”(Ş.L – 54) ‘Şêx ez qûrbana roja te me. Bila sîya te li ser me hîç kême nebe”(Ş.L – 44)

Dua û xwestekên di berhemana de hatine kirin bi giştî di çarçoveyek razîbûnê de hatine gotin. Loma jî em dikarin vê cureyê mîna ‘spas kirinê’ jî qebûl bikin.

1.1.3.4. Nifir

Mirov di demên acizbûnê de, li ser rewşeke nexweş de yan jî ji bo aram bibe û dilê xwe rehet bike serî li nifira dide. Di berhemên Elîyê Evdirrehman de jî di gelek cihan de gotinê nifirî hene.

“Xalît Beg, Xwedê belayê bide te”(M.R – 19), “Here zû bîne, gulle li te bikeve”(M.R - 39, 44), “Bicehime here”(M.R – 44) “Wekî textê te bin textan bikeve!”(Ş.L – 32), “Mala kaltîyê û pîrtiyê bişewite û ya felekê jî di ser de.”(Ş.L – 39), “Emer, mala te bişewite”(Ş.L – 40), “Tiliya wî di çavê te re here!”(Ş.L – 41) “Çavên te qîr û benîşt be”(Ş.L – 41), “Gor bavê we herduwan”/Ş.L – 43), “Bila textê Romê biqulibe. Textê wî bikeve bin textan”(Ş.L – 46), “ecl lêketîyo”(Ş.L -92), “De tu zû an jî dereng bi ser bela xwe ve bêyî, tu bibî xurê guleya gel, wê çaxê dilê min ê hêsa be. Yê ku tirba xelqê dikole dê bi xwe bikeve de heke wisa nebû, ez ê por û gulîyên xwe jê kim!”(Ş.L – 108), “Xwedê textê padişê we wergerîne, koka we bênamûsan biqelîne”(Ş.L – 124) “Ew nanê ku ez didime we, li we heram be, postê donxiz be”(G.M – 20) “Weyla porkûrê, dijmin hela nekiriye teleyê”(G.M – 46) “Xwedê kurê wî bikuje, mala wî mîrat be”(G.M – 73) “Xwedê mala bayîs xerab bike, kurê wî bikuje ku em kirine vê rojê! Mala min mîrat kir û kulfetê min bê xwedî kir. Merivo, ya ku tu anî serê me, bila Xwedê bîne serê te!”(G.M – 139) “Hey nanê min î helal ber çavikên wî bigire.”(G.M – 158) “Mala te dûrî serê min bişewite, tu jê herî, neyaro!”(G.M – 159)

“Xalito Lawo, belkî tu qet *waymîş* nebî! Zikê te têr nebe!”(G.M – 163) “Xwedê qanûna Roma virrek dermdax bike”(X.X – 18) “Mala te dûrî wan gedeyan bişewite”(X.X – 59)¹⁰⁶ “Gulleya Xwedê li milazim bikeve.”(X.X – 19) “Dost ê şa bibin, bila dijmin jî kor bibin.” (X.X – 58) “Ev yek ya qebûlkirinê ye, ku ev seypîsanê kurê seypîsan danîne pêşiya min? Kurê kerê!”(X.X – 22) “Wey qanûnê, tu winda bibî. Belkî Xwedê textê Padişahê Romê dermdax bike”(X.X – 23)

¹⁰⁶ Ev gotin di hin cihan de wek dua jî tê bikaranîn.

Nifirên di berheman de kifş dibin piranî ji devê kesên heqiyê diparêzin dertên. Ew kesên nifiran dikin, tevî ku nifiran li kesên nebaş bikin jî pê re rexneyê li sîstema heyî jî dikin û bi saya nifiran gazinên xwe tînin zimên. Bi saya nifirên ku tînin bikaranîn em pergî normên civatê û her wiha çavderîyên wan ên cihanê jî dibin.

1.1.3.5. Sond Xwarin û Soz Dan

Ji bo piştrastkirina gotinê, xûrtkirina baweriyê û bandorkirina kes yan jî koman mirov serî li sonda dide. Mirov ji bo gelek tiştan sonda dixwe. Carinan ji bo deşîfrekirina raz a, carinan ji bo xapandina kesayeta û carinan jî ji bo hinbûna tiştan. Yanî bi sond xwarinê armanc tê xûrt kirin.

Leheng carinan li ser baweriyên xwe yên dînî sond dixûn.

“Na bavo, weleh ez sabir nakim”(M.R – 67), “Wan li ber destê wî sond xwarin, şêx dane bawerkirinê”(Ş.L – 55), “Metê tu bi Xwedê kî”(Ş.L – 70), “Ez bextê şêx meşayîxan didime te, fikra min derheqê te de zehf baş e”(Ş.L -70), Ez bi Qurana pîroz kim”(Ş.L – 85), Na ez bi Meke û Medîne kim”(Ş.L – 86), Ez bi dînê Mihemed pêxember sond dixwim, em we nakujin”(Ş.L – 109), Ez xwe davêjime ber mêraniya te. Li min were rehmê, bi helaliya Xwedê, bi şertê sê sed û şêst û şeş pêxemberan, her sê jinên min bi sê telaqan j imin berdayî bin, ez naçim şikyatê nakim”(G.M – 26) “Bide xatirê Xwedê”(X.X – 27)

Di hin cihan de li ser hizkirîyên xwe sond dixwin “Bi serê bavê min ez nabêjim, heta hatina wan”(M – 67), “Na bi serê we, hûn şerm nakingiliyên wisa dibêjin”(M – 80), “Keko, tu serê Şêx Evdilqadir kî, wî mêrikî ku keça xwe dabû pey xwe kî bû”(Ş.L – 52), “Tu bi serê Keko bikî, sîleh li cem te hebû, yan tunebû”(Ş.L – 55), “Ez cedê Şêx Evdilqadirê Gêlanî kim ku lap dawîya emrê wî be”(Ş.L – 56), ‘Ez bi serê te bikim”(Ş.L – 62)“Bila soza mêran be”(M.R – 65), “Ez di bextê mêrên çê de me”(Ş.L – 220)¹⁰⁷, “Ew bi qesema mêra sond dixwe wekî li ku derê efser, leşker û cendirmeyên”(Ş.L – 172), “Ez di bextê mêrê çê de me”(Ş.L – 189), “Lê ez bi vî erdî asîmanî û cotê herdu Girîdaxan sond dixwim, hijmara artêşa wî çiqas e nizanîm, lê bê hesab yek e.”(Ş.L – 278) “Ez bi serê te yê eziz dikim, gayek û qurîşek li cem wî yek

¹⁰⁷Ez di bextê mêrê çê de me”(G.M – 25, 33)

e.”(G.M – 37), “Gogê tu bi serê min kî!”(G.M – 45) “Qîzê, ez xêrê ji Emoyê xwe nebînim, eger ez saetekê û dû saetên mayîn jî li Dêrsimê bimama.”(X.X – 59)

“Eger Sultan vejeriya, xwe vejeriya. Eger venegeriya, bila goştê mêran li min heram be.”(X.X – 61) “Tu bi serê min kî, tu rast dibêjî”(X.X – 21) “Eger em cara îcarîn ji vê qeziyayê sax û silamet xelas bibin, em ê kirasê li ser canê xwe nezir bidine melayan”(X.X – 46)“Na, bi serê bavê min”(G.M – 138)

Li ser êş û azarê xwe sond dixwîn û soz didin “Em bi serê vê Masîsê kin, em bi nalîna wan agirîyan kin, em bi wan zîyareta kin ku bext, însaf û azadarê roja me ya teng in”(Ş.L -18), ‘Ez van di cotê Gîrîdaxê kim’(Ş.L – 46)

Mirov li ser tiştên biqedr û pîroz sond dixwe û soz dide. Loma jî bi saya sond û sozê em pergî nixên civatê jî dibin. Eliyê Evdilrehman ji bo ku hest û ramana karekteran baştir bide hîs kirin û herwiha çavkaniya hêza wan bide zanîn serî li vê cûreyê daye. Di van berheman de tê xûya ku ne tene serê kesan, herwiha hinek şûnwar jî mîna cîhê pîroz tîne qebûlîkirin û li ser wan sond tîne xwarin. Wekî din mîna pîranî romanên din, di van romanên de jî sond û qasem li çarçoveya gotinê mêranî de derbas dibin.

1.1.3.6. Xatirxwestin û Xêrhatin

Gotinên xatirxwestinê ji bo rêwîyek bi aramî û bi rihetî birêkeve, biêwire û bi selametî bigihêjin cîhê xwe tê gotin. Xêrhatin jî, ji bo pêşwazîkirina rêwîyekî ye û şadbûna lihev dîtinê tîne ziman. Di berheman de xatirxwestin wiha hatiye nîşandan;

“Bi dilekî şad ber bi mala xwe oxira xwe cedandin”(Ş.L – 44), “Tû kir û dest bi cedandina oxira xwe kir”(Ş.L – 52), “Bav û kur oxira xwe dicedandin”(Ş.L – 54),

“Riza destê Hecîelî û çend kalan maç kir û razibûn ‘elamî Çolo û cimaetê kir, dest bi cehdandina oxira xwe kir.”(G.M – 28)

“Êla Çolo ew heta qulibandina Çiyayê Xezalê verê kirin û bi paş de vejeriyan”(G.M – 72)

“Hûn i ser seran, li ser çavan hatine! Em terefdarên feqîr û belengazan in!”(G.M – 76)

“Çolo, birayê min, hurmet û siyanet ji te û cimaeta te re!”(G.M – 71)

“Lê rastî hev hatin, nebû, wî salam da şêx. Şêx jî bi cureyekî selama wî wergirt û ji hev derbas bûn.”(Ş.L – 52)

Ax cahiltî... Ax Kurdistana Kurdan, de xatirê te!”(X.X – 15), Oxir be, oxir be”(X.X – 57)

Di berhemana de xêrhatin bi vî şeklî ne;

“Tu di ser serê min û her du çavên min re hatî. Me ji pirça serê xwe pirtir nanê kal û bavên hev û du xwariye”(X.X – 19) “Birayê Çolo, hûn li ser serê min û heftê bavê min hatine vî gundê me yê kesîb”(G.M – 113)

Elîyê Evdilrehman civata ku di berhemên de behs dike, gelek baş nas dike. Loma jî heta ku ji dest hatiye di berhemên xwe de cih daye hemû cure xatirxwestin û xêrhatina. Wexta kesan bi rê dike wan dispêre xatirê şêx, mela û hezkirîyan. Wexta hevdîtîne de jî wan bi awayekî jidil li ser seran û çavan qebûl dike. Bi vî awayî nixêr peşwazîkirin û oxirkirinê destnîşan dike.

1.1.3.7. Heyîrîn

Carinan tiştên wiha diqewimin ku, mirov diheyîre, lewre tiştê pêkhatî ne tiştêkî hêvirîkirinê ye. Loma jî mirov şaş û mat dibe û ecêpmayîna xwe hem bi şikl û hem jî bi gotinan bi awayekî nîşan dide.

Di romana Gundê Mêrxasan de ji ber ku mijar hin zêdetir li ser jiyane ye û jiyana kurda ya gunditiyê vedibêje, em bêtir liqayî van gotinan tên.

“Weylê kevir li riya te ketî, çawa wî fam kir û da te...”(M.R – 79)“Weyla rûyê te li rûyê min bûyê, bi rastî jî keçik e bengî ye”(M.R – 97)“Weyla li min çav rijiyayê”(M.R– 28)

“Weyla kevir li rêya te ketî¹⁰⁸”(M.R – 79)

Gotinê heyîrînê yê ku di berhemana de derbas dibin piranî ji aliyê pîrekan ve tê bikaranîn. Lewre jin hinek bêhtir bi hêstyarî li mijara hûr dibin. Loma jî hem ji aliyê tevgerî hem jî ji aliyê gotinî ve ew bêhtir hîsên xwe didin der.

¹⁰⁸ Li gor rewşê dikare bibe nifir jî.

1.1.3.8. Şîret

Armanca şîretê nesîhetkirin e. Her şîret ji bûyer û bingehekê hasil dibe. Bi rêya şîretan, zarok tîn perwerdekirin û xelq jî, li gor xwe ders û rêbazekî hildide.

“Gerek em lazimê neteweya xwe bîn. Di xêr û şera wê de bisekinin. Navê xelqê xwe li erdê nexînin. Ne wisa ye? ez xwe napesînim, lê divê ez navê kalikê xwe û keko bilind bikim” (Ş.L – 42),

“Kurê min, lez neke! Yê n ku lez dikin nagihîjin miraza xwe û her dem poşman dibin. Ji te re xwendin lazim e” (Ş.L – 53), ‘Êdî wexta te ya şîretê nîn e, tu mezin î. Çiqas dikarî xwe bide ber qelema qencîyê. Zû hers nebe, xelqê nekûte, bi gilîkî xwe neke şilê sor. Carna xeberê serkar û seydayan ên **sert** jî daqurçîne.’ (Ş.L -53) ‘Tu dê çi bikî? Divê tu wisa bikî ku him huba zarokên feqîran û him jî ya serekê navçeyê ber bi xwe zêde bikîwekî ku pişta te qewîm be. Van gotinên min ji bîra xwe dernexîne û lingê te çi carekê li kevira nekeve’ (Ş.L – 54)

“Dê û bavê min em hîn kirine. Wekî her dem alîkarîyê bidime kal û pîran. Wexta ku ew ji der ve tîn, ji ber rabin! Dema ku tiştê giran hildane destê xwe ji destê wan hildin. Di nava êla me de bûye edet ku kal û pîrên ewlad û tewladên waan tûnebin, em havînê gîyayan ji bo heywanên wan diçînin, tînin der mala wan dikin lod. Êvaran heywanên wan dibine tewla wan, girê didin, keç jî çêlekên wan didoşin ango şar dikin, xwarinê wan re çêdikin.” (Ş.L – 70)

“Kal û bav gotîne wekî wexta ku ji zilmkar re qurban heyran xeber bidî ew qure dibin, dibine dijminê serê te. Wexta ku gef û guran lê dixwî mirina xwe ku ji destê te ve dibîne, nerm dibe. Fena hevirmûşê peng” (Ş.L – 83)

Şîret yek jî mihimtîrîn beşên civakê ne. Lewra her kes dimire û yê dimîne her şîret e. Ji ber welatparêziya xwe Eliyê Evdilrehman di berhemên xwe de gelek şîretên di derheqê ax û welat de kirine û bi awayî bi xwestîye cahilên civata xwe perwerde bike.

1.1.3.19. Leqeb (Navûnûçik)

Leqap ew tişte ku, ji ber hin taybetîyên xweser ji bilî navê malekî, kesekî an jî navekî dîtir tê bikaranîn. Du cûre leqeb hene. Yek ji wan leqabên baş in ku bi ehlaq û tevgerên yekî dişibînin kesekî yan jî tiştê baş.

“Xwedanê me, me navê te bê hesab bihîstîye! Lê me tu nedîtî. Teyrê xerîb o”(Ş.L – 168).

Di berhemên hatine nirxandin de, bi gelemperî cûreya din ya leqaba hatiye bikaranîn û di derheqê kesê behskirî de gotinên nexweş dibêjin.

Hin ji wan ev in;

“Lê paşê murguz xwe firote dîwanê”(Ş.L – 52),

Zarok ji bavê re dibêjin keko. ‘Zayîr got belê keko!. Belê gel derheqê wî de gep dike”(Ş.L – 53), ‘Ew kelpê devgirezî wê hîn gelekî rastî te bê”(Ş.L – 55)

“Tu bi serê keko bikî ku te qet Tellaqreş Edê, yan keça wî dîtîye?”(Ş.L – 64),

“Na welleh, ew keçikeke dêlikbaz e”(Ş.L – 65), “Dengê xwe bibire qurimsaxê heram!”(Ş.L – 100)

“Rizayê tellaqreş”(G.M – 33),

“Zû bikin wî qecerî bibînin”(G.M – 44)

“Murxûz”(G.M – 37) “Berazê reş”(X.X – 23), “Dêla ji dêlan”(X.X – 61) “Tellaqreş û bertilxwûr”(X.X – 73)

Wekî ku di berhemên de jî kifş dibe, bi saya leqabên hatine kirin, beyî naskirina malekî an jî kesekî, em kesayetîya mirovan nas dikin. Bi saya leqaban kes an jî mal di kategorîya baş û nebaş bûnê de tên bicîhkirin.

1.1.3.10. Berketin/heyfanîn

Gotinên bi vî şeklî piranî; mirov ji bo hest û fikrên xwe yên di wexta neheqiyekî de yan jî di bûyerên şayîş kişandinê de, bixwaze bîne zimên û nerazîbûna xwe nîşan bide tînan bikaranîn.

“Korayî sed car korayî”(Ş.L – 101),

“Ay hay feleka derewînê”(Ş.L – 154)

“Rûspî got, Şêx Zayîr, çima mala min û malên gundîyên me mîrat bûne? Çima em li ser segîran in?”(Ş.L – 171)

“Şukur halê min baş e. Lê min zanibû wekî destê te teng e, ancax firsend kete destê min. Ez hatime cem te, xwîşka te kor be!”(Ş.L – 196)

“Tu dê bêjî heşira xwe gişkan hatîye! Malawe bişewite! We çawa mala min mîrat kir!
“Xwelîya koçikê min da ber bayî. Hûn nabêjin ‘gelo endamê meclîsê çi anî serê te’”(Ş.L – 243)

“Ax, heyf û hezar car heyf” (Ş.L – 20)

“Ax, hezar ax! Lê tişt nabe, ew roj nêzik e, ez ê ji ber qencyên wî derêm.”(G.M – 30)

“Riza, tu xwe Kurd hesab dikî, lê li ber çavên te dijmin milletê te qir dike. Heke di nava bedena te de xwîna Kurdiyê hebûya, heyfa te yê li milletê te bihata. Gelo piçik însaf û namûs bi para te neketibû? Mêrên nolî Çolo jî di dinyalikê de dijîn û yên nolî te jî” (G.M – 42)

“Rehma Xwedê li wan qurbanan be! Ez seba wan gişkan kor bibim” (G.M – 64)

“Ax, ez kor bim” (G.M – 87)

“Ax, Kurdoxlî, Kurdoxlî! Bextê te birî! Diya te careke din çonga xwe danî erdê, tu cara duduyan aniyî...” (G.M – 91)

“Ez di roja te ya çetin de tîmê dîtina te, lê tu? Bextê we mêran tune...” (G.M – 124)

“Ax li min bavo, ez çawa hatim xapandin... Xelîlo, Xwedê mala te wêran bike, te çawa mala min wêran kir. Ax... Ax... Ez bimirim!...” (G.M – 140)¹⁰⁹

“Mala te neşewite, hindik maye em bibine gawir, xaçeke çarnikil li stûyê xwe dardabikin” (G.M – 150)

“Weyla mala min neşewitîyê, ez bi pêş dijminan ve xwe û cimaeta xwe çima didim qelskirin... Na, na, berê çawa serê min cem wan bilind bû û niha jî gerek wisa bilind be.” (X.X – 43)

“Mala min dûrî serê Sultên bişewite, em ê destvala bi kû de herin?” (X.X – 64)

Tevî ku hin gotin li hemû hereman tîn bikaranaîn jî, di hin berhemana de hin qalibên gelek orjînal jî hatine bikaranaîn ku niha zêde nayên şixûlandin. Eliyê Evdilrehman her çiqas li xeribiyê mezin dibe jî, hem bi hiş hem jî bi dil di nava civata xwe de mezin bûye. Civata ku di berhemên xwe de behs dike nas e, bûye şahidê

¹⁰⁹ Dikare wek nîfir jî bê qebulkirin

kêfxweşiya wan jî û şîna wan jî. Loma jî gotin û qalibên di nava cimaetê de tèn bikarnîn, di berhemên xwe de jî bikaraniye.

1.1.3.11. Gefxwarin

Gefxwarin û bi gotinek din çav tirsandin, di rewşên tengasîyê de ji bo ku yên li hember bên rê tèn bikaranîn. Bi saya gefxwarinê aramanc ew e ku bi awayekî xûrt xwesteka xwe bidin kirin e.

Di berhemên hatine nirxandin de gefxwarin bi giştî bi vî şiklî ne.

“Wekî mûyek ji serê wî kêmbê, tu yê bersîvê bidî.”(Ş.L – 108)

“Heke hûn wisa nekin, em ê fena gîyan we biçînin û mirazên we yê bi xwelîyê şa be.”(Ş.L – 110)

“Kî vê fermana min a heq neqedîne, paşê bila loman ji xwe bike”(Ş.L – 292)

Xatê Xanim ji bo lawê xwe di zîndanê de bide berdan padişahê Tirkan re têlek wiha dişîne

“Heke kurê min berdidî, berde,

Bernadî, şerê Kurdan bi te re şer e,

Xwedê koka te ji kokê de bibirre!”(X.X – 69)

Gefxwarinê di berhaman de hatine kirin, piranî di çarçoveya hîssên neteweyî de û li hemberî dijmina hatine bikaranîn. Bi saya van gefxwarina nivîskar xwastîye hêza civaka ku behs dike bêhtir nişan bide.

1.1.3.12. Bangkirin

Bangkirina kesan li gorî çand û ehlaqê civatê û herwiha rewşa tê de dijîn diguhere. Bi bangkirinê ve wateyên din jî li ser vegotina hêyî tê kirin.

“Roma Reş!”(Ş – 26, 32), “Kuro, bes e, werin, ez qurbana we me!”(Ş.L – 40), “Dayê can, nexeyîde”(Ş.L – 41), “Lo, gurê piştêşîno”(Ş.L – 41), “Evda Xwedê! Xezê”(Ş.L – 41), “Roviyo, xwe nepesîne”(Ş.L – 42), “Şêx Emer, di rêya Xwedê de”(Ş.L – 42) “lo, lo ez bi heyrano”(Ş.L – 43), “Gelê hêja û ezîz, qewm û pismamno”(Ş.L – 57), “Pî, metê, min bibexşîne”(Ş.L – 69), “Hey hewar, hewar, birano, xwîşkno”(Ş.L – 124), “Gîdî werin alîkariyê”(Ş.L – 162), Maqûl , efsero, ez

qurbana te û artêşa te me!”(Ş.L – 183), “bextreşê heram î nemeriv! Mîrovxûr!”(Ş.L – 183), “Zû werin! Ez li vi rim! Gîdîno, zû werin!...”(G.M – 44) “Gedeyê gedeyan! Heke di xerîteyê de rê bihata kivşê, êdî min seba çi tu dişandî?”(G.M – 56) “Evdilmecîdê bira! Bi desteya xwe re pêberjerî gêlî bibe”(G.M – 63)

“Gelî bav û birayan”(X.X – 30) “Gelî qewm û pismaman”(X.X – 30) “Gelî dê û bavan, xwîşk û birayan!”(X.X – 40)

Carina bangê çiyayan dikin jî “De, Masîsno, xeber din!”(Ş.L – 19)

Mîrov bangkirinên di van berhemana de hatine kirin dikare di çarçoveya leqaban de jî binirxîne. Lewre di hin cihan de rast e rast ne bi navan, lê bi leqaban bang tên kirin. Hewiha di cihan de jî ji bo nêzîkbûnê gotinê mîna ‘birano’ û ‘xwîşkno’ jî hatine bikaranîn.

1.1.3.13. Gotinên Lihevhatî

Ev cûre gotin mîna gotinên pêşiyar û biwêjan gotinên qalipgirtinê ne. Gotinên lihevhatî xwediyê wateyên kûr û bi qafiyê ne. Bi bikaranîna wan hevok dixemilin û xûrttir dibin.

“Azadîbûyîn bê qûrban nabin”(Ş.L – 28) ‘Kurdan wisa kir ku sax ew bû ku ji mala xwe nehatibû’(Ş.L – 31), ‘Kal û bavan di wexta xwe de gotîye wekî bende du rewş cuda ne ku kaltî û zarokatî carekî din di wexta kalbûnê de digîhêjin hev.’(Ş.L – 38), ‘Çawa gel dibêje wekî bav serafê kuran e’(Ş.L – 38), ‘Em piçûkan mezin dikin. Mezin jî wana bi hevûdû bidine kuştinê?’(Ş.L – 41) , ‘Gereg ew ji niha ve din av her tiştî de qal bibin, paşê xelq gora min nenilîne’(Ş.L – 41), ‘Ew mêrê navê meclîsan e, ne yê dawê û dozan e’(Ş.L – 42), ‘Hûn sax û ez jî selamet’(Ş.L – 48), ‘Heyfa xweliyê ye ku laşê wî bikeve nav’(Ş.L – 52), ‘Çûyîn heye, lê vegehrîn tune ye!’(Ş.L – 52), ‘Merî gerege rastîyê nefiroşe nerastîyê’(Ş.L – 52), ‘Lawo sal û zeman xirap in’(Ş.L -), ‘Hişyarbûn rewşa mêranîyê ye’(Ş.L – 75), ‘Bav û kalên me di wexta xwe de rind gotîye: ‘Werişê vira yî, ne yê berê’(Ş.L – 75), ‘Mirov gereg e berê hêza dijminê xwe biceribîne, paşê êrîşî ser wî bike’(Ş.L – 79), ‘Belê jin jî hene, jinikok jî’(Ş.L – 84), “Tu vê yekê rind bizanibe: Yê ku neteweya xwe difroşe, ew dê sibê te jî bifroşe!”(Ş.L – 105), ‘De çawa dibêjin, gilî li erdê namîne’(Ş.L – 106) “Li wir em nanê ceh bixwinî ji pelawa vir hezar carî çêtir e”(Ş.L – 117), “Wekî dûmahîka dinê ne dirêj e ne kin e, çira tu kesekî heta sibê venakeve”(Ş.L – 139) “Wekî mirov ji nîvê zirarê jî vegere, poşman

nabe”(Ş.L – 156), Êh, ya ku ji Xwedê tê, ser sera û herdû çavan”(Ş.L – 158), Azadbûn bê qurban nabe”(Ş.L – 170), “Hişyarbûn rewşa mêran e. Lê devbelabûn, quretî, paşverûtî mirina mêran e”(Ş.L – 213), “Xêr ji xêrê derbaz bûye”(Ş.L – 276) “Mêrê Kurd tê pirtîpirtîkirinê, lê hevalê xwe nafirosê. Gilfîyê xwe danequrçîne, bêje”(Ş.L – 289) Teyr bi teyrtiya xwe çetin e.”(G.M – 57)“Mîrin heye, lê rev tune””(G.M – 59) “Gelî birayên min! Azabûn bê qurban nabe”(G.M – 64) “Lawo, Qasim, azabûn bêyî xwînrêtin nabe.”(G.M – 143) “Xîret rewşa mêran e!”(G.M – 189) “De dereng e, ji rêwîyan re çûyîn lazim e.”(X.X – 31) “Dûmeka dinyayê ne dirêj e, kurt e.”(X.X – 69)

Elîyê Evdilrehman di berhemên xwe de vê cûreyê ji bo şîretkirina kes yan jî koma bikartîne. Di binê gotinên bi vî şiklî şîret û dersên hêja jî hene. Nivîskar gotinê bi vî şiklî bi zana û pîsporan tîne ziman û di derbarê cîhanê û jîyana mîrovan de agahîyên qîmet dide xwîneran.

1.1.4. Meseleyên gel

Di romana Şer Li Çîya de gotinek bi vî şiklî derbas dibe. “Aşê apê Xaco kire çeqe-çeç, serê we kire dew(Ş.L – 88). Piştî vê gotinê ji bo ku mijar safî bibe çîroka aşê apê Xaco wiha tê vegotin.

“Serpêhatiya aşê apê Xaco gelekî dirêj e! Wekî ez qise bikim, dibe di du rojan de kuta nebe. Xaco aşvan bûye. Qenciya wî li ser neteweyên Kurd û Tirkan zehf hebûye. Mirovekî helal bûye. Wî gelek hêsir, kes û kûs jî xelayê, mirinê xelas kirine. Rojekê du cendirmeyên Roma Reş têne êş, dixwazin bi destê zorê du xîrar genim ji xwe re bibin. Xaco nadê. Di navbera wan de berê gengeşî û paşê jî şer diqewime. Xaco zorê dide herdukan dibe. Dema ku wan terkûselah dike, ji wan yek dibêje:

‘Apê Xaco, tu zanî wekî ku di welêt de nangiranî heye. Pênc zarokên min û heft zarokên hevalê min hene. Zarok birçî ne. Me dît ku wekîtu çî wext genim nadî me. Ji bo wê jî me xwest em bi destê zorê ji te bistînin. Lê hêza me negihîşte te. Niha însaf û mirweta te hebe me nekuje, em careke mayî xeletiyêke wiha nakin, zarokên me guneh in. Wê ew ji birçîbûnê bimirin! Gunehê te li wan bê...’

Xaco dibêje; ‘Gelî minafiq û mencenêqan, we berê wisa bigota, min ê hûn razî bikirana. Vê carê ew çî quretî bû we kir? Ez ê niha we hedukan jî bavêjime dewla êş, hûn mirî û ez jî bi silametî...’

Herdu cendirme digirîn. Lawayan dikin. Însafa Xaçoyî ji bona zarokan qebûl nake. Ji her yekî re bîst girfange piştas dide û dibêje:

‘Herin, hûn bi qurbana zarokan bin, ev jî silehên we!’

Xaço mirovekî gir î beranî bû. Bê tirs û bê xof bû. Wî dizanibû ku wekî herdu cendirme dê wî bifroşin. Hişyarbûna xwe winda nedikir. Çend rojan şûnve, ber êvarekê dibîne ku wekî bîst sîwaran rast berê xwe daye êş û tîn. Wexta ku bi dûrebînê re dinihêre dibîne ku wekî cendirme ne. Ew xwe winda nake. Tivingê, qirmê û berikan hiltîne, xwe dide qeleca jora êş. Li wê kemîna ku bi destê xwe çêkiribû rûdinê. Siwar wexta ku digihîjin ber derê êş çend heb peya dibin, mirovên di êş de derdixin derve. Didine ber zopan û qundaxan ku wekî salixên cihê Xaço bidin. Xaço ji jor de dike gazî:

‘Gelî bêînsafan, xelqê nekutin. Ev mirovên bêguneh in. Hûn ku min dipirsin ez li vir im, li jora êş im. Werin hesabê xwe bi min re safî bikin.’

Cendirme ber bi Xaço diçin, Xaço berikan di ser wan de vala dike, hijde cendirmeyan di wê navberê de dikuje. Duduyan jî bi saxesax diavêje dewla êş û dixeniqîne. Paşê jî diçe gund, bi destê hêsîrên xwe digiren û ber bi êl û eşîretên Kurdên bereka Girîdaxê diçe. Wexta ku qeza pê dihese cendirmeyan dişîne gund. Ew dibînin ku aş dixebite û çeçeçeqa darikê wê ye. Ji bo wê jî di nav gel de belav bûye. Armanç ji çeçeçeqa aşê apê Xaço ev e ku; ‘min ya xwe kir, ha bila bike çeçeçeç’ (Ş.L – 88-89)

‘‘Gel rast gotîye, wekî; ‘‘Yek yekî dikute, yê binî dibêje ‘ax pişt min!’ Yê ser dibêje: ‘Kuro, axir ez li pişt te naxim, çima dibêjî ‘ax, pişt min!’ Yê din dibêje: ‘Kuro, tu dewar î, tiştêkî ji vê dinê fem nakî, heke pişt min hebûya, te ez nedikutam’’(Ş.L – 90)

‘‘Şerê min û Şêx Zayîr, nola wê mesela gel e ku dibêje: ‘Bavo, min diz girtîye.’ Bav dibêje:

‘Ê, lawo kaş ke bîne cem min!’ Kur dibêje:

‘Ê, bavo, ez wî berdidim, lê ew min bernade.’’(Ş.L – 238)

‘‘Gelî birayan, - Sofî Mistefa got, - em Kurd xeysetê qanûna Roma Reş rind dizanin; ew timî nan xwê pêpes dikin, bi destekî nanê merivan dixwin, bi destê din kêrê di pişt merivan re dikin, yanê jî nê didine berte, lê di binê sifreyê de deh çehlan dikolin, ku tu têkeviyê. Aha v yek ne xeysetê wan î teze ye, lê bav û kalên wan jî wisa bûne’’(X.X – 31)

“Ji me re Kurd dibêjin, ji me re nabêjin Îskenderê Qaymeqam. Lap arxayîn bin, nanê xwe rihet bixwin û rihet jî razên. Me Kurdan tu wextan di malên xwe de mêvan nekuştine û niha jî nakujin. Eger em li çolê, yanê jî li beyarekê rastî dijminê xwe tên, em berê gazî wî dikin, jê re dibêjin, ‘Lo... liyo..., haziriya xwe bibîne, ez ê te bikujim!’ Eger ew bibêje, ‘Ez vê carê ne hazir im’, em wî nakujin, jê derbas dibin û diçin, heta rasthatineke mayîn’”(X.X – 48)

Di romana Gundê Mêrxasan de jî behsa meseleyek bi navê gayê reşo tê kirin. Lê belê tamamî naveroka çîrokê ji xwînera re nayê gotin. Nivîskar wekî ku xwîner ji vê meseleyê haj hebe tevdigere. “De gayê reşo, kê dera te diêşê? Lawikan, çawa ku lazim e, Riza Efendî û seyîsên wî dikutin”(G.M – 25)“De gayê reşo, kê dera te diêşê, min rind lê xist”(G.M – 47)

Eliyê Evdilrehman bi giştî ji bo ku di navbera karekteran de peywendiyekê peyda bike, meseleyên gel bikartîne.

1.1.5. Dengbêjî

Di çand û hûnera kurdî de rola dengbêjan gelek e. Li ser vê meselê Mustafa Borak wiha dibêje.

‘Di çanda kurda de dengbêj hem bo afirîner hem berhevkar hem parêzvan û hem jî li gor dem û serdemên veguhezêrên çandê ne’¹¹⁰. Li gor Zahir Ertekin ‘Dengbêjî û stranên dengbêjiyê ji ruh û çanda gel dizê û parçeyekî muhîm ê edebîyata gel in’¹¹¹ û li gor Ertekin, her tiştên bi jiyana kesan re derbas dibin dikarin bibin mijara dengbêja. ‘Evîn, bûyerên rojane, pirsgirêkên siyasî, welat, kuştin, talan, revandin, îxanet, girtin, xela, tofan, erdhej û wd.’¹¹² Dengbêj bîra civatê ya hevpar in. Dengbêj çawa ku hilgirên bîra civata xwe bûn di heman demê de ji bo civatê jî serbilindiyek peyda dikirin. Her herem her kom yan jî ji yekî gundî hilde heta axayek bi hostebûna dengbêjên xwe şanaz dibûn. Wekî ku di berhemên hatine behskirin de jî mînakên bi vî rengî hene. Wexta şevbihûrkan civat li dora dengbêjan dicivîya, û dengbêj didan berhev. Stran û kilama diavêtin berhev û bi vî awayî hûnera xwe îcra dikirin. Carinan ev avêtin bi heftayan jî berdewam dikir. Lewre bi awazê dengbêjan ve pezn û îtibarek dihate zeftkirin. Loma axa û beg her hewl didan bibin xwediyê dengbêjên mezin.

¹¹⁰ Mustafa, Borak, “Kela Dimdimê” Kovara Folkora Kurdan, s. 2015 h. 4, r. 61

¹¹¹ M.Zahir Ertekin, “Du Deng û Yek Reng Di Kurdî De: Dengbêjî û Qesîdebêjî”, *Sempozîyûma Navnetewî ya Dengbêj û Çanda Dengbêjan*, 2019, r.620

¹¹² H.b.r.624

Di morofê de jî li ser vê meselê tê rawestîn. Jixwe di romanê de jî eyan dibe ku hemû serkeftina Morof bi saya dengbêjiya wî pêk tê. Lewre bi saya awazê xwe nêzîkî Selîm Beg dibe, pê re digere haya wî ji ûsyana pale û gûndiyan çêdibe û bi vî awayî di xebatên xwe de serdikeve.

Di hin beşan de li ser pênasê û erka dengbêjan jî tê sekinandin mesela di cîhekî de qîza Selîm Beg ya bi navê Gulîzerê qiymeta dengbêjiyê wiha derdibire. “dengbêj hem dikare navê merivan bilind bike û hem jî dikare nixsan bike, çimkî şair û dengbêj merivîna devbelav in” (M.R – 50)

Di beşekî Morof de sedema lêgerîna dengbêjek hosta bi reqabeta di nav axayan de tê şîrovekirin. “Selîm Begê ji zû de li dengbêjekî miqerim digeriya. Dengbêjî wî hebûn, lê wan li ber dengbêjên begên cîranên wî dadixwarin” (M.R – 36)

Herwiha di hin beşan de serbilindbûna hebûna dengbêjek hosta bi awayekî eşkere tê dîyarkirin. ‘Eferim Selim Beg, ku dengbêjekî dîwana te yî wiha heye’” (M.R – 38)

Di dîwana axayan de dengbêj didin berhev “Şên û qedîm be, ji serê me zêdetir e, lê ji aliyê dengbêjan de te ji me gişkan bir” (M.R – 43)

Di romanê de behs û pesndayîna dengbêjan wiha pir e ku, heta tê wê astê dengê heywana yên xweşik bi dengê dengbêjan re tê şibandin. ‘Fesla nava rojê dibe germ, kew, bilbil, şarû, çivîk û teyrên meskenên we yên mayî nola aşîqê Kurdewarîyê yê navdar weke Evdalê lawê Zeynikê dengê xwe radiweşîne ser gelî dol û gebozan, text û zinaran, rast û berwaran, zaga û şikeftan, merî bê hemdê xwe hijmekarê sazbandiya wan a şîrîn dibe û ji stranên wan heyr û hijmekar dimîne’”(Ş.L – 21)

Tu sinor ji mijara dengbêjiyêre nayê diyarkirin “Dengbêjan kilamên mîrxasîyê yên li ser Agirî sewirand, ew di şahîyan de stran, li ser şînê stran, di rêyan de stran, di odan de stran û rûhê silsiletên nû bi wan qal bûn sincirîn. Û Tendûrekên kelên azadhezîyê û şehedên serbestîyê netemirin.”(Ş.L – 348)

Di hin cihan de ji dengbêjan re aşîq jî tê gotin. “Aşîq û dengbêjan li van çiyên û deştan çiqas kilam, beyt û serhatî avêtine ser egî û qehremanên xwe” (Ş.L – 23)

Di berhemana de kifş dibe ku, dengbêjî tenê karê zilaman nîn e, jin jî dikarin dengbêjiyê bikin. Di novela Xatê Xanim de, dema milazimê dewletê Sultan diavêjê zîndanê, Xatê Xanim kesera dilê xwe tîna zimên û ji xwezûrê Sultan wiha alîkarî dixwaze.

“Gumana me li jorê maye Xwedê,
li jêrê maye Emîn Paşayê bavê te,
Bibêje, Sultanê zavayê te kuştiye qeymeqamê Romê,
milazimê dewletê ye,

Roja şeşan, şûna wî dara daraxacê ye,
Bê çi qas milê wî digere, bireşîne malê dinê ye,
Bi qeweta malê dinê Sultên derxe ji kelê ye.

Hey gidî, hey dewletê,

Ne min got lawo:

- Mekuje qaymeqamê Romê, milazimê vê dewletê,

Nexe kelekên giran serê min hermetê,

We, wê, wê vê dewletê

Te merivxurê

Ji serdanpê de derewokê...”(X.X – 55)

Di romanên hatine nirxandin de; Dengbêj ew kese ku di şîna de reşan girê dide, şîna digire û kilamên mêrxasîyê dibêje û hem jî ew kese ku di şahîyan de kilamên eşq û evînîyê dibêje û civatê şên dike.

2. Zanista Gel Di Romanên Elîyê Evdilrehman De

2.1. Ewra Derbasbûyîne

Di jîyana însanan de sê ewrên giring hene ku li derdora hemû jîyana wî/wê dipêçe. Ev her sê ewr; welîdîn, zewicandin û herî dawî jî mirin e. Ev her sê ewr paşê di hûndirê xwe de vedibin û bi beşên din ve tînin kategorîkirin. Li derdora wan ewra bawerî, edet û tore ava dibin. Ev bawerî û adetên tînin avakirî li gor nêrîna civatê, carina kesa diparêze û wan pîroz dike û carina jî wan ji bela û xerabîyê dûr dixê.

Bi vî awayî edet, tore, kevneşopî û merasîmên heyama “derbasbûyîn” de kom dibin muamele û pratîkên ku di nava van de cih digrin, beşên sereke yên çanda kevneşopiya welatekê yan jî ya devereke dîyarkirî pêktîne.¹¹³

Di romanên Elîyê Evdîlrehman de, di derbarê her sê ewran de jî nimûne hene. Em ê li jêr wan nimûneyan dîyar bikin.

2.1.1. Welidîn

Welidîn di nav wan her sê ewra de ya pêşîn e. Jiyan bi welidînê destpê dike, loma jî ji alîyê malbatê ve bi kêfxweşî tê pêşwazîkirin. Lewre her welidîn tê wateya berdwama neslî û pê re jî hêz û piştgirîyek jî bi xwe re tîne. Ji ber ku civata di romanên de tê behskirin gundî ne û derbara xwe bi kare wûcûdî pêktînin, hebûna zaroka bi taybetî jî zêdebûna kura pêwistiyek mezin tê dîtin.

Gotina Hz. Pêxember Muhammed jî ya di derbarê zewacê de ‘bizewicin, pir bibin, di axîretê de ez ê bi zêdebûna we şanaz bibim.’ Giringiya welidînê derdixîne pêş.

“Dîya wê zaroka Kurd jî mîna jina te neh meh û deh rojan zaroka xwe di zikê xwe de xwedî kirîye û welidîye. Wê jî bi şev û rojan lorî kirîye”(Ş.L – 204)

2.1.1.1. Beriya Welidînê

Di romanên hatine nirxandin de rewşa beriya welidînê bi awayekî giştî di çarçoveya rewşeke kambax de hatiye vegotin. Lewre di van romanên de kurd di rê de ne, sirgûnî cihekî dibin loma jî welidîn ne hêsan e.

“Bûka Ebûbekîr a biçûk hemîle bû, ew hema jora gund bi xwe dihese wekî wê biwelide, lê efser îmkanê nade ku ew bi hemdê xwe binive, an zarokê xwe bîne dinê”(Ş.L – 130)

“Ebeyên jin çend kulavan hiltînin. Gelekî dûrî leşker û sirgûnîyan du qat dîkin, mîna sûrê çêdîkin, destê bûkê digirin, dibin wê derê. Wê çaxê Zozana jina Ebûbekîr bi hêrs dibêje:

Bêînsafê ji nesla bêînsafan! Çima jin û zarokên te nîn in? Tu nizanî welidandin çî ye, he? Ez tûkî ser we û qanûna we ya genî bikim. Wiha ye, wiha nebêjin em bêxwedî ne”(Ş.L – 131)

¹¹³Sedat Veyis, Örneç, Türk Halk Bilimi, Weşanxaneyê İş Bankası, Ankara 1997, r. 131

2.1.1.2 Piştî Welidînê

Di romana Morof de behsa edet û baweriyên piştî welidînê tê kirin. Morof di welidina jina xwe de ne mal e. Wextê digihîje malê, dixwaze kurê xwe bibîne lê xwesiya wî nahêle û dibêje “Neçe malê, çavê te rengayî, Xwedê kurek daye te, bisekine, bi ser de neçe, ne rind e!” (M.R – 72). Li gor pîrejinê bi vî awayî zarok ji nezerê tê parastin

Di hinek cihan de behsa têkîlîya zarok û bav tê kirin. “Şêx Emer taybetmendîyeke xwe ya gelek ecep hebû. Wî ji zarokan gelekî hez dikir. Bi wan re şa dibû. Zarokên qewm û pismaman maç dikirin. Wexta ku wî gelekî ji zarokên xwe hez dikir, yan jî diçû oxirekê, çend rojan, heya mehekî zêdetir ku dima û wexta ku vedigeriya mal, zarokên xwe tu cara maç nedikirin. Tenê û tenê destêxwe li serê wan û piştê wan dida. Lê zarok didane milê xwe, bi wan re şa dibû û zarok jî bi wî şa dibûn.”(Ş.L – 38)

Wexta zarokên kur hinek mezin dibin wan hînê bezandina hespan û şûxûlên mêran dikin “Wî ji zarokên xwe yê kur hînê bezandina hespan dikir. Li ristan, berwaran, serbijêran, gelî û çîyan digêrandin, dibezandin û bi avêtina gule û berikan, bikaranîna cure bi cure çek, şûr û qeman, bi fen û fêlên şer û gelek tiştên mayî perwerde dikirin.”(Ş.L – 39)

Piştî zarok tê dinê, şabûnek mezin jî di navbera malbatê de peyda dike. Zarokê tê dinê piştê hinek mezin dibe, ji aliyê civatê ve li gor edet û çanda wê civatê tê perwerdekirin. Di romana de jî li ser vê meselê tê rawestandî. Di hin cihan de edet û ehlaqê Kurdan ji devên dijminê wan ve tê gotin. Gotinê bi vî şeklî piranî bi hevokên pezndayîna kurdan in. “Gawirê Kurdan di şeran de zor in, ji bo na ku her cahilekî wan hîna ji zarokatiyê ve hîn bûye tîfing û qirmeyan; tetika wan di destê wan de bûye. Jixwe çîya piştevanîya wan dikin”(Ş.L – 144)

2.1.1.2.1. Navlêkirina Zarokan

Di rojên îroyîn de, beriya zarok bê dinê navê wan jî diyar dibe. Dê û bav dibêjin kur be ... keç be.....em ê deynin. Lê di demên berê de rewş wiha nîn bû.

“Bi meneya xwe ya hêsan di rojên me de navlêdayîn, kesê nav lê hatî kirin ji bo ku ji wek hevên xwe biqete û çiqas wek pergala ji hev qetandin/kotloma bê xûyakirin jî di

eslê xwe de zarokê wek hebûneke bîyolojîk, ji bo ku wek mewcûdîyetek hiqûqî û civakî di nava civatê de bê nasîn, jê re dibe sened û belgeya wî ya rêûresmîtiyê ye”.¹¹⁴

Di çanda kurda de navlêkirina zarokan meseleyek gîrîng e. Lewre di wê baweriyên de ne ku navê zarokan qedera wan jî diyar dike. Loma jî kesê nav li zarok bike jî mûhîm e. Bi giştî navê zarokan ji aliyê dê û bavê zêdetir ji aliyê cimate yan jî ji aliyê kal û pîran ve tê dayîn. Di romana Morof de jî rewş wiha ye. “Kulfeta Morof, Nûrê diwelide, kûrekî tîne. Kalik, pîrik û cimaeta kesîb e mayîn navê wî datînin, Cimo” (M – 71)

Herwiha di romana Şer Li Çiya de jî rewş naguhere. Ji ber zarok di rêya sirgûniyê de hatiye dinê navê wî jî Sirgûn tê dayîn. “Xêlekî şûn ve jina ebe mizgîn da sirgûniyan ‘Bûk welîdî, kurekî anî, me navê wî jî Sirgûn danî’...” (Ş.L – 132)

2.1.1.2.2. Kîrîvetî

Her çiqas van salên dawî de wateya wê ya kûr hatibe ji bîr kirin jî, di demên berê de ev edetek pir giranbiha bû. Lewre kîrîvetî ji bo rûmetdarkirina malbata dihat bikaranîn. Wexta dû malbat bibûna kîrve, ji biratiyê jî nêztir dibûn. Kîrîvetî mîna biratiya xwîne jî tê qebûl kirin. Kîrve kar û barê kîrveyê xwe tîne cih, ger hewce bibe zewacên kîrveyê xwe organîze dike, ger şer an jî pevçûnek derbikeve di serî de ew dikeve navberê. Bi vî awayî bi saya kîrîvetiyê du malbatên cûda dibin yek û heta hetayê dimînin.

“Wekî muhebeta wana cem hevûdu gelek be. Ebûbekir kurê xwe gişk di pêşa Şêx Zayîr de danibûn ango sunet kiribûn. Bibûn kirîvên hev yê xwîne. Yek ji yekî re dibêje, ‘kirîvê xwîne’” (Ş.L – 129)

Di şer li çiya de xûya dike ku, kurd bi Tirkan re jî kirîvetî çêkirine. Lewra Elîqûlîyê Tirk wiha dibêje ‘di odê de Kurdên kirîvên me ew bajar wek cîyê çûyin û venegerîne bi nav dikirin’”(Ş.L – 185)

“Rizgan got; ‘Ezîzê me, Şêx Zayîr! Ez pêş şênîyê me yê hazir û ne hazir mînetdarîyê îlamî we dikim. Hatina we bona Kurdên zêrandî rê û dirb nîşanî me kir, em pir razî ne. Lê niha dost û kirîvên mey ê xwîne Elîqûlî bila hinekî xeber de û hûn ê jî ji axaftina wî gelek razî bimînin’”(Ş.L – 181)

¹¹⁴ Zekerîya Karadavut, *Kırgızlarda Ad Verme Geleneği* Weşanxaneya Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü s. 2013, r. 277

Di edetên kirîvatîyê de xwîn rêtin heye loma jî Elîqulî dibêje: “Me zarokên xwe di pêşa hev de dadanî; çawa ku yek ji yekî re dibêje, ‘me xwîna sor di pêşa hev de dirêt’”(Ş.L – 182)

Kurd heta bi ermenîyan re jî kirvetî çêkirîne. Wexta ku dewleta Osmanîya li Ermenîya tê xezebê wiha tê gotin “Her kurdekî bi hemû alîyan ve alîkarî dida kirîvên xwe yê Ermenî, wekî di rê de çetinahîyê nekişînin.”(Ş.L – 268), “Hela zêdeya ser zêdeyê, me zarok di pêşa Ermenîyan de danîne, em bûne kirîvên xwînê”(Ş.L – 286) “...Eger cimaeta rûniştî bi min re razî be, ez û bi çar rîspiyan ve em ê xwe bigihînine mala Karapêtê kirîv, em ê bi wî jî bişêwirin.”(X.X – 30)

Kirîvetî di romanên de rola piştgirî û nêzikayîyê hildide piştî xwe û tevî cînanan di navbera netewên cûda de jî xetek alîkarîyê peyda dike.

“Weleh Kurd zor in, hundirê wan pola ye. Eferim ji we milletê mêrxas re! Mêrikan hem di şeran de jî hene! Bavê min î rehmetlêbûyî, hela ez biçûk bûm, der heqa kirîvê me yê xwînê, Ezîz Begê de gelek tişt digotin, komeka wî wî gelek gihîştîye milletê me.”(G.M – 91)

Nivîskar ji bo ku nêzikahiya civata kurd û cîranê wan nîşan bide behsa kirîvetiyê vedike û bi gelek mînakên ve rolê kirîvetiyê derdixe pêş.

2.1.2. Zewac

Di ewra derbasbûyîne de dîyemîn ewr zewac e. Hem ji bo keçikê û hem jî ji bo lawik, ev ewr tê wateya yekbûnê. Zewac, bi biryara kur û keçikek ve ku dixwazin jiyana xwe bi hev re derbas bikin û malbatek ava bikin pêk tê. Bi saya zewacê di navbera malbatan de nêzikahiyek û pê re jî jiyaneke li ser mervatîyê avakirîye peyda dibe. Loma jî zewac di çanda kurda de yek jî bîngeha jiyaneke tê qebûl kirin.

“Bûyera zewacê li her derê cîhanê her merhaleyên wê, girêdayî pêşbîniyên tîpên çanda bi lihev kirina di nav qûral û qalibên diyarkirî de pêk tê, bi taybetî ji aliyê merasîm, tore, nêrît û kevneşopiyê ve tabloyeke dewlemend xêz dike”.¹¹⁵

Beşa zewacê bi dû beşan ve hatiye nîrxandin. Di beşa beriya zewacê de, qelen û nîşanî kirin hatiye vegotin û di beşa wexta zewacê de jî, edet û çanda zewacê bi mînakên hatiye raxistin.

¹¹⁵Sedat Veyis Örnek, *Türk Halk Bilimi*, Weşanxaneya Wezareta Çandî, Ankara 2000, r. 185

2.1.2.1. Pêşiya Zewacê

Di çanda kurda de beriya zewacê hatina hezkiriya li cem hev tiştêkî nebaş tê qebûlkirin. Herçiqas dû hezkirî hebin jî, divê evîna dilê xwe zêde eşkere nekin û veşêrin “Ne axir Gogê û Evdilmecîd hela beriya şêr ji hev hez dikirin û li ser hev bengî bûbûn. Axir dota Kurdan ê çawa culhet bikira, cara pêşîn destê xwe bida ser eniya Evdilmecîd, di wî halê giran de, ew mecbûr bikira çavên xwe vekira û bi zêdayî jî ew ramûsa? Keça Kurd li pêş her sê birîndaran ‘edetên kal û bavan pêpes kir, êdî tiştên mayîn nehatine bîra wê, tiliyên xwe yên mûmanî danîn ser eniya hezkiriyê xwe, lê bi destê din porê wî yê kurîşkî miz da û di ‘emrê xwe de cara pêşîn bi levên wî yên ji kaxitî orta her du birûyên wî yên qeytanî û paşê lêvên wî yên ji destê êşê zingirî ramûsa.’”(G.M – 105)

‘Evdilmecîd got – rast e, hela beriya wê çaxê me ji hev hez dikir. Heta nexweşxaneyê, min carekê jî destê wê negirtiye, me gul û sosin bi ser hev de nebarandibû. De Xwedê ‘edetên me Kurdan jî xerab bike, ka min dikaribû tiştên wisa bikirana; qerez...’”(G.M – 119)

Di hinek cihan de jî jin, acizbûna xwe di derheqê edetên kurda de tîne zimên ku nahêlê bi aramî li cem xortekî rûnên. “ Yanê bavê min îmkanê nade ku ezîzê dilê min hinekî di dîwanê de rûnê, ez jî herime cem wî, hinekî pê re xeber dim û paşê Xwedê bibire edetên Kurdan” (M.R – 51)

Dê û bav keçêne tenê bo kurê xwe herwiha ji bo alîkarî bide kûlfeta malê jî dixwazin. Lewre kar û bar gelek in û ji dayîkê re komekî divê “Lê em Êsiv jî bizewicînin, bila hinekî xebata te jî sivik bibe”(Ş.L – 46)

2.1.2.1.1. Keç Ecibandin û Fikra Keçê Pirsîn

Di hin cihan de em liqayê kast sîstema di nava kurdan de tîne. Li gor vê pêrgalê divê dewlemend bi dewlemendan re, kesîb jî bi kesîban re bizewice. Di Morof de wexta ku Axa dixwaze Morofê şivên bizewicîne jê re wiha dibêje “Dêmek, Memik, ez li vir ne beg im, erê? Tu lingên xwe weke orxana xwe dirêj bike, xeyn ji qîzên began û dewlemendan, tiliya qîza kî bikî...” (M.R – 52)

Di hin romanê Eliyê Evdilrehman de azadiya jinê di hilbijartina zava de bi awayekî aşkere xwe dide dest. “Seba wê bedewiya wê gelek merivan ew dixwest, lê ew bi kesekî qayîl nedibû û digot, ez gerek bi çavên xwe bibînim û bi dilê xwe bihebînim”(M.R – 24)

Herwiha di hin cîhan de bav û dê li pêy razîbûna qîz û kûrên xwe dikevin.. “bi tenê wî şertî ku Nûrê razî be û qayîlbûna xwe bide”. “... wisa jî rizalixîya qîz û kur hebe”(M.R – 52). Herwiha di dema dewetê de jî yek jî kesên ji civatê wiha dibêje “Apo bibexşîne, qîz û kur jî bi vê yekê razî ne, yanê na?” (M.R – 53)

Edo Axayê di roman Şer Li Çiya de derbas dibe, herçiqas kesayetekî xayîn, bêşeref û neyarê gelê xwe bê teswîrkirin jî, di meseleya zewacê de yekî qenc tê xuyakirin. Lewre bêyî xwesteka keça xwe, wê nade mêr. “Ez dixwazim ji niha ve serê we bidime girêdanê. Wekî mina kurên wezîrên mayî di rêya xerîp de neçe. Bila ew û destgirtîya xwe li welatên bîyanî bigerin, asoya wan fireh bibe, ji xwe kêfa cîhanê derbaz bikin. De, dewlet serê we, hun bi nevî û nîçirkên xwe bi salan bixwin jî xelas nabe, de... Min hela gilîyê kutasîyê nedaye wî, gilî gilîyê keça min e, hi berxa min?”(Ş.L – 155)

Ji bo zewacê yek jî mijara mûhim temen û layîqbûna wan e. Li ser vê meslê jî di berhemana de mînakên vî rengî hene. “Nurê û Morof her du jî gihîştine, wexta wan a zewacê ye, her du jî layîqî hev in”(M.R – 42). “Emrê wê gihîştibû hevdeh salan wexta wê ya mêrkirinê bû.” (M.R – 31)

2.1.2.1.2. Qelen

Qelen, ew mal yan jî pere ye ku li ber nîşanî kirinê de, malbata qîzê ji malbata lawik daxwaz dike.¹¹⁶ Qelen ji aliyê malbata keçikê ve tê diyarkirin. Loma jî xort li ber însafa malbata qîzê dimînin. Herwiha malbata qîzê, qîza xwe wek mewdûatek dibîne loma jî wiha dibêjin: “Lawo, ev çend sal in min tu nedîtîyî, li xerîbiyê girên te wisa dihatine min, êdî nebêje, min digot êdî, niha qîza min mezin bûye, ez ê bidime mêr û qelenekî pirr bistînim.”(G.M – 165) “Mişteriyên Zeynê jî gelek in... Ez ê wê jî bi elbê re bidime mêr”(X.X – 57)

Di romana de xort ji ber pîrbûna qelen ditirsin û wiha dibêjin “Kî yê qîzê bê qelen bide min?” (M.R – 45)

Ne tenê kûr, qîz û bûk jî, ji xwestina qelen aciz dibin û ne razîbûna xwe tînin zimên. “Dayê, ne tu, ne bavê min, ne jî birayên min, bi ‘emir û jiyîna min ve mijûl nabin. Çawa ku dibêjin, ‘ez e oge me’, we ez dame mêr, bi kêfa xwe qelenê min stand, êdî min windabûyî hesab dikin.”(X.X – 54)

¹¹⁶ Ebubekir Gören, *Di Romanê Erebe Şemo De Hêmanên Folklorîk*, Teza ne çapbûyî, Mardin 2013, r. 65

Bi sedema pir xwestina qelen, di navbera malbata de gelek alozî pêk tên û heta xort mecbûr dibin ku keçan birevînin.

2.1.2.1.3. Soz û Nîşan Kirin

Di berhemên li ser hatine rawestî de, di derheqê soz û nîşankirinê de nimûne kêr in. Lê ev nimûne jî bi giştî li ser gazindên qîz û kûran radiweste.

“Hela beriya şer Gogê û Evdilmecîdê kurê Fatmayê ji hev hez dikim, dê û bavên wan jî gilî dabûne hev ku hinekî destê wan fireh bibe, wê daweta wan bikin.” (G.M – 97)

Di hin cihan de bi sernavê karakteran rexne li edetên kurda yê di derbarê wextê nîşanê tê kirin. “Lê bi ‘edetên Kurdan, Nûrê çawa destgirtî, çû hêsiya kon, lê dilê wê li cem Morof bû û dilê Morof jî li cem wê bû.” (M.R- 57) Xwedê Xerap bike vî edetê Kurdan, extîyariya me tune em eşkere rûnên û xeber bidin. De tiştê nabe, helbet em ê wext bibînin û bi hev re xeber din.” (M.R – 58)

2.1.2.2. Wextê Zewacê

Zewac bi îzna dê û bavan û di derdora qaîde û baweriyên civatê pêk tên. Loma jî ger bi dilê wan be, kêfxweşî û dostaniyek mezin di nava malbatan de peyda dibe. Ji demên berê heta îro, kurd giringiyek mezin dane zewacê. Lewre bi saya zewacê tenê du kes nazewicin, her weha du malbat jî digihêjin hev û dibin merivên hev. Di zewacê de tiştê herî sereke di hîlbijartina qîz bo kûrê yan jî kur bo qîzê ye, ji ber ku kurd di xwestinê de herî zêde qîz yan jî kûrên bi ‘esl digerin.

Bi giştî tê gotin ku di zewacê de malbata qîzê divê piçek giran be lê di berhemên de nimûneyên miqabilî vê yekê xûya dikin. Mesela di cîhekî de Memoyê bavê Nûrê wiha dibêje “Ez ê di daweta qîza xwe de tîr bireqîsim.” (M.R – 53)

Di dawetên kurdan de xwarin û wexwarinên herî xweş tê çêkirin, dengbêj kilamên bengîfî û siwaran dibêjin, qîz û bûkên kurda cil û bergên herî xweş xwedikin, û hemû jî bi tîra xwe direqîsin. “Qîz û bûk û jinên Kurdan algewez li xwe kirine, govend girtine û direqîsin. Di odeyekê de jî, dengbêj kilamên siwaran û yê bengîfîyê dibêjin, cimeatê mijûl dikin. Di odeyê de din de dixwin û vedixwin, fîncanan bilind dikin, bo saxiya her du gulan vedixwin, dê û bavên zava û bûkê caba wan kesên saxiyan didin, razîbûna xwe ‘elamî vexwariyan dikin. Paşê dê û bavên bûk û zava dikevîne govendê, direqîsin, şa dibin û dibêjin.” (M.R – 101)

Di hinek cîhan de behsa edetên anîna bûkê, listikê tîn lîstin û herwiha behsa jimara rojên dewetê jî tê kirin. “bi ‘edetên kurdan bûk siwar kirin, siwar ketibûne cirîdê, bûk anîne mala zavê, cimaet rûnişt. Sifreya têr û tijî li ber cimate vebû, heft roj û heft şevan xwarin, vexwarin, kêf kirin.” (M.R – 102) “Şêx Zayîr, ji roja destpêbûna şer heta dawetê rûyê şahîyan nedîtibû, ançax lawikan dawet dîtibû û çawa lazim e tê de direqîsîn, kilam digotin. Dawetvan li hêvîyê bûn wekî serlesskerê wan jî bilîze. Demeke xurt Şêx Zayîr serê govendê kişand, fedayîyên di govendê de û temaşevana bi lîstika govendvanan, Simbilê û Şêx Zayîr re şa û kubar dibûn”(Ş.L – 275) “Gelî birayan, bi texmîna min, defvan, zirnevan û bilûrvanên me gelek hene. Bila hazirîya xwe gelek bibînin, sibê na dusibê, sibê zû dawet wê dest pê bibe. Berî şer qet nebe em di dawetê de rind bireqîsin. Divê def û daweta me sibê heta êvarê bikşîne”(Ş.L – 275)

Di daweta de keç û xort cil û bergên xwe yê herî spehî li xwe dikin. “Qîz, bûk û jinan kincên awazawayî li xwe kiribûn, qolên zêran li ser kofî û eniyên xwe netirandibûn. Mêran kolozên Kurdan î bi şel û şemaqiyên keskesorî dabûne serê xwe, cîzmeyên xurom ên birqonek kiribûne piyên xwe, arxalix bi ser arxalixan de li xwe kiribûn, kemberên zîv ên eteklî yê zêrkildayî, qemeyan diha rewş didane bejn û bala lawên Kurdan ên mêrxas”(G.M – 198)

Di romana Morof de em hîn dibin ku dawetên kesîban ji yê dewlemendan cûda ye “Cimaeta mayîn jî bi dengê bimbarek û pîroz kirin û dest bi reqsê kirin. Memo dixwest daweta qîza xwe bi teherekî din derbas bikira. Wî gelek caran digot, ez ê daweta qîza xwe de têr bireqîsim. Gelo ji şivan û gavanan nedihat bireqîsiyana? Ne wexta ku ew diketine govendan, meriv hijmetkar bû li wan mêzê bikira. Wan çiqasî kesîbî dîtibûn, ew qasî jî ew diketine heyra şayiyê û wexta ku şayî dibû, wan derdê xwe ji bîr dikirin û dibûne gula şayiyê. Govend, reqas, kilam xûrê wan bû. Lê dengê morof zomê hildabû, dişûlikî, dikete guhên dewlemendan, te digot ew qerfan bi dewlemendan dike û dibêje, em jî dikarin şayiyên derbas bikin...”(M.R – 53)

Di hin cihên Şer Li Çîya de tenê behsa dewetê tê kirin. “Ne axir, dê û bavê min û me di vî xanî de wê deweta heft bira û pênc xwîşkên min ên porkurê bikira?” (Ş.L – 32),

“Ji def û dewata Şêx Emer û Xezê Xanimê re gelek sal derbas bibûn”(Ş.L – 38), Def û daweta xwe bike”(G.M – 90)

Xwediyê malê çî ji dest tê pêk tîne, her hewcedariyê tîne cîh û ji zêdebûnê teqsîr nake. “De dawetên Kurdan bûn. Xwedanên dawetan, ji bo hewayê temîz û dawetvanî gişk bi cî bibin, di gund de kon vegirtibûn. Kulavên Xuristanî hatibûne raxistin, bi ser wan de emenî û xalîçeyên nexşewazî hatibûne danîn, balgiyên quştukî bi cergê danîbûn. Sîtilên bile’t ên goşt û birinc li ser kuçikan dikelijîn. Şerbetçiyên cêrên şerbetê di nava dawetiyên de digelandin.”(G.M – 199)

Wextê diçin bûkê siwar bikin pêşî li mala bûkê xwarina xwe diwîn û stranên xwe yê li ser xeribiyê vedibêjin.

“Demeke xurt şûn de, lêxistina def û zirneyan hat sekinandin, bûkên xêliyên sorgewez li xe kirî birin pişt perdeyan. Bi ‘edetên Kurdan, cimaeta dawetê berê li malên bûkan dan rûniştandin, dest bi xwarina xurek û vexwarina şerbetê bû. Dengê strana kilama Xerîbê ye jin û qîzan e li ser bûkan mîna dengê şarûr û bilbilan dihate bihîstin.”(G.M – 203)

Di daweta kitêban de adetê pere dayîn jî heye. Her kesê ku pere li bûk û zava ve dike, bi elbê re defçî li hewayê belav dike. “Temaşeyan çawa ‘edet şabaş didan, dengê defan din ava hewayê de belav dibû: ‘ Malî ava ji kalikê Seydo re, bîst manat şabaş da! Malî ava!.. Malî ava!.. Malî ava!..”(G.M – 198)

Yek jî edetên daweta ketina Cîrîdê ye. “De êla me êleke mezin bû, cimaetê hurmeta Ehmed digirt, ew merivekî ne xerap bû, lewma jî cimaeta êlê ya payê pirr hatibû dawetê, ji xwe re direqisîn, li hespan siwar dibûn, diketine cîrîdê. De dawet bû, her cure şayî derbas dikirin.”(G.M – 200)

Herwiha tiştêkî eceb e ku, bi qasî di romanên de tê fehm kirin, di dawetên berê de Guleş(Güreş) jî tê kirin ku niha hima bêje bi temamî hatiye ji bîr kirin. “Hema wê demê, dengê def û zirneyê yê meqamê Guleşê hat, ji haziran her kes bi ciyê guleşê ve çû, Guleşçî Eylaz û Kinyaz li ber meqamê guleş hev dibirin û dianîn, lê kesekî kesek li erdê nedixist, te digot quweta her duyan anegorî hev bû. Temaşeyan her kesî qewmê xwe yê guleşçî dipesinî, diqûjiyan, giva fesala lierdêxistinê ji wan re digotin. Meqamê guleşê her merivekî temaşeyî dida biheweskirin, her kesî dixwest guleş bigirta, ji xwe ber diranên xwe diçirikandin, destên wan bê hemdê wan bilind dibûn. Hema di wê bîstê de, ya ji temaşeyan re heweskar, Kinyaz Eylaz kire semtê, ling avête ber wî, ew li erdê xist, xeberên eferim ên cimaetê ew dor û ber hildan.”(G.M – 202)

Di pasajek Gundê Mêrxasan de bi giştî edetê dawetên wan wiha tê vegotin.

“Evdilmecîdê kur mezin kiribûn, li hêviyê bûn bi def û daweta wî şa bibin. Demekê Fatme kete nava mitaleyan; giva li der mala wan dawet e, ew û mêrê xwe ketine govendê, di şahiya kurê xwe de direqîsin, hevalên Evdilmecîd şabaşê didin, bi milê wî digirin, dikine govendê, bi tevayî dilfzin. Evdimecîd şerm dike, serê xwe bilind nake, li reqaşçiyên û temaşeyan nanihêre. Paşê defçî û zirneçî qaydeyê Cîrîdê lê dixin, siwar hespên xwe li ber defê didine reqasê, berbu siwar dibe, ber bi mala Eliyê Fariz ve diçin, peya dibin, cihêz li hespan dikin, bûkê siwar dikin, ber bi mala wan ve tîni, ew tasekê û kevçiyekî hiltîne, her duyan li hev dixê, li pêş bûka xwe direqîse û diçe: ‘Bûkê can, bûkê, ez bi qurbana mirazê te û Evdilmecîd bim! Xwestina me ya bi salan serê xwe girt...’, ” (G.M – 100)

2.1.2.2.1. Balgiya Bûkê

Di çanda kurda de yek jî edetên zewacê balgiya bûkê anîne. Wisa ku ev karekî pîroz jî tê qebûl kirin. Lewre di derheqê balgiya bûkê de gotinek bi vî rengê jî heye ku dibêjin ‘Li ser balgiyekî kal û pîr bibin’. Li gor edetên kurda, sêwarên diyarkirî ji bo balgî anînê dikevin pêşwaziyê û kesê qezenç bike û herwiha hespê wî jî bo vê serfiraziyê tînin xelat kirin.

Di novela Morof de, dema dijminê sinifê tînin qedandin, bi dilekî rehet dawetên xwe yê derengketî pêk tînin. Di wê dawetê de bi awayekî kitekit behsa edeta balgiya bûkê anînê tê kirin. Herwiha behsa berbûk û birazava û edetên li derdora bûkanînê rapêçayî dike.

“Gelî siwaran! – Çolo got. – Hela di ciyên xwe de bisekinin, ez ê vê lehzeyê navnîşa we bigirim. Hûn ê rast herin derkevîne binetara riya *paşalixê* ku diçe qezaya Şarûrê; li wir, sê girik hene, hûn li wir dîsa gişk li cêrgeya bisekinin, ez ê navnîşa we derba duduyan bigirim, paşê, ez ê xwe bidime perekî siwaran ku ez bi we gişkan bême kifşê. Wexta ku min şemaqiya dora kolozê xwe hejand, êdî serên hespên xwe bedrin. Ez texmîn dikim her tişt ‘eyan e. Niha hela neçin, em bûkên xwe siwar bikin û ji nava gund derxin, paşê hûn dikarin herin. Kuro, gelî defçî û zirneçiyên, qaydeyê Cîrîdê lê xin!

Dengê def û zirneyan dîsa hemû der hingaft, siwar di nava gund de ketin cîrîdê, birezava û berbûyan bûk li hespên nêr siwar kirin, berbûk jî siwar bûn, birezava û qewmên zavê yekî serên hespên bûkan kişand û duduyan jî zengûyên hespên bûkan girtin û ji nava gund derketin

Siwarên bûkê ji zû ve ber bi ciyê kifşkirî ve çûbûn, her pêncbûk gihiştibûne feza medena Xoyê, berxvanan berxên nêr dianîne pêşiya bûkan, xelata xwe distandin.

Rojê guliyên xwe yên zêrîn hêdî hêdî berhev dikirin, lê j ite tîrê demekê guliyên xwe şeh dike, hinekî dide derengxistinê ku li pênc dawetên gundê Sûsê temaşe bike, **kîjan siwar balgiyê bûkê berê bîne û wê çi xelatê bistîne**. Siwarên bûkê bi hemû qerarên kifşkirî ji ciyên xwe leqiyên. Menzîl bê hesab dût bû, gelek hesp bir ê ve westiyabûn, lebat pê nedibûn, lê hela gelek jî diçûn, lê wey li wê bezê. Gelek siwar jî ji hespên xwe peya dibûn, *solix* didane wan, hesp destkêşî xwe dikirin, bi xwe direviyan, hespê jî dida pêy. Siwarê hespêqule, Şekiro, li pêşiya gişkan bû, ew zû zû ji hespê peya dibû, *solix* didayê, dîsa siwar dibû, ji siwaran derbas dibû. Pênc siwar gihiştin hevrazê li binetara gund, ji wan her pênc siwaran hespê qule li pêşiya gişkan gihişte gund, pênc destmalên sorgewez avêtin stûyê hespê qulê, balgî bi terkiya hespê wî ve girêdan, siwarê hespê qule çerxek dudu dan hespî, dîsa li siwarê bûkê vegeheriya, siwarê duduyan. Enwer, siwarê sisiyan, Bekir, balgî derxistin, xelatên xwe standin, li siwarê bûkê vegeheriya’’(G.M – 205)

Di romana Şer Li Çiya de bi awayekî aşkere behsa vê edetî nayê kirin. Lê di cihekî de wexta behsa xweşikbûna stêrkan tê kirin, ji bo ku xwîner baştir serwext bibe, tevgerê stêrkan bi edetê dewetê re tê şibandin. “Şeve kifşkirî, şeveke xweş bû; te yê bigota qey stêrkan li asîmên destên hev girtine û ji kêfa dilê xwe re ketine govendê, hêdî hêdî direqîsin. Lê hinekan jî fena ku xwe çep û rast di nava asîmanan de dibezandin û **dixwestin balgiyê bûkê bibin, ji xwe re pêşkeşê bistînin**. Di wê şeve tavahîv de, te derzî biavêta erdê wê bihata kifşê’’(Ş.L – 118)

Di romana gûndê mêrxasan de edetek zewacê wiha tê behskirin. “Demekê û bi şûn de, her pênc bûkan ji nêzîkayî li gund kirin, hema wê çaxê, bi ‘edetên Kurdan, cahilan zava hilkişandibûne ser banê xaniyê wan, her yekî çend sêv dabûne ku wexta ku bûk peya kirin, li hinda şêmîkan li kofîya wan xin. Her zava li ser banê xaniyê xwe hazir sekinîbû. Xesûyên bûkan her yekê kevçiyek û tasek dabûne destên xwe, kevçî li tasê dixistin û bi reqs bi pêş bûkên xwe ve diçûn. Xêleke şûn de bûk û her kes li ber avahiyên wan peya kirin, bi ser serên wan de kaka, fîka û pereyên hûr direşandin, zarokan jî berhev dikirin, lê zavayan jî sêv li serên destgirtiyên xwe dixistin û ji bên peya dibûn.’’(G.M – 206)

Wekî xûyaye ji aliyê zewac û edetên zewacê de çanda kurdî têra xwe bi nimûneye. Di romana de jî bi zimanekî pastoral û pesndayîne behsa van edetan tê kirin.

2.1.3. Mirin

Mirin bi awayekî şênber dawîbûna jiyanê îfade dike. Lê di çand û edeta civata de wateyên kûrtir ji mirinê re hatiye veqetandin. Çawa ku bawerî û edet li derdora welîdin û zewacê hatiye xemilandin eynî wisa bawerî û edetên mirinê jî hene. Ev bawerî û edet li gor ol, erdnigarî û sosyolojiya civakê diguhere.

“Şiklê herî sirûştî ya bilavkirina bûyera mirinê, bi girîna xizmên mirî çêdibe. Cîranên ku bûyerê dibihîsin li dora mala mirî komdibin û dibin şirkê êşa xizmên mirî. Di vê navberê de xwediyên mirî yan jî cîran xebera bûyerê didin cihên pêwîst.”¹¹⁷

Bi giştî em dikarin bibêjin ku mirin bi awayekî metnî tê pêşwazîkirin. ‘Sultan lawo, de emrê Xwedê ye, bila tu bi qewm û bi pismaman ve sax bin, ez kor bim.’(X.X – 18) ‘Helbet, bi fermana xaliqê min, em hemû jî dê bimirin. Berê kal diçin, paşê jî silsileta pey wan’(Ş.L – 49)

Di hinek cihan de mirinê wekî ji nû ve welidîn diperîjînin. Bi ser navê karektrên dîrokî di derheqê mirinê de gotinê vî rengî hene. ‘Mirina min a îroyîn dawet e!’(Ş.L – 27), ‘Mirin min natirsîne û piçekî jî hukmê ser min nake. Ji ber ku bona azadîya Milet li ber darê sekinîme.’(Ş.L– 28),

Di hinek cihan de behsa edetên defin kirinê tê kirin. ‘Li vir, bi edetê kal bavan wana defin dikin, ji kevirên dora tîrbê dayîreyê çêdikin, derê wê dihêlin û gişk bi hev re dibêjin: ‘Em ber tirba we ya zîyaretî sond dixwin, heta j ime bê, em dê tola w ehildin! Îro tirba we wê bibe zîyareta kurdperwerên heq...’(Ş.L – 192) ‘Rojtira paşîn, bi ‘edetên Kurdan êlên Kurdan ên Kakan, Milan, Mirdêsiyan û Zazayan ew defin kir.’(X.X – 16) ‘Wexta ku eskerên Îranê bi temamî ber bi Tehranê ve kişyan, fedayiyên Kurdan meytên xwe yê kuştî gişk berhevî hafa Geliyê Mesoyê kirin, bi ‘edetên Kurdan defin kirin, lê birîndar şandin Çiyayê Xezalê, nava elê’(G.M – 63)

Em di novela Morof de hay jê çêdibin ku edetê defin kirina miriyê kesîb û dewlemenda ne wek hev in ‘Mirin jî heye, mirîn jî heye. Eger dewlemendek dimire, temamiya êla wî reş girêdide, hespê wî jî reş dixemilînin. Lê ya kesîban’(M.R – 11)

Di hin beşên romanên de xwekirina cil û bergên reş bi nêzikayîya mirî ve tê îfadekirin. Lewre dema nas yan jî eqrebayek dimire êş û elema tê hîskirin bi xwekirina kincên reş ve tê xûyakirin. Di Morof de dema bavê Mehmet dimire, diya wî kincên reş

¹¹⁷Sedat Veyis Örneke, *Anadolu Folklorunda Ölüm*, Weşanxaneyê Zankoya Ankara, Ankara 1971, r. 41

li xwe dike lê ji ber zarokbûna xwe Mehmet ev tiştana fêma nake û ji diya xwe dipirse “Lê dayê, te çima kincên reş li xwe kirine?” (M.R – 89)

Di wexta mirina kesekî de tenê mîrov cilên reş li xwe nakin, eynî wisa derê malan, hebe hespên miriyan jî bi reş tî girêdan “De, bi edetê Kurdan, gava mîrên bi navûdeng û mîrxasên gel dikete heça dîwana Tirkîyayê, zanibûn ku îmkana azakirina wan tune ye. Yeqîn, wê bêne îdamkirinê. Dû îdamkirinê re, çawa edet bû, wan alên reş di quba xanîyan, derên malan, eger li zozanan bûna, bi pêş derên konan darda dikirin, mîr û jinan reş girê dida, şîr dikir, dengbêjan awazên mîrxasîyê derheqê afatîya wan de digot.” (Ş.L – 336)

Wexta yek dimire ne ku tenê nas û xizmên wî/wê herwiha hebe hespên wî/wê jî reş tê xemilandin. ‘Bi ‘edetên Kurdan, du beyraqên reş li der mala Reşo dardakiribûn û hespê wî reş û heş xemilandibûn.’ (G.M – 141)

Dema yek dimire kîlîda zimên jî diqete û herkes êş û azara xwe di lûtkeya herî mezin de dijî. Heta digihêje raddeyekê wiha ku, xizmên mirî zirarê didin xwe jî “Bi dû xeberdana Çolo re, dengê ‘Birawo!.. Xwîşkê!.. Birawo!.. Birawo!..’ di nava hewayêde sobekarî dikir. Jinan reş wergirtin, guliyên xwe jê kirin, sûretên xwe qelişandin, hespên tewilandî reş hatin xemilandin, beyraqên reş bi peşderên konan da dardakirin.” (G.M – 64), ‘Ji her du aliyan ve jî dengê *birawo, birawo, xwîşkê, xwîşkê* dihate bihîstin.’ (G.M – 94)

Piştî miriya jin şîr girêdidin ‘Dengên şîr û giriyê jinan, te yê bigota ber bi zaxa merzelê xwîşk û biratîyê û merzelê hafa Geliyê Mexsoyê ve diçûn û xatirê xwe ji ezîzên xwe yên ku serên xwe heta hetayê danîne dixwestin.’ (G.M – 75), ‘Bi dû xwarinê re ‘edetên Kurdan xelat dane jinana û reşên jinana ji serên wan hildan, di ber dilê wan de hatin kul i ber xwe nekevin, we heyfa xwe deh qat ji dijminan derxistiye’ (G.M – 94)

Di romana Gundê Mîrxasan de piştî şerê di navbera Çolo û Leşkerên Îranê de, gelek kuştî û birîndarên kurda çêdibin. Loma jî ji her derê welat giregirên êl û eşîra ji bo sersaxîyê tî cem Çolo. ‘De bi ‘edetên Kurdan, gerek giregirên her êleke Kurdistanê wan welatan bihatana serxweşîya mîrên kuştî yên êla Çolo’ (G.M – 70) ‘Çendekî bi şûn de, dest bi hatina serxweşîyan bû. Giregirên êlan ên ku dihatine serxweşîyê, her kesî wekî quweta xwe ji hêsîr re pez û dewar, ar, genim, sawar, birinc, şeker û parçe dianîn.’, ‘Di wan rojên payîzê yên sar de, rojê şeş heft destê dihatine serxweşîyê. Bi dû

xwarina nên û Fatihayê re, her serekekî êla hatî li ber Çolo û cimaeta wî, ji bo xwedîkirina hêsiyan zivistanê, dilê xwe vedikir...”(G.M – 71)

Di berhemên Eliyê Evdilrehman de xûya ye ku bi awayekî giştî di edetên kurda de mirin xweş tê pêşwazîkirin. Herwiha mirina ji bo gel an jî komekî jî pîroz dibînin û her dixwazin xwe fedaîyê gelê xwe bikin.

2.1.3.1. Wesiyet

Temûrê bavê Sultan nêzi mirina xwe ji kûrê xwe re wiha wasiyet dike;

“Sultan, ronayiya min, êdî ez ê bimirim, wesiyeta min li te ew e ku tu kolozê bavê xwe bilind bigirî, ji gotina cimaetê dernekevî, mîna bavê xwe di xêr û şerên cimaetê de bisekinî. Wisa bike k udi nava cimaetê me ya Koçer de hurmet û siyanetê bi dest bînî. Bo wan li miqabilî zilmkaran şer bike. wisa bike ku walîfî zilmê li cimaetê neke. Bo miyaserkirina her wesiyeteke min şêwrê ji diya xwe hilde.”(X.X – 16)

Nivîskar bi hêwla dersdayîn û şîretkirinê tevdigere loma jî di destpêka romana Şer Li Çîya de bi hûrgilî behsa raperîna Şêx Seîd û hevalên wî dike. Di wê beşê de wesîyetek jî heye ku bi vî şiklî ye “Cenazê min nîşanî kurd û tirkên kedkar bikin, bila herkes bizanibe wekî min ne bona azadîya nefsa canê xwe û wezîfeyê, lê ji bona azadî û bextewarîya neteweya xwe, kedkarên tirkên û neteweyên mayî şer kirîye û îro jîyana xwe didim! Bila bijî kurdîstan û serbestîya gelan”(Ş.L – 27)

Naveroka wesiyeta bi daxwaz û hêviyên kesên ber sekeratê ve peywendîdar e. Dixwaze tiştên di dile wî de veşartî ne bîne zimên. Loma jî wesiyeta kesekî di derbarê kesên ber çûyîne de agahiyê bi qîmet tijekirîne.

2.2. Agahdariya Gel

2.2.1. Bijîşkiya Gel

Bijîşkiya gel an jî tîba kevneşopî ji tevgerên mirovê ewil ên li hemberî qewamên sirûştî derketiye holê. Kurd jî yek ji wan neteweya bû ku, li hemberî qewimandinê sirûştî, hin çareserîya peyda kirine. Ji demên berê de ji ber jiyana xwe ya koçerî gelê kurd qîmetek mezin daye û dide bijîşkiya gel. Beyî çûyîna nexweşxane û bijîşkek xwe radestî îlacên kal û pîrên civata xwe dikan.

Li gor Pertev Nail Boratav bijîşkiya gel ev e; dema ku derfetên gel tune beyan jî ji ber sedemên din nikaribe biçe bijîşk an jî nexwaze biçe, gel serî li rêbazekê dide ku mebest jê nexweşiyên xwe temam bikin û zêde bikin.”¹¹⁸

Çawa ku demên berê nexweşî bi metodên kevneşopî tên pak kirin, eynî wisa jî ji dêvla bijîska serî li hekîmên kurd didin. “Di şikeft û zagên we gelîyên Araratê de bi destê hekîmên Kurd ve hatine qenckirinê û dîsa vegeriyane nava birên xwe yê fedayî û dijberî dijmin şer kirîye” (Ş – 20)

“...Bona ew roja reş neyê serê kurdan Zayîr difikire wekî hekîmekî şarezadi desteya xwe de peyda bike da ku bikaribe birîndaran li zagêû şikeftên çîyan de qenc ke. Bi salix û sûlixên rûspiyan Şêx Zayîr dibihîse wekî din ava êla Şikakiyan de hekîmekî zor zana heye. Bi cure cure hêşinayîyan mîrovan ji mirinê xilas dike û cerahkerekî zehf zor e jî.. Jê re digotin Reşo, lê gel ji wî re digot hekîm” (Ş.L – 164)

Em di berdewama pasajê de hîn dibin ku hekîmtiya nav gel, ji bav û kalika re derbasî zarokên wan dibe. ‘Ew ji kalikê xwe û bavê xwe hîmî hekimîyê bibû, bavê wî jî ji kalikê xwe’ (Ş.L – 165)

Hekîmê nav gel dermanê xwe ji giyayan çêdikin. Ew giya jî piranî li deşt, zozan û çiyayan de tên peyda kirin. loma jî kesê vî karî dike, di heman demê de ji xwezayê re jî têkildar e û cih û warên giyayan û herwiha wextê şînbûna wan jî baş dizanin. ‘Ez ji we re rast bibêjim, bi saya Xwedayê mezin û bi alîkariya ocaxa we hemû cure dermanên min ên ji hêşinahiyê çêkirî hene. Lê belkî kêmasî çêbe û lazim be ez dê li bereka Ararata Piçûk û ya mezin dîsa berhev kim.’

‘Gereg e tu xêncî çûyin û hatina min deh rojan wext bidî min wekî ez hinek dû dermanan jî ji çolê berhev bikim. Ku min ew jî bi dest xistin êdî însalah derman wê salekê têra min bikin.’ (Ş.L 167)

Di hinek berheman de, ne ku bi kitekit lê tenê bi sernav behsa bijîşkiyê tê kirin. Herwiha ji devla bijîşk, hekîm û ji dêvla nexweşxaneyê jî doxtirxane dibêjin. Dema Morof nexweş dikeve qîz ji bavê xwe re wiha dibêjin. “Bavo hekîm lazim e” (M.R – 29). “Di her gundekî kurdan de doxtirxane, mekteb, klûb, kitêbxane hene” (M.R – 88) “Qumandarê hidûdvanan dît ku xeberdana wan hinekî dirêj dikişîne, tarî jî ketiye erdê, cimaeta mihacir jî westiyayê, emir kir, ‘Hinekî li dûrî avahiya hidûdvanan bila koça

¹¹⁸Pertev Naili BORATAV, 100 Soruda Türk Folkloru, Weşanxaneya Gerçek, İstanbul, 1999, r. 122

xwe daynin, cimaet hêsa be, doxtor jî birînên birîndaran derman bike, heta ku em hewaldana xwe tamam bikin.’ Emrê qumandar bi elbê re hate qedandin’’(G.M – 77)

Di cihêkî ya romana Gundê Mêrxasan de bijîşk wek ‘îmdatçî’jî tîn binavkirin. Di wir de tişteki balkeş heye ku kurd di destpêkê de baweriya xwe bi wan doxtor û îmdatçiyên nayînin. Ji wan direvin û naxwazin nexweşên xwe teslîmî îmdatçiyên bikin. Lewre heta niha bi tişteki wiha re leqay nebûne. Her cûre nexweşiya wan bi destê kal û pîrê zana û bi rêya nebatên xwezayê hatiye baş kirin.

“Demekê û bi şûn de, karwanê otomakîneyan hinekî dûrî êlê hêwirî, heft heşt jin û mêrên xelatên spî lê, çardar di destên wan de, ber bi êlêve hatin, selam dane cimaeta hişyar. Çolo êdî bi her tiştî dizanibû, wî ciyên birîndar û nexweşan nîşanî merivên xelatên spî li xwe kirî dan. Îmdatçiyên dest avêtin destê kîjan birîndarî û nexweşî, xwediyên wan merivên xwe nedidan.”(G.M – 81)

Lê paşê tîn wê fehm ku ev doxtor û îmdatçî baş in, loma jî bi dilekî aram nexweşê xwe teslîmî wan dikan. “Mala we bişewite, wexta Dîwana Îranê mala we şewitand! Ez ê beriya gişkan kurê xwe bidim, paşê hûn dizanin. We dinya li serê me anî hev. Mêrikan ew qasî ji me re qenciye dikan, ev jî pêş qenciya wan ve? Mêrekî mîna Çolo ev saetek e ji we hêvî dike, hûn giliyê wî di pişt guhê xwe re davêjin. Gelî doxtoran, kurê min beriya gişkan bibin, kî jî naxwaze, şuxulê wan e...”(G.M – 81)

Di romana Gundê Mêrxasan de piştî civat ji aliyê bijîşkan ve bi awayekî pak tê qenckirin, vegotina karekterê jî diguhere û hinek rexne li hekîm û merivên berê tê kirin “De li serê Çiyayê Xezalê, xên ji hekîman û merivên dinyadîtî, kî dikaribû ew qenc bikirana? Hekîm û merivên dinyadîtî ji dermanên cimaetê yên ji kulîlk û pincarên *başqebaşqe* çêkirî didane ser birînan. Bi wan dermanan gelo birîndar dihatine qenckirin? Wan bi cureyekî birîndarên sivik qenc dikirin, lê yên giran jî baweriya xwe bi wan dianîm’’(G.M – 89)

Di romana Gundê Mêrxasan de xûya dike ku, kurd di destpêkê de baweriyên xwe bi bijîşkiya dewletê nayînin. Lewre ew di xizmeta dewletê de tevdigerin û kurd jî dewletê her ne baş nas dikan. Loma jî di destpêkê ji doxtora ditirsin. Lê paşê ev fikriyata wan diguhere û ber bi hereketên xwe yê berê dikevin. “Cimaeta mihacîr a seba birîndar û nexweşên xwe hafî, wexta ku çav bi dam û dezgehên nexweşxaneyê, xwedîkirina birîndar û nexweşan ketin, xwe bi xwe ji gilî û gotinên xwe yên berê gotî, ‘*etbara xwe bi doxtoran neynin, poşman bûn.*’’(G.M – 102)

Romanên ku paşxaneyî xwe dispêrên dîrok û folklorê de, bijîşkiya gel bi awayekî xurt derdikve pêş. Di van romanên de nexweş serî li rûspiyan didin û şifayên wan ê ku bi nebatên xweza yêhatine çêkirin, bikartînin.

2.2.2. Giyanasîna Gel

Nivîskar di romanên de behsa giyayên aîdê çanda me, giyayên ji aliyê civata me ve tê çandin û curbecuriya giyayan dike. Lê ne zêde be jî çandiniya zêviya bêhtir derdikeve pêş.

“Çawa ku ‘edet e, jin, zarokên givre û kalan, mehên havînê, ji qereberbanga sibêhê de torbeyên xwe davêtine stûyên xwe, pêberjêr, ber bi gundên arane ve diçûn, ji xwe re li ser rîyan, li nava zeviyên çinî simbilên ceh û gênimberhev dikirin, ‘esra teng ber bi gundê xwe ve dihatin.’”(G.M – 18)

“Êla Qadirîyan çaxa ji Iraqê hatiye Romê rewşa wê pir giran û bi zehmet bû. het ji xwe re sitar çêkirin, çend salan tê de man, dest bi çandiniyê kirin. paşê halê wan baş bû.”(Ş.L – 37)

Ji kesên bi karê çandiniyê re eleqedar dibin re cotkar jî tê gotin. Di hinek cihan de karê cotkariyê ji wateya çandiniyê tê dîrxistin û ji bo şibandinê tê bikaranîn. “Tu dibêjî qey tebîyetê dema kokimîya wî bi destê cotkariyekî xamî xêşimî gîsinkestî rakiribû, bi çal û kotran ve xemilandibû”(Ş.L – 20)

Di hinek romanên de em bi awayekî aşkere leqî karê cotkariyê naynê, lê bi gotin û qaliban em têdigihêjin ku haya wan ji cotkariyê heye. “Li wir em nanê ceh bixwinî ji pelawa vir hezar carî çêtir e” (Ş.L – 117) “Cimaetê heta dirûna ceh û gênim her malekê ji xwe re kizoxek çêkir û ji xwe re kir star.”(G.M – 18)

Di hin cihan de karakterên romanên zanebûna xwe ya di derbarê xweza û daran de wiha destnîşan dikin. “Payîza derengî bû. Her bedewiyeke tebîetê ji sermaya Çiyayê Xezalê ya sert qurçimîbû ser hev. Wê payîzê, xên ji dara merxê darên mayîn gişk posîde bûbûn, rewşa xwe wehdêlî ji ser xwe avêtibûn.”(G.M – 75), “Çiya jî salekê stêw dimînin, çetinayiyên salê wê bi salê re derbas bibin, qet tişt nabe, bila îsal zarokên me hinekî çetinayiyê bikişînin, saleke din, em ê mektebê bikin...”(G.M – 109), “Meha Adarê bû, li pêşîya Araratê êdî kulîlkên berfê derketibûn. Serê herdu çiyayên Masîsê te dê bigota digihîştin asîmên. Rîşîyê şer û şimaqîyê dora kolozên wan ên sipî dadikuta ser demên wan. Di pêşên wan de li newal, berpâl, berwar, beroj, rast û qendîlên wan

qalçîçek, hêşînayîyên zimrûdê yên mexmerîyê nû derketibûn; fena bûka pişt perde xemilîbû. Dengê bilbilan, gogerçînan, teyran mîna kilama dayîkan ya lorî lorî dihate bihîstin.’’(Ş.L – 210)

Di romanên de şayesandina demsala biharê wiha tê kirin. ‘‘Wexta ku bihar li we vedibe hûn kirasê hêşînî û mexmerî li xwe dikin, kolozê çilqerqaş didine ser serê xwe, mirov hijmekar e li bejn û bala we ya titalî û takrihanî binihêre. Lê wê wextê ji wê biharistana hêşîn kulîlkên rengewazî serê xwe hil dikin, destê hev digrin mîna keskesorê dikevin reqasa ‘qazqaz’ê’’(Ş – 21)

‘‘Oh, çi qasî xweş e bihar, havîn, payîz û zivistana qezaya Dêrsîmê. Xût bihûşt e. Wexta ku bihar li Kurdistana Dêrsîmê vedibe; çiya, mêşe, gelî, rast û berpâl, kirasên hêşîn î mexmerî li xwe dikin û dikimkimin. Wexta ku ji wî kirasî gul, sosin, pêjek, beybûn, kulîlkên awazî serên xwe ji xewê bilind dikin, bi hêwa bê re dikevîne reqsê’’(X.X – 11)

‘‘Baxçe, baxçeyêke bihûştî bû. Te li kîjan alî dinêhêrî gul, sosin, rihanan gulpik dabûn; bîna bihûştê jê dihat’’(Ş.L – 86)

Li bereka çiyê, di mêşeyên six î pirrsalan î de, li ser darên beyanî yên gûzan, hirmiyên, sêvan, bademan, zoxalan û darên biyan, qelemeyan, merxê, qerexacan, şîlanên û çaman bilbil, teyr, çivîk, pepûk, gogercîn û terewîlên mayîn deng didane hev û du, meriv bi heyr û hijmekar e xêleke xurt rûnişt, sazbandiya wan a şarûr û bilbilyê bibihîsta.’’(X.X – 12)

Carina rewşa mirovan dişibînîn rîweka ‘‘Zeynê destên xwe mîna pepûka biharê ber bi hev ve kirine, hêsiraan bi ser sûretên sor de bi forma barana Gulanê dibarîne.’’(X.X – 53) ‘Simbêla wî mîna çiqên şîlanê bi dirrî, şûjînsûjîni bû’’(X.X – 55)

Ji xeynî mînakên vî şiklî hin gotinên pêşiyên jî di berhemana de derbas dibin ku zanebûna gelan ya di derbarê xwezayê de derdixê pêş.

Kurmê darê ne ji darê be, darê hezar salî bijî, reh bide, ber bide

Cimaeta me Kurdan çi qasî rind, çi qasî letîf gotiye, ‘kurmê darê ne ji darê be, darê hezar salî bijî, reh bide, ber bide.’’(G.M – 135)

Gîha li ser koka xwe hêşîn dibe

Elo efendî! Axir gîha li ser koka xwe hêşîn dibe.’’(G.M – 161)

Ew tiştên di beşa bijîşkiya gel de hatiye behs kirin, dikare di vir de jî bê bicîh kirin. Lewra zanebûna kurda ya di derbarê bijîşkiyê de, xwe dispêre nasîna giyayan.

2.2.3. Zoolojiya Gel

Ajal, di hemû pêvajoya jiyane de, bi mirovan re bûye. Herçiqas di destpêkê de ajal azadbin jî, bi demê re mirov hinek ji wan heywanan kedî dikin û hem ji bo xwarinê û hem jî ji bo vexwarinê ji wan îstîfade kirine. Heta li hinek cihan jiyana mirovan li gor ajalan hatiye saz kirin. Kurd jî, yek ji wan milletane ku, destpêka jiyana xwe li gor ajalên xwe avakirîye. Ser meselê ji ber xwedî kirina pez, jiyana kurdan bi koçeriyê derbas bûye.

Di çanda kurda de xwedîkirina pez parek mezin digre. Jixwe wekî tê zanîn jiyana kurdan bi giştî li ser koçeriyê û pê re jî li ser xwedîkirina pez pêwendîdar bû. Bi vê pêwendîya xurt çanda ku di derheqê heywanan de heyî ava bûye. Dema em lêkolînek bikin em ê pêrgî sedan gotin, biwêj, mesele yên di derbarê heywanan de ye bên ku îspata vê yekê dikin. Bi taybetî jî xwedîkirina pez parek mezin digre. Heta Îdrîs Kartal di nivîsekê xwe de tenê li ser mêşina disekine û wiha dibêje. ‘komên pez heya du sedî bi peyva “colik” ji du sedî heya çar sedî bi peyva “birêpez”, ji çar sedî pê de jî bi peyva “kêrî” tê binavkirin. Pezê ku ji mîh û beranan pêk tê “pezê mêşin” e.’¹¹⁹

Di romanên de di gelek cihan de behsa pez û şivaniyê tê kirin. Jixwe di romana Morof de, Morof şivan e û bi saya şivaniya xwe re rêya rev û xelasiyê dibîne. ‘Kalekala berx û miyan bû. Şivanan kerî ber bi zozanan ve dibirin. Çend rojan bişûndetir, axa û began koçên xwe dişandine çiyê’ (M – 80)

Bi sehîtiyên jiyane ve zanîna kurda ya di derheqê ajalan de jî zêde bûye.

‘‘Bi dû gelek çetinaiyan re, Riza Efendî razî dibe, lê çend şertan datîne pêşîya qasidên êlan, ku serê malê pezekê bidin, bihar, havîn, payîz û zivistanê keriyên pez, garanên dêwêr, revoyên hespên wî li qîşleyê bin û wisa jî xweliya wî bêcer bikin.’’(G.M – 17-50)

‘‘Di dilê wî re derbas bû ku bizin sax in, lê li ku ne, nizanibû. Wî şivanê pispor ji kal û bavan bihîstibû, wekî carina birkên bizinên xweyîkar jî dikevîne bin bandora nêrî, nevan dibin, didine pêy nêriyan, ji kerîyan diqetin, dûr dikevin, li wargehên mayî

¹¹⁹ Idris Kartal, ‘‘Di Eşîra Duderan De Navên Pezê Mêşin’’ *Kovara Folklorê Kurda* 2015, h.3, r. 84

dihêwirin. Û heke wan nebînin, venagerin, ew bere bere kûvî dibin, digihîjin heywanên beyanî. De, wê çaxê were bigere vegerîne. Ev yeka bûye qeyde û qanûneke dinya heywanetan”(Ş.L – 308)

“Dengê bilbilan, gogerçinan, teyran mîna kilama dayîkan ya lorî lorî dihate bihîstin.”(Ş.L – 210)

Zanîna kurda ya di derbarê ajalan de wiha zêde ye ku, em dikarin di derheqê vê zanîne de ferhegekî ajalan jî çêbikin. Lê em ê li vir tenê behsa hin dengê ajalan bikin ku, di berheman de derabs dibin.

“Xirmîniya Keriye pêz” (M.R – 12)

“Hocehoca şivanan e, hêlehêla gavanan e, kalîna miyan e, hirîniya menekiyan e.” (M.R – 15)

“Kalekala berx û miyan” (M.R – 80)

“Horehoran koçajotiyân” (M.R – 83)

“Wîtewita çivîkan” (M.R – 83)

“Dengê strana şivanan, kalîniya berx û miyan, mikîniya kar û bizinan, dengê cimaeta xebatkar a li çolê diha rewş dida bedewiya Gulanê”(G.M – 197)

““Berêvar bû. Kalekala berx û miyan bû. Cimaeta gund pezên êvarê dan dikirin.”(X.X – 40)

Eliyê Evdilrehman li gorî mijara behsa ajala dike. Dema siwarbûn, şer û barkirin hebe, behsa hespa dike, dema xwarin û koçert hebe behsa bizin û berxa dike. Bi vî awayî di berhemên xwe de rolê ajala derdixe pêş.

Jiyana kurda bi ajalan re peywendîdar e. Jixwe di demen bere de koçerbûne, geriyane û gelek ajalan jî naskirine. Ev naskirina wan a ajalan regekî jî daye gotinên wan. Em ê li jêrê hin gotinên pêşiyên ku naveroka wan ajalan in û bi şîretan ve xemilandîne binivîsin.

Ji deveyê mezintir fil e.

Ji min re bibêje, bes e. Ji deveyê mezintir fil e. Vê carê ez ê rasterast herim cem serkarê navçeyê, de te bihîst”(Ş.L – 68, 91)

Her çêlek tê dotinê, lê her gilî nayê gotinê

Ax, lawo, Her çêlek tê dotinê, lê her gilî nayê gotinê.”(Ş.L – 71)

Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e

Birako, şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e”(Ş.L – 76, 148, 333)

Xwedê berxê nêr ji bo kêrê daye

Ji meydana şer rev ne mêranî ye. Xwedê berxê nêr ji bo kêrê daye”(Ş.L – 83, 115)

Mî ber bi berxa xwe dikale û diçe, xezal jî ber bi kara xwe.

Belê, di dinyayê de, tu tişt mîna bengitîtiyê şêrn nîn e. Her tişt rind e di wexta xwe de.

Mî ber bi berxa xwe dikale û diçe, xezal jî ber bi kara xwe.”(G.M – 105)

2.3. Cejn, Şahî, Ol

2.3.1. Ola Îslamê

Di van romanên de wexta ku behs li misilmantî û qûranê vedibe ji ber zilm û zordariya dîwana rom û ecema vegotin digûhere û kirasê sîtemkarîyê hildide. “Dîwana Romê ji roja xuliqandina xwe û heta niha her dem bi pêpezkirina Quranê, fêl û finazên xirab û xayîntîyê êrîşî ser Kurdan kiriye.”(Ş – 25), “Her Kurdekî famdar, zana û serekê êl û eşîretan dizanî ku wexta dîwana Roma Reş dikeve tengasîyê bi fêlbazî dest diavêje Quranê. Sonda efûkirinê dixwe ku Kurdan bixapîne”(Ş.L – 33), “Gelî lawikan, hûn zanin bi vê Quranê Roma decal serê bi hezaran mêrxasên me xapandîye û serê wan xwarîye?”(Ş.L – 323)

Li hin cihan de ji xapandina Kurdan ol û quran wiha tê bikaranîn “Gelî qasîdan! Yeqîn, hêrsa şêxê we rabûye, ew şêxê me ye jî. Hema şêxtîya wî bi wê yekê re tê kivşê ku gule li wî nakevin. De, şêx dînik in, çi gotîye min qebûl kir, şêx serî ne, em jî ling in. Em misilman in, me çi daye hev û em nikarin ji hev bistînin? Bêjinê bila xwîna neheq nerije. Qurana me ya pîroz heya. Em dê di destê hev de sond bixwin û xilas bû, çû.”(Ş.L – 220)

Leşker ji bo Xatê Xanimê bixapînîn li ser Quranê sond dixwin. “Na weleh, bi Quran têla wî ya efûkirinê hatiye”(X.X – 43)

Civata Eliyê Evdilrehman di roman û novelên xwe behs dike bi gelemperî li ser ola misilmantîyê ne.

Di romana Şer Li Çiya de, di gelek cihan de behsa Şêx Seîd tê kirin. “Şêx Seîd bi dengekî bilind got”(Ş.L – 26)

Herwiha behs Şêx Evdilqadirê Gêlanî jî tê kirin. “Malbata Şêx Evdilqadirê Gêlanî”

Di hinek cihan de xwe dispêre agahiya Qûranê û wiha hawara xwe dike. “Roma Reş, ez gazî Îlahî û 1124 pêxemberan dikim”(Ş.L – 32)

“Çawa ku misilman li goştê beraz binihêre, wisa jî li şêx dinihêrî”(Ş.L – 38)

“Ne axir, tu jî musulman î û bawebûna te jî heye”(Ş.L – 46)

Karakterên romana di hin cihan de ol û nesla xwe ya misilmaantiyê derdixînin pêş. “Belê êdî çima ez di vê dînê de serê xwe bitewînim û ji nesla Şêx Evdilqadirê Gêlanî me, her kes me şermezar bike”(Ş.L – 54)

“Di medreseyê de dersên rohanîyê ciyê pêşî digirtin, ders gişk bi piranî bi şerîeta ola misilmanîyê didane girêdane”(Ş.L – 60)

“Sibehê teze safî dibû. Se û gur ji hev û du dihatine kifşkirin. Xatê Xanim misîne nimêjê hilda û çû destnimêja xwe ya sibehê”(X.X – 16)

Di hinek cihan de erka xwe tînin cîh û qerarê ji Xwedê re dihêlin. “Bêje Ehmed efendî, însellah, bi hewil û qerarê Xwedê û bi saya alîkarîya neteweya me û mirovên mîna wê yê şîrhelal, em ê bersiveke rind bidin vê erîşa dîwana Tirkîyayê rind”(Ş.L – 277)

“Bismilahirrehmanirrehîm, eşhedû enla îlahe îlelah, Xwedê te em Misilman nivîsîne”(G.M – 174) di van beşên behsa misilmantî û Xwedê tê kirin de bi awayekî eşkere neheqî li bawerîya ola îslamê tê kirin. Dibe ku nivîskar ji ber sedema pergala komûnîzmê rexne li misilmantiyê kiribe. Wisa ku nivîskar xeberdana hemû karakterên xerab bi besmelê dide destpê kirin, lê belê naveroka xeberdana wan diz û talana xelqê ye.

2.3.2. Cejna Remezanê

Cejn hest û kêfxweşiyên hevpar ên civatê îfade dikin. Cejn hem neteweyî û hem jî olî ne. Rojên cejna di navbera xeydan de aşîfî pêk tê, yekîfî û piştgiriya civatê zexm dibe. Loma jî di çanda kurda de rol û qiymeta cejna gelek e.

Di romana Gundê Mêrxasan de tenê di cihekî de behsa meha remezanê û cejna wê tê kirin. Lê tişteki ecêb e ku di vê behskirinê de remezan ji taybetiyên xwe yên cejnê hatiye dîrxistin û wekî dubendiyek cudaxwaz hatiye teswîrkirin.

“Heso Beg, çiraya min! Hema em dîr neçin; par zivistanê, meha Remezanê bû, de, bi ‘edetên me Misilmantiyê her malekê tevdira xwe ya ‘eydê didît ku eyda xwe pak derbas bike; komsomol, *fırqeci* û gedeyên gundê me wisa dane teşkîlkirin ku cimaetê dest ji wê roja pîroz kişand. Wan rojan, dengê Quranê wisa l ime hate birrîn, êdî nebêje. Di rojên Remezanê de, me xwe avête Mele Îbrahîm, ew her êvar, wexta fitarê hilkişe ser banê xaniyekî, azan bide, em jî fitara xwe vekin. Rast bibêjim, rojên pêşîn çawa lazim bû meleyê feqîr azan dida, lê rojên paşîn bi navtêdayîna Katibê *Uzeka* Fırqeyê ye, çî jehrmar e, nehişt em wî dengê pîroz bibihên.”(G.M – 151)

2.3.3. Quran

Quran kitêba miqeddes ya ola îslamê ye. Divê misilman hemû jiyana xwe li gor Quranê saz bike. Ji ber pîrozbûna wê, di dema tengasiyê de jî û di dema şahiyê de jî misilman serî li Quranê didin. Dema bixwazin xwe bidin bawerkirin li ser wê sond dixwin. Dema meram an jî xwesteka wan hebe Quranê dixin navberê. Bi awayekî giştî Quran ji bo kesekî misilman palpiştê herî xurt e.

Di gelek cihên romanê de behsa Quranê hatiye kirin. Lê her ku behsa Quranê dibe peyre jî vegotinek bi gazind tijekirî derdikeve holê. Lewre li gor pasajên romanên behskirî Quran di destê zilmkaran de bûye amûr û ji bo pelçiqandina kurda bi her awayî tê şixulandin.

“Riza Efendî wextê dixwaze Çolo bixapîne li ser navê Quranê sond dixwe. “Weleh, bi Quran, ez dixwazim komekê bidime we. Hi cimaet, êdî hûn çî dixwazin?”(G.M – 21) Canim, weleh bileh, bi Quran, kitêb û mishêf, lawikên we çiqas zîyan dane min, bila helalî canê wan be, gund jî pêşkeşî we.”(G.M – 25)

“Çolo lawo ‘emrê min digihîje heştê salî. Çî qasî tê bîra min û min ber çavê xwe ditiye, wexta ku dijmin hicûmî ser Kurdan kiriye, quweta wî sist bûye, dîtiye ku wê bê altkirin, destê xwe avêtiye Quran û kitêban, şêx û mişayîxan û sondan. Aha di destên

hev de bi Quranê sond xwarine, ew dane arxayînkirin û paşê sond pêpes kirine, hicûmê ser Kurdan kirine, ew hincirandine.’’(G.M – 27)¹²⁰

2.3.4 Çavkaniyên Olî

Di romanên behskirî de, ji bo atmosfer û rewşa karakteran baş bê veguhestin di hin cihan de serî li çavkaniyên olî didin. Di wan pasajan de çavkaniyên olî bi giştî ji bo şibandîne û miqayesekirina heybeta rewşê hatiye bikaranîn.

‘‘Fedayîyên Kurd jî anegorî melûmatên heyî bere ber bi himbêza Masîsê hildikişîyan, di nava wargeh û emirgehên hêlanê jorîn de her serhildankarekî Kurd qey dibû xilaskirekî Keştîya Nûhê Rûsipî’’(Ş.L – 231)

‘‘Te yê bigota qey Ker û Kulikê Silêman derketine meydanê û hev diceribîn’’(Ş.L – 40)

2.3.5. Ezîdîfî

Civata ku Eliyê Evdilrehman di roman û novelên xwe de behs dike bi gelemperî li ser ola misilmantiyê ne. Helbet gelek karakterên êzîdî di berheman de kifş dibin, lê hemû ji bo îspatkirina biratîya gelan tên bikaranîn. Tenê yek cihî de behsa ola êzîdîtiyê tê kirin. Ew der jî wisa ye;

‘‘Çaxa ku Şêx Adî serbestî û yekitiya Kurdan û Kurdistanê distrira Tirk li ku bûn’’(Ş.L – 25)

‘‘Îsbateke mayî ev e ku pareke neteweya Kurd wisa jî neçû ser ola misilmantiyê, ma ser ayîna şemsperestiyê, ma ser Êzdyatiyê’’(Ş.L – 25)

Romana Şer Li Çiya bi giştî di çarçoveya biratiya gelan de diçe û tê, loma jî ji bo ku biratiya xelq û netewetiyê xûrt nişan bide, nivîskar bi xûsûsî behsa Êzîdîyatiyê dike.

2.4. Baweriyên Gel

Bawerî ji demên kevn heta niha di pêvajoya jiyane de herdem cih girtiye. Bawerî di navbera mirovan de carina bi rasthatinî û carina jî bi neçariyê peyda dibe. Bawerî li gor qewm, dem û mekana bi awayekî cuda derdikeve meydanê.

¹²⁰ Mînakek din ya vîşeklî binêr: (G.M – 67-68)

“Bawerî bi wateya xwe ya bêjeyî di nezera şexsekî yan jî civakekê de qebûlkirina rastiyeke ya fikreke, bûyereke, biresereke û hebûneke ye”¹²¹

Îro her çiqas em hin baweriyên wek baweriyên tewş bi nav bikin jî, di demên kevn de bawerî xwediyê wate û nirxên pir bi hêz bûn.

2.4.1. Baweriyên di Derbarê Rengan de

Gelek reng hene ku serbixwe xwediyê wateyên kûr in. Mîna ku lixwekirina kincên reş yek jî nîşaneyê mirinê ye. Loma jî dema ku mirîye kurda hebin cil û bergê reş li xwe dikin û bi wî awayî didin zanîn ku ew di şîne de ne. “Ro ji nîvro şikestibû. Koçên mihaciran di nava gundên qezaya Nexçivanê yên li ser rê re derbas dibûn; cimaeta gundan, biçûk û mezinan pêşiya koçan dibirrî, kaka û fîka didane destên zarokan û bi wan re qurban û heyran xeber didan, lê wexta ku li reş û heşên li serên jinan, bûkan û qîzan dinihêrin, gelekî digiriyan û hinekan jî gunehê xwe bi wan dianîn, paşê xatirê xwe ji mihaciran dixwestin, ji wan re oxira xêrê dixwestin, koç dîsa bir ê diketin.”(G.M – 85)

Di berheman de tê xûyakirin ku, rengê reş bi giştî nîşaneyê xerabiyê û tiştên nebaş e. “Simbilê got: ‘Îî... bavo, ez bi qurban, tu bawer dikî wekî ez sira te bidime destê qelqê. Ma dibe ez bi destê xwe ala reş bînim derê mala bavê xwe’”(Ş.L – 150)

Hinek reng jî hene ku, xwe digihêjin sedsalê dûv û dirêj û xwediyê wateyên pîroz in. Di romana Şer Li Çiya de jî behsa van renga tê kirin ku ji wateya xwe ya rengî hatiye dîrxistin û bi wateyek neteweyî ve hatiye dagirtin “Ala kesk, sor û zer a azadiyê wê ser dîwanxana Kurdistanê û cihê ku hûn me îdam dikin, wê bimilmile’”(Ş.L – 28)

2.4.2. Baweriyên di Derbarê Hejmaran de

Baweriyên di derbarê hejmaran de di hemû ewrên mirovahiyê de hebû. Îro jî bi lêkolîna hejmaran re di derheqê mirovan de em digihêjin hin encaman. Di çanda kurdan û îslamê de jî mînakên bi vî rengî hene. Mesela di ola îslamê de hejmara 40 gelek tê bikaranîn. Helbet bikaranîna wê wiha pir beredayî nîn e. Herwiha di nav kurdan de jî adeteke ya zewacê heye ku sê roj û sê şev şahî berdewam dike. Bêguman sedema vê yekê jî heye. Herwiha di çanda kurdan de hejmarên mîna heft, bîst û yek, çil, 101..jî zêde tê bikaranîn

¹²¹Pertev Naili BORATAV, 100 Soruda Türk Folkloru, Weşanxaneya Gerçek, Istanbul. 1999, r. 7

“...Lê wexta ku tu vegerî xerabiyê li me bikî, çawa dibêjin, **roja bîst û yekê be**, em ê ji heqê te derên. Em îro aliyê Xwedê jî ite dîstinin, lê paşê şuxulê te ye...”(G.M – 28)

“Rehmetlêbûyiyê bavê min digot, ‘Xalit ne ji dola min e, **roja bîst û yekê be**, ew ê geziyakê bîne serê kurê min î mezin...”(G.M – 162)

“De navê bavê te jî di cêrga padîşayê Tirkan de hatiye nivîsandin. Heke ew çil bin, bavê te yê çil û yekan e.”(Ş.L – 147), Qazî, ji rojan bîst û yekê ve, ez qesas û qesavê serê te me”(Ş.L – 219)

“Hesab yek e, bêînsaf, ez qesasê serê te me. Roja sed û yekê be jî ez ê te bikujim.”(X.X – 38) Xwezil ji heft mîrên mirazan re”(X.X – 28)

2.4.3. Baweriyên di Derbarê Ajalan de

Di navbera xelqê de di derheqê ajalan de baweriyên cur be cur hene. Hinek ajal nimandina oxiriyê û hinek ajal jî bêyomiyê dikin. Li gor baweriyên olî xwarina goştê hinek ajalan haram e. Herwiha her ajal nikare bikeve malê û dest lê dana hin heywanan jî haram e.

Di romana Gundê Mêrxasan de li ser oxiriya heywana mînakek baş heye.

“Bi ‘edetên cimaetê, wexta ku rêwî bi rê dikeve, teyrede rastî wan tên, bizanibe ku oxira wan bi xêr û kardar e, lewma jî demekê posîdebûnê mala xwe ji ser demên mihaciran bar dikir, hinekî vedibişîrin û dîsa dest bi qedandina oxira xwe dikirin.”(G.M – 76)

Di çanda kurda de yek jî ajala pîroz bêguman dûvmeqesk (Hehecik). Li gor baweriya kurda kûştina ev ajal û zirardayîna wê ji bo kesekî beyomiyê tîne. “Dûvmeqeskan ji cimaeta gundên Dêrsimê re; ji kal, pîr, jin, bûk, qîz û xortan û zarokên gundan re çavrengayî dianîn û altindariya cimaeta Kurdan û Xatê Xanimê bimbarek dikirin. Car caran jî karwanên dûvmeqeskan bedew bi firîna xwe ya nazik nêzîkî serê Sultên dibûn, mizgîniya Sultên digihandine Zeynê û çavrengayiya Zeynê didane Sultên”(X.X – 78)

Ji ber baweriya olî xwarina goştê beraz haram e. Loma jî dema kesî ne baş hebe ji bo heqeretê navê beraza tê bikaranîn. ‘Îşev jî sebir bikin, belkî rehm têkeve dilê wî berazê reş, sibehê Sultanê me berde.’(X.X – 23), ‘forma berazan xirexira wî bû’(X.X – 55)

Herwiha çevbirçîbûna mirova jî, dişîbînin ajalan “Wek sêyên birçî nên direvîne”(X.X – 34)

Mînakên di derbarê ajalan de bi giştî bi çavderiyên salana ya ku ajalan mêzekirine û bi tevgerên wan ve gihaştine encamekê. Herwiha hinek ajal jî ji ber baweriyên olî hatine qedexekirin.

2.4.4. Baweriyên di Derheqê Axê de

Dema di dema tehlûkeyê de, kesekî sax û selamet vedigere malê, dilê herkesî şa dibe û li gor baweriyên xwe şikirbûna xwe diyar dikin.

Di hinek cihan de ji bo şikrê “Ew zû ber bi malê xwe ve hatin, zarok û Eyšan bi pêş wan ve hatin, destên xwe dane erdê, maç kirin û gotin; Hun vê carê jî sax û silamet vegeriyan malê” (M – 41)

2.4.5. Kaniya Mirazan

Eliyê Evdilrehman her çiqas ne bi awayekî xurt be jî di hin cihan de behsa baweriyên betal jî dike. Yek jî ji wan baweriyên, baweriya kaniya mirazan e. Di berhemên xwe de bi awayekî zelal kifş nabe ku, xwestek û duayên bi çi awayî li ser vê kaniyê tên kirin. Tenê di cihekî de ji bo nîşankirina warekî û di cihekî de ji bo şibandina hestiran hatiye bikaranîn:

“Dema ku Evdilmecîd ji êşa birînan dengê xwe birribû, hêsirên Gogê mîna coya *Kaniya Mirazan* dikişiya û egle nedibû.”(G.M – 106)

“Xatê Xanim rabû ser piyan, gazî Çerkezê rîspî kir û got:

- Çerkezê bira! Tu çawa rîspiyê deh gundan î, ez wan çar sed pênc sed siwaran dispêrime te, ku tu şulixî nebe û hûn rast herine kûrayiya mêşe, hinda Kaniya Mirazan. Ez ji we hêvî dikim hûn li çavnehêriya me bin. Ez ê dîsa bi destî qewmê me sargîs ji we re cabekê bişînim.”(X.X – 32)

2.5. Lîstik

2.5.1. Cîrîd

Zarok dema ku mezin dibin, bav her dixwaze zarokên xwe yên kur hînê Cîrîdê bikin. Lewre lîstika cîrîdê wek lîstika mêraniyê tê dîtin. “Temûr Sultan hînê cîrîdê,

neçîrê fikir û carcaran ew bi xwe re dibir li nava êlê digerland, ku ew ji niha de her tiştî hîn bibe.”(X.X – 14)

“Dû wê yekê herdû bira ketine cîrîdê. Tişt ji erdê hildidan, bi bayê bezêgulê davêtin. Di vî şixûlî de Zayîr dîsa serdest derdiket. Dû ceribandinan herdu birayan re tiving û şûr diavêtine stûyê xwe, qirme piştî xwe girê didan, teng û qûşa hespên xwe dişidandin, siwar dibûn û diketine cîrîdê. Wan bi bayê beza hespê xwe şûrê xwe ji kalîn derdixist û êrîşî ser hevdûdin fikir. Dibû çingêçinga şûran.”(Ş.L – 40)

Di meseleya zewacê de jî, li me gelek eyan dibe ku cîrîd yek jî listika neteweyî ya gelê kurd e. Ji şahiyên hilde, heta di pêşwaziya kesên bi qîmet de jî listika cîrîdê tê lîstin.

“Bi ‘edetên Kurdan bûk siwar kirin, siwar ketibûn cîrîdê” (M.R – 102). Bi vê mînakê em têdigijin ku di dawetê kurdan de jî cîrîdê tê lîstin.

Di hinek cihan de tevî navê cîrîdê tevgerên cîrîdê jî tê gotin. “Zû bikin li defê xin, qaydeyê Cîrîdê, bila cahil hinekî hespên xwe bibezînin seba Selîm Beg şa bibe!” (M.R – 55).

Di Morof de behsa listikek bi navê ‘tûr’ jî tê kirin.

“Hinekan jî tûr dilistîn, berî hev du didan” (M.R – 81)

Li hin cihan jî bo şadbûnê behsa hinek listikên zarokan tê kirin, lê belê navê listikê nayê vegotin. ‘Ji ber şadbûnê li gundan çend cîyan jî wek remza azadîyê agir vexistibûn. Zarokan û cahilan di ser re baz dida, nift li ser holên bi rîs çêkirîkiribûn, davêtin hewa, wexta kul i erdê diketin dîsa davêtin. Bi gilîyekî, te dê bigota li gund dawet e, daweta eşq û şayîyê ye”(Ş.L – 177)

2.6. Reqsên Gel

2.6.1. Cûreyên Reqsan

Li gelek cihan behsa lîstikan tê kirin. Jixwe nivîskar lîstika, mîna perçeyek ji jiyana wan dibîne “Govend, reqas, kilam xûrê wan bû”(M.R – 53)

Di romanên de tê xûyakirin ku karakterên romanê jî bo ku kêfxweşiya xwe bidin zanîn, serî li lîstika didin. Li kêleka lîstikan dengbêj deng didin

, qîz û jin xwe dixemilînin, xort xwe çêdikin û dest didin hevûdu bi têra dilê xwe dileyzîn. Kifş dibe ku repertûara kurda ya reqsê pêşkêtiye.

“Êmê kişandina du cixareyan, cimaetê êdî li rastê govend girtibûn, *Koçerî, Betalo, Hoy Narê* dilîstin, kilamên siwaran û yên mayîn digotin”(X.X – 77)

“Govend li meydana orta şêher awaz awaz digerîya, dengbêjan deng dabûne hevûdu, kilam diavêtine ser lawên xwe yên mêrxas û azakirên bajarê xwe”(Ş.L – 257)

“Di gundê Sûsê de, dawet bû. Daweta pênc cot dilên bi salan li hêviya hev sekinî. Di wê şahiyê de, mirazê wan bi hev şa dibû û digihîştine mexseda xwe. Di rasta li orta gund de, pênc def û pênc zirneyan lê dixistin. Pênc *govend* hatibûne girtin, her yekê bi qaydeyekî lê dixist, sergovendiyan destmalên xwe yên neqîşandî dibirin û dianîn, li reqsa xwe û li lîstika govendê dinihêrin.”(G.M – 198)

Di romana Gundê Mêrxasan de ji xeynî listika govendê behsa listikek din jî tê kirin. navê vê lîstikê Qaz Qazê ye. Li gor pasaja di romanê de derbas dibe ev listikek cahilan e û qaîdeyê lîstikê jî wiha ye.

“Demekê û bi şûn de, dest bi reqsa cahilan a *Qaz Qazê* bû. Her pênc def û zirneyan jî li wî qaydeyî xistin, cahil ketin reqsê, çend caran bil ez çûn û hatin, sergovendî û paşgovendî qayîşên zexim dabûne destên xwe, qayîş di destên xwe de dituqulandin, kîjan reqşçiyî xwe şaş dikir, yek lê dixistin. Bi qanûna vê reqsê, sergovendî çî bida destê xwe, gerek reqşçiyên bi dest bixistana. Sergovendî berê destmala xwe ji cêba xwe derxist, da destê xwe, hinekî bi wir de bi wê de li ba kir ku reqşçî bibînin, reqşçiyên ji cêbên xwecdestmal derxistin, li ser destên xwe dan lîstin, lê gelek jî bi dest nexistin, ji aliyê sergovendî de reqşçî dihate kutan. Temaşçî jî li dûr disekin, ji xwe re bi wan dikeniyên. Sergovendî destmal kire cêba xwe, zarokek hilda, da ser stûyê xwe, reqşçiyên jî her yekî zorokek hilda, lê derengketî gelek bûn, dîsa qayîşa sergovendî kete xebatê, cimaet dîsa bi derengketiyan keniyên.”(G.M – 198-199)

Lîstikek din jî ku tê behskirin lîstika *Koniye* ye. Lê koni ne lîstikek kurdewar e. Listika tirkan e. “Ew di ciyê xwe de rihet nesekinî, emrî ser defçî û zirneçî kir ku bi qaydeyê Tirkan, koniyê lê xin. De defçî û zirneçiyên me jî begzade bûn, çawa ku dibêjin, agirek nemabû ku wan xwe li berm germ nekiribû, her tişt dizanibûn. Wan bi elbê re qaydeyê Koniye lê xistin. Bi rastî jî ev meqamekî baş bû, xweberê çongên merivan direqîsin.”(G.M – 201)

Di dawetan de jinên kurdan bi xerîban re nikare bilîzin. “Berê ewilîn, kulfetên me tiringiya li ber defê û zirneyê nikarin bilîzin; ya duduyan jî, di ‘edetên me Kurdan de, tiştê wisa naqewime ku jinên me bi xerîban re bilîzin, ew yek hem jî bo mêran, hem jî ji bo jinan şerm e, eyb e.”(G.M – 202)

2.6.2. Amûrên Mûzikê

Bi giştî em dibin ku di listikan de bilûr û def zêdetir tên bikaranîn. “Zû bikin li defê xin, qaydeyê Cîrîdê, bila cahil hinekî hespên xwe bibezînin seba Selîm Beg şa bibe!” (M.R – 55).

“Heyf ku def û zirne tûnebû”(M.R – 53)

Def wek amûreke deweta serekê tê dîtin loma jî bi dawetê re cotepeyv çêdike. “Def û dawet li vir hîç nebûne”(Ş.L – 28). “Were ber def û zurnê çep doz bigire”(Ş.L – 64)

Wexta şer li defa dixin û amadehiya xwe ya şer dikin. “Defa hewarê di Sincanê de hatibû lêxistin, siwar êdî hazir bûbûn ku biçûna hewara Sultên”(X.X – 27)

Amûr û alavên mûzikê bi giştî bi klama pêwendîdar in. Lewra wexta ku kilamek tê strandin li kêleka wê amûrek mûzikê jî tê bikaranîn. Bikaranîna amûrên mûzikê piçek jî bi jiyana karakterên ku di mijara romanê de cîh digirin re eleqedar e. Ser mesele ji ber ku Morof şivan e amûra wî jî bilûr e. Di gelek cihan de dema behsa dengê wî tê kirin herwiha behsa bilûra wî jî tê kirin. ‘Morof xwe dida cîyekî bilindcî, li bilûra xwe dixist, pez bi ser wî de alomalo dibû’ (M.R – 34). ... “ew bi wê yekê ve hênîk dibû û dîsa li bilûra xwe dixist” (M.R – 34). “Helbet, bi bilûra wan Morof dikaribû lê xista... Wexta ku Morof bilûr anî” (M.R – 39). “Paşê Morof dest bi stranê kir, bilûrê xist” (M.R – 56), “Ew bi saya dengê xwe yê baş, lêxistina bilûrê û qabiliyeta xwe di nava cimaetê de hurmet qezenc kiriye” (M.R – 49)

Tevî bilûrê def jî di çanda wan de cih digire “Zû bikin li defê xin” (M.R – 55)

Bi giştî em dikarin bibêjin ku romannûs bi hewla ku di navbera karakter û mekanê de nêzikahiyek peyda bike tevgeriyaye. Li ber pez bilûrê xistiye, di şahiyê de jî bilûr û def bi hev re bikaraniye.

2.7. Mîtbexa Gel

2.7.1. Cûreyên Xwarin û Wexwarinê

Ji ber ku mirov hebûneke bîyolojîk e, beyî xwarinê nikare li piya bisekine. Lewre ji bo tendûristî û aramiya mirov hewceyî xwarin û vexwarinê ye. Kurdan jî wek her gelî çanda xwe ya xwarinê ava kiriye. Lê helbet di avakirina vê çandê de bandora erdnigariyê, dewlemedbûna xwezayê û baweriyên wan yên olî heye.

Wekî ku tê zanîn kurd bi awayekî giştî debara xwe ya jiyane li ser xwedîkirina heywanan û kêmbê ji bi cotkarîyê dimeşînin. Loma jî tevî qatix, penêr û rûn xwarinên bigoşt jî zêdetir xûya dikin. Ji xeynî xwarinên bi goşt em pêrgî zanînek kûr di derbarê cûrbecûriya fêkî sebze û giyayên xwezayê jî tên. Loma jî sebze û giyayên şîr di çanda xwarina kurda de parek mezin digrin.

Xwarin jî beşek ji çandê tê qebûl kirin. Edet û qaîdeyên xwarinê hene ku ji destxûştinê destpê dike heta xûştina firaqan diçe. ‘ ev çanda xwarinê ne tenê xwarin bi xwe ye. Dema ku xwarin bû beşek ji çandê, tenê ne xûrek tê bîra mirov. Çanda xwarinê jî bidestxistina qûtê xwarinê dest pê dike heta mirov xwarinê dixwe û rewşa piştî xwarinê jî di nava xwe de dihewîne.’¹²²

“Av li destên cimaetê dikirin, êdî kebabên sêlê û xûrekên mayîn hazir bûn.” (M.R – 55)

Di derheqê xwarina taştê de jî gelek mînak hene “Hinekan penêr, qatix, êmiş bo wan dianîn” (M.R – 84)

Di hinek cihan de tenê behsa navê xwarinan tê kirin.

“Kurdan û mirovên ji neteweyên mayî yên zerandî di ber her kevir û zînarekî de nan xwariye, “Kulfeta Karapêt, Şûşanê bi elbê re xurek hazir kir, bozbaşa goşt danî ber mêvanan, wan nanê xwe xwar û sifre hat berhevkirin.”(X.X – 19)

“Roj êdî ber bi avabûnê bû. Xatê Xanimê sifreya xurek li ber cendirmeyan vekir. Li ser sifreyê çî bibêjî hebû: Goştê qelandî, birinc, qatix, penêr, nanê loş î yekmêtroyî. Lê were lê binihêre xwarî kî bû”(X.X – 47) “..av vexwariye Bi hev re şabûne. Razane. Qeleçe çêkirine”(Ş.L – 22

¹²² Ramazan Turgut, “Çanda Xwarina Kurdan”, *Kovara Folklorê Kurdan*, s. 2015. h.3, r. 4

Bi saya vegotina rewşa kambax em haj ji xwarinê wan çê dibin. “Gelî decalan, ne axir, we yê dewsa goştê berx û karan ji goştê bav, dê, xwîşk, birên min û gundiye me ji xwe re ‘kibab’ çêkirina.”(Ş.L – 32) “Wê şevê heta berbangê sibê Xezê Xanimê û jinên haziriya Zayîr dikirin kade, bişî û kilor dipatin, goştê pêz û mirîşkan diqelandin, nanê loş av dikirin, di nava dstîrxanan de cîwar dikirin û wan xebata mayî diqedand”(Ş.L – 56) “Bi texmîn ew min nafiroşe. Ez ê sibê êvarê nîvê wê qeliya te aniye bidimê”(Ş.L – 74), “Hecîsker bi tenê emir dida xulaman, wan jî pêz şerjêdikirin. Li derve cure cure xurek çêdikirin. Demekê û bi şûn de, li ser sifreya mêvanan çî tehm û lehm bibêjî hebû. Berê dest bi xwarin û vexwarina şerbetê kirin”(G.M – 130), “Demekê û bi şûn de, Xalit hat odayê, wî siniya pîlawê, nanê loş li ser sifreyê rast kir, xeberdana Heso Begê û Eloyê Topal nîvco ma.”(G.M – 158)

“Îskaneke çaya me vexwe û paşê biçê”(Ş.L – 72), “Wê çay hazir dikir, hela me îstekanên ber xwe tamam venexwaribûn”(Ş.L – 195), “Dû xwarinê re xanimê çayeke bînxweş a mexmerî û fekî anîm”(Ş.L – 88), “Li wir em nanê ceh bixwinî ji pelawa vir hezar carî çêtir e”(Ş.L – 117)

2.8. Jiyana Civakî

2.8.1. Mêvandarî

Mêvanperwerî yek jî taybetmendiya gelê kurd e ku xwe digîhîne demên kevn. Li gor edetên kurda, dema mêvanek tê, bixwere xêr û bereketê jî tîne. Loma jî îzzet û îrfanek mezin didin mêvanan. Biçûk, mezin, xîzan, dewlemend ferq nake her kesê ku diçe mala Kurdan ser sera û ser çava tê pêşwazîkirin.

“Şêx Zayîr got: ‘Çima min derheqê mêvanheziya Kurdan, mêranî û mêrxasiya wan de nû nebihîstiye, dîrok şahîdê wê yekê ye. Dilê Kurdan fena van çîya û banîyên me ye. her demê dilê me mîna konê me ye pêşdervekirî li ber mêvanan vekirîye’(Ş.L – 178)

“Çawa neteweya me dibêje, ‘mêvan, mêvanê Xwedê ye, ser seran û ser çawan hatiye.’”(Ş.L – 261)

Eger kesê dibe mêvan yekî ne baş be jî, bê hurmetiyek nayê kirin û mazûban çawa lazim be wiha tevdigere. “Çend rojên din û bi şûn de, Riza Efendî bi birrek seyîsan re hate qîşleyê, çawa ku ‘edet bû, Çolo û çend mêt bi pêş wî ve çûn, li kêf û halê hev pirsîn, paşê Riza Efendî û seyîsên bi wî re hatî ji hespan peya bûn, ber bi mala Çolo

ve çûn; çawa lazim e, Çoloyan ji wan re ‘izet û hurmet kirin. Riza Efendî heqê qîşleya xwe hezar û pênc sed pez stand, reşbelek da Çolo, xatirê xwe ji cimaetê xwest û ber bi Xoyê ve bi rê ket.’”(G.M – 18)

“Em Kurd merivine bi namûs in, ne nolî Tirkan in. Em tu wextan di mala xwe de mêvanan naşêlînin, em di mala xwe de ji dostan re jî, ji dijminan re jî hurmetê dikin.”(X.X – 45)

Heta leşkerekî jî li ser ehlaqê kurda yê mêvandariyê disekine û dibêje “Kal û bavan gotine û niha jî dibêjin, ku Kurd tu wextan merivan di mala xwe de nakujin, lap arxayîn bin. Ew merivine gelekî bi namûs in.”(X.X – 46)

Di Morof de mêvandarî û edetên pêşwazîkirina nas û dostan wiha xûya dike. “Wexta ku Evdila Begê mêvan dîtin, bi elbê re peya bûn, tîfingê xwe ji stûyên xwe derxistin, serberjêr avêtine stûyên xwe, yanê ‘em li ber emrê te hazir in, teslîmî te ne’” û pêş de çûn.” (M – 54)

Mêvandarî yek jî taybetmendiya beşa civakê ye ku, di derheqê jiyana gel de agahî dide me. Di berhema de tê xûyakirin ku kurd ji mêvana hez dikin û qedr û qîmetek mezin jî didin wan.

2.8.2. Cînarî

Di civata kurda de mîna mêvanperweriyê, têkiliyên cînarîyê jî pir xurt e. Lewre H.z. Muhammed(sav) jî dibêje ‘kesê cînarê wî/wê birçî be û têr radizê ne ji me ye’. Ev gotin di çanda kurda de bûye yek jî dûsturê herî xurt.

“Lê di rojên giran de cînar xwe li cînarê xwe digire, bîra xwe li birayê xwe digire”(Ş.L – 18)

Cînar di rojên teng de piştgiriya hev dikin û li hemberî xerabiyê li kêleka hev berxwedidin.

“Edetekî me Kurdan a weha heye: Gava dijmin êrîşî ser eşîretekî yan êleke dike, êl û eşîrên dinê heke dijminatî jî di navbera wan de hebe, ew wê wadelî di alîyekî de davêjin û alîkarîyê didine û paşê dîsa dijminatîya xwe dajon”(Ş.L – 212), “Xelqê gundê Kurdan, her yekî ji wan weke hêza xwe amadefî an ku hazirîya xwe dîtibû wekî xwarinê ji sirgûnîyan re bînin. Gundîyan êdî rê nedida hev, heryekî ji alîyê xwe de nan, xwarin, av, mast, didane sirgûnîyan û wan xwarina xwe dixwar”(Ş.L – 132)

“Morof fikirî ku kulfet wî şûxûlî nikarin bikin, wî qerar kir ew û jina xwe, Nûrê, rojê komekê bidine kulfetên malekê, wan holikan hinekî bi ser hev de bînin” (M – 65)

Cînar piştgiriya hev dikin. Kurd, tirk, ermenî tev jî li hemberî hemû tehlî û zordariyê li kêleka hev disekin.

“Xatê Xanim, diya min! Em dostên hev ên kevn in. Di roja çetin de, dost lazimî dostê xwe nehat, êdî çi dostayî û pismamtî” (X.X – 39)

Di edetê kurdan de kesî ne pak û dijminê gelê xwe ye, ji aliyê gel ve nayê qebûlkin. ‘Nexwe ew dijminê gel e. Bizanibe gel kî ye û roja teng çawa lazimî mirovan tê! Îro gelê gund zehf heq e, extîyar nedin ku di wê goristana gund de defîn bikin! Bila her Kurdek bizanibe ku gel di roja teng de pişt û bavê mîrovan e! Kî xirabîyê bike, wê di rêya te ya îroyîn re here” (Ş.L – 113)

“Em Kurd alîgirên heqîyê ne, heta neheqîyê li me nekin em destê xwe nadine tu kesî” (Ş.L – 127)

2.8.3. Rabûn û Rûniştin

Edetên mîna rabûn û rûniştinê li derdora baweriyên civatê qalip digire li gor qewm û erdnigariya civakê ji hev diguhere.

“Axir, ziman, adet, rabûn û rûniştina Kurdan, libasên Kurdan ji yê Tirkan cuda dibin, xêncî dîn” (Ş.L – 25)

Xûya dike ku di civatê de rûniştina jin û mêran ji hev cihê ye.

“Xezê tu wext li jorî mêvan û gelî de rûnedinişt. Ew her dem li jêrê û li aliyê çepê rûdinişt” (Ş.L – 37)

Di çanda kurda de rêzgirtina mezinan yek jî kevne adeta herî mezin e. Wextê xwarin, rûniştin, an jî axaftin be, her çi dibe li gorî mezinahiyê dest pê dike.

“Di nava netewa me debûye edet. Wexta ku birayê mezin li pêşî be, yê piçûk bi paş ve vedikişe.” (Ş.L – 49)

“Kurd xwedanê gilîyên xwe ne. Qîr li derîyê hêşin be, wan ku tûk kir naalêsin” (Ş.L – 85)

2.8.4. Zibare

Zibare yek jî adetê qewmê kurda ye, kevn e ku; her dema ku kesek bikeve tengasiyê de, cimeata wê derê kom dibe û bi qasî ji destê wan tê piştgirî didin wî kesî. Bi vî adetî biratî û piştgiriya nava gel de her xurt dibîne. Di romana Şer Li Çiya de wexta şandina Şêx Zayîr bo mektebê, gundî dicivin û kêmasiyên wî tamam dikin.

“Li cem Kurdan hîn di wexta kal û bavan de bibû edet ku yek ji hepsê bihata, yek biketa bin xerc, qelender bûya, xwîndar bûya, belengaz bûya her malekê weke hêza xwe hewar didayê û ew radikir ser pîyan. Wextê birêkirina Zayîr ji bo xwandinê gelek giregirên elê, qewm, piyamamên Şêx Emer li ber mala wî top bibûn, ji bo ku Zayîr rêbikin xwendinê... Wê çaxê êdî hespê zexîrê ji bo Zayîr bar kirin, lawik hatin nava gelê ku berhevbûyî, her kesî weke hêza kîsê xwe bona Zayîr xerc berhev dikir; yekî çend quriş, yê dinê çend paqnot, yê mayî lîreyek û hinekan jî zêr dida. Zayîr ji şermê sorviz dibû. Dixwest ku gilîyên xwe bibêje, lê ji edetên heyî, ji tirsê rûspîyan û bavê xwe taqet nedikir”(Ş.L – 56)

2.8.5. Edet

Edet, ew tiştên ku di civatê de cîh digirin û ji rabûn rûniştinê hilde heta cil û bergên wan ji xwarin û vexwarina wan hilde heta axaftina wan re têkildar e û wekî zagonên nenivîskî tînen qebûl kirin re tê gotin. Jixwe ruyekî yê vê xebatê jî ewe ku em van edetan bînin berçavan. Di romana Gundê Mêrxasan de hin edetên derbas dibin ev in:

“Ez di bextê we de me! Di ‘edetên cimaeta me Kurdan de, wextê ku mêrek mêrekî dikuje, xwe davêje mala xwedanê kuştî, kefen li stûyê xwe dialîne û dibêje: ‘Gidî, min kiriye, tu neke! Dixwazî vê lehzeyê min bikûje, extiyariya te heye.’”(G.M – 24)

“Kurd tu wextan neheqiyê li xelqê nakin, lê wexta ku xelq neheqiyê li me dike, em caba wan didin”(G.M- 48)

“Hûn Kurd miletekî birehm in, xwedanê namûsa xwe ne.”(G.M – 49)

Di edetên kurdan de pergalek dewletî yan jî sazîyên dadgehî pir ne xûrt in. Piranî mesele bi saya rûspîyên cimaetê tînen hal kirin. Ev rewş xwe di romanên de jî dide der.

“Hun Kurd in, şerê Kurdan timî dibe, bila rîspî têkevîne orta we, w eli hev bînin.”(G.M – 34)

Di hinek cihan de jî me dide zanîn ku ‘‘Dîwana wan jî rûspî û şêx bûn û hikûmeta wan jî’’(Ş.L – 37)



ENCAM

Berîya her tiştî divê em bidin zanîn ku, danasîna miletê bi naskirina çand û zimanî destpê dike. Bi nîşandayîna çand û zimanî dewlemendîya kevneşopiya wî milletî jî derdixîne holê. Ji bo wê heger miletê Kurd bixwaze bênaskirin divê gencîneya çanda xwe û celebên folklorê bizanibin û bi pisporî analîz bikin. Bi vî awayî şaristanî û kevneşopiya Kurdan a hezar salan derdikeve meydana. Armanca xebata me jî dahûrandina romana Eliyê Evdilrehman û derxistina keresteyên folklorîk ji romanên wî bû.

Ji ber sedemên konjûktruel jî dîroka ramonnûsîya kurda li gor dîroka edebîyata neteweyên din dereng destpê kiriye û ji trena modernazîsyonê dûr ketiye. Lê belê romannûsên kurd her hewl dane ku xwe bigîhînin wêjeya cîhanê. Lê ev pêvajoyên ne hêsan bû, helbet xusar û tehb herdem li pêşîya rewşenbîran bû û hemû nivîskar û helbestvanên kurd ji bo ku ji benê edebîyata kurdî neqete û xizmetê li wêjeya xwe bike, gelek zehmetî kişandîne, ji welatê xwe dûr, bilavê cîhanê bûne. Wisa ku piştî demekê, berê xwe dane derveyê welat. Loma jî romanên pêşî ne li welat, li qafqasyayê derketîne. Ev berhemîranî klasîk in, xwe dispêrin paşxaneya kurdî û rengê wan ê folklorîk li pêş in. Lê ji aliyê mijarê ve hêza kûrbûna nivîsê lawaz in. Ligel van kend û kospan romana kurdî her ku diçe dikemile û niha em bi rehetî dikarin bibêjin ku gihaştîye astekê.

Di berhemên Eliyê Evdilrehman de yek jî mijara herî girîng hewandina vegûhestina çanda devkî ye. Lewre keresteyên çanda devkî li gor şert û deman, ji bo nîfşên nû tîne veguhastin. Lê belê bi demêre hêdî hêdî wînda dibin û ji bo ku wînda nebin divê bîna nivîsandin ku Eliyê Evdilrehman ev peywir gelek serkeftî bi cîh aniye. Çimkî nasnameya kurdî ji çanda devkî gelek sûd werdigire û xwediyê pêvajoyek serbixwe ye. Lê belê yê nivîskî ne wisaye. Bêguman çanda nivîskî ji aliyê serdestan ve dikare bê kontrolkirin û dikarin bergeha wê ji bo ziman û edebiyatê bişixûlînin. Yanî ji midaxaleyên derveyî re vekirî ye. Lê pêvajoya çanda devkî bi vî terzê û wîha nadome. Xwediyê prosesek cuda ye û ji midaxaleyên derveyî re bêhtir girîng ye. Azadiyek wê ya qismî heye û resenbûna wê dikare li hemberî pişaftinan bisekine. Nivîskarê me jî ji vî tiştê haydar bû û keresteyên di nava gel de yekbîyek xistiye nava berhemên xwe û hêrandiye, ji parzûna xwe derbas kiriye. Loma jî wekî ku me di teze de jî diyar kir rewşenbîrê me ne tenê hêmanên kurdî yê folklorîk xistiye nav mijara nivîsa xwe, tevî parastina çanda xwe ji ziman jî gelek peyvên tirkî, ûrîsî û farîsî formên nû hildane û êdî bûne malê kurdî.

Herwiha em baş dizanin ku ji ber mezinbûna erdnîgariya Kurdan têkiliyên hin hereman ji hevdu qut bûne, ev jî bûye sedem ku heman rewş bi gotin û peyvên ji hev gelek dûr bûn bikaranîn. Ev jî dide xuyakirin dewlemendiya ziman û edabiyata Kurdî li gorî erdnîgariyê formek nû hildaye û vê jî rengêk nû daye peyda kirin.

Piştî xwendina çar romanên Elîyê Evdirrehman em gihaştin heşt(8) encama ku zêdetir ber bi çav in.

- 1- Wekî ku em dizanin berhemên Qafqasyayê bi gotinên pêşîyan û biwêjên xwe navdar in. Ev rengê wan ê folklorik xwe di berhemên Elîyê Evdirrehman de jî nişan dide. Di her çar berhemên behskirî de jî hejmara gotinên pêşîyan û biwêjan zehf zede ye. Em dikarin bibêjin ku li gorî rûpelên berhemên, hejmara wan jî kêmtir an jî zêde bûye. Herwiha bi rêya gotinên pêşîyan û biwêjan em di derheqê karakter û bûyeran tîn agahdar kirin û haya me ji başbûn û xerabûna wan çêdibe.
- 2- Wexta ku bi giştî berhemên Qafqazê bê nirxandin, dê bê dîtin ku propagandaya pergala sovyetê û pê re jî peznedayîna bawerîya Ezdadetîyê astekî bilind de ye, lê tiştêkî eceb e ku Elîyê Evdirrehman tevî ku pesnê Sovyetê dide jî, xwe ji bawerîya misilmantîyê dûr naxe û rêz ji li îslamê digre û di berhemên xwe de, cih dide diayên ola îslamê.
- 3- Di romanên hatin behskirin de, rê, sirgûnkirin û mişextkirin parekî mezin hildide. Heta di hin cihan de ji ber ku jinîkek di rê de diwêlîde navê zarokê 'sirgûn' deytînin. Ev jî me dibe salên koçkirin û mişextkirina kurdan ku, nivîskar bi xwe şahîdê vê yeke bû û bi êş û eleme mezin ve ji axa xwe hatibûn dûrxistin. Helbet dibe ku nivîskar ji jîyana xwe îlham vergitibe û bi mînakên vî şiklî yê romantik behsa wan dewra kiribe.
- 4- Nivîskar, di meselaya urf û edetê de zehf xurt e û ev zanabûna xwe di gelek cihan de bi me dide nişandan. Ji ber ku nivîskar di berhemên xwe de bi awayekî dersdayîne tevgerîyaye, hima di her rûpelî de em liqayê mînakek folklorik tîn. Carina gotinên pêşîyan, carina biwêj, carina meseleyên gel û wd in.
- 5- Nivîskar di bikaranîna nifir, dia, xwestek, gotinên qalipgirtî û wd in de jî hostebûna xwe nişan dide. Ser mînak nifirên ku bi deve jinan tîn kirin û nifirên ji deve meran tîn kirin ne heman in. Herwiha di halê ecebmayîne de jî, gotinên ji deve jinan derdikevin, ji yê meran cûdatir e. Nivîskar di vê babetê de baldar e û jin û meran li gorî çavderîyên xwe daye axaftin.

- 6- Meseleya zewacê parekî mezin digre di nav berhemên Elîyê Evdirrehman de. Nivîskar, bi pezndayîn behsa dawetên kurdan kirîye. Sedema ev pezndayînê jî em dikarin bi xwesteka nivîskar ku dixwaze nîrxên civata xwe bilind bike ve girêbidin. Bi kite kit behsa ewrên zewacê dike. Wexta cahil digihêjên temênê xwe û balîx dibin, bîryara zewaca wan tê dayîn. Nivîskar di meseleya zewacê de li ser dû tiştê zehf disekine. Ya peşî; berîya bîryara zewacê miheqqeq fikra keçik jî tê xwastin. Beyî xwestina qîzê dawetê pêk naynin. Ya dûdûyan jî, di dawetê de bi zanatî behsa kêfxweşîya bav û dîya qîzê dike û pezndayîn behsa lîstina wan ya dawetê dike.
- 7- Civaka ku nivîskar di her çar berhemên de jî behs dike, hima di nav şer, xirgele û koçkirinê de ne. Leheng her wext ser pîyan e û li hemberî dijminan şer dikin. Ev psîkolojiya bêwarbûnê di hemû rûpelên berhemên de xwe dide hîskirin. Loma jî roman, xwe ji dûbarabûnê xelas nake û di nav heman meseleyan de diçe û tê.
- 8- Nivîskar di gelek cîhan de xwe dide dest. Binavkirina lehengên romanên de, bi leqebdayîna wan de, bi hal û tevgerên wan de û wd in. Ev lawazîya ku xwîneran aciz dike û vegotinê qels dike, ji nivîskar re ne xem e. Lewre jixwe armanca nivîskar dersdayîn û şîretkirina xwîneran e. Lewre nivîskar celeba romanê ji hûnertîyê bêtir, ji bo pêkanîna hevîyan û bi hewla avakirina nasnameyekê bikaranîye. Ev yek jî mîna qedera pirranî romanên kafkasyayê, di van romanên de jî li me eyan dibe.

Bi awîrekî giştî, bi xwendina berhemên klasîk ên bi vî tarzî, em pêrgî gotin û qalibên di sikratê de tînin ku hinek ji wan jî mirine. Mîrov bi hînbûna van peyvên ku hatine jîbirkîrîn dihise û ew hesta xwedî derketina kamêraniya ziman xurttir dibe. Li gel vê hişmendiya ku em ji rabirdû dimijin, di hêla berhemên edebî û pergala perwerdehiyê dê wê dahatûyê ronaktir bike.

Hewla vê xebatê xizmetek bû ji bo kişîkirina dewlemendiya folklorê kurdî ya romanê de ku hate tespîtîkirin ji her celebên edebî di nava xwe de hebandiye. Ji her hêmanên folklorîk bermayiyek heye û berhem bûye çavkanîya çanda devkî. Ev yek jî, li gel bergeha folklorîk maldariya zimanê kurdî jî nîşan dide.

Divê neyê jîbîrkin ku cihêrengiya me çiqas çêbibe, ew qas wateya heyîna neteweya me xurt dibe. Folklor nîşaneyê û xwe îspatkirina neteweyekî ye û çiqas were kolandin ew qas hîmên wêjeyê mikûn dibe.



ÇAVKANÎ

Abraham, H. Lass, *100 Büyükle Roman - 1*, Weşanxaneyaya M. E. B, 1998

Alan Dundes, ‘‘Folklor Nedir’’, *Kovara Milli Folklor*, 2005, h. 65

Alan Dundes, *Folklor Nedir, Halk Biliminde Kuramlar Ve Yaklaşımalar 2*, Weşanxaneyaya Geleneksel, 2010, Enqere,

Amîr, Hassanpour, *Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil*, Weşanxaneyaya Avesta, s. 1997

Avdo Karataş, ‘‘Folklor û Afirandina Çanda Niviskî’’ *Weşanxaneyaya The Journal Of Mezopotamian Studies*, Zivistan, s. 2017

Ayşenur Nazlı, Özyurt, *Ziya Gökalp’ın Halk Bilimi Çalışmalarındaki Yeri*, Teza neçapbuyî, Enqere 2008

Barry, Sanders, *Öküzün A’sı: Elektronik Çağda Yazının Çöküşü Ve şiddetin Yükselişi*, Weşanxaneyaya Ayrıntı, s. 1994

Bedran, Hikmet, *Teorîyên Folklorê*, Weşanxaneyaya Lîs, Amed 2016

Betül, Çoban, ‘‘Lehengên Erenî û Şoreşger di Romanên Kurdî yên Sovyeta Berê de’’, *Kovar: Wêje û Rexne*, Hejmar: 9/10, 2018

Celadet Alî, Bedirxan, ‘‘Ferhengok’’, *Kovara Hawar* j. 30, Şam 1941

Cumhur, Ölmez, ‘‘Temsîlên Romanên Dîrokî Yên Elîyê Evdilrehman’’ *The Journal Of Mesopotamian Studies*, Summer 2018

Dîlawer Zeraq, ‘‘Wek Mîrateyaya Neteweyî Folklor û Kovara Jînê’’, *Kovara Zarema*, h. 8, Diyarbekir 2016

Dîlawer Zeraq, *Rajena Kurdî*, Weşanxaneyaya Lîs, 2014

Ebubekir Gören, *Di Romanê Erebê Şemo De Hêmanên Folklorîk*, Teza ne çapbûyî, Mêrdîn 2013

Ebubekir Gören, *Di Romanên Erebê Şemo De Folkora Kurdî*, (Teza neçapbûyî), Mêrdîn 2013

Fahriye Adsay, *Romana Kurdî (Kurmançî) Ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname*, Teza neçapbûyî, Mêrdîn, 2013

Fatih, Tepebaşı, *Roman İncelemesine Giriş*, Weşanxaneya Çizgi, s. 2012

Francis Le Utley, “Folklorun Tanımı”, Wer. Saltık Özkan, *Kovara Milli Folklor*, 2005, h. 65

Güneş Kan, *Îmaja Ermenî Di Romanên Kurdî Yên Sovyetê De*, Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Çand û Zimanê Kurdî, Teza Mastirê ya Çapnebûyî.

Hasan Çiftçi, “Ortak Atasözlerinin Hikayeleri: Farsi-Kurmançî-Zazakî”, *Bingöl Üniveritesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2016, h. 3

Haşim Ahmedzadeh, *Romana Kurdî û Nasname*, Wer. Fahriye Adsay, Weşanxaneya Avesta, Stenbol 2011

Haşim, Ahmetzadeh, *Ulus ve Roman*, Weşanxaneya Pêrî, s. 2004

<http://yeniedebiyat.blogcu.com/turk-edebiyati-ve-folklor-iliskisi-osman-sahin/367120>

Idris, Kartal, “Di Eşîra Duderan De Navên Pezê Mêşin” *Kovara Folklorê Kurdan* 2015, h.3

Îbrahîm, Seydo Aydoğan, *Guman 2*, Weşanxaneya Rûpel, s. 2014

Îzeddîn Mustafa Resûl, *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvîf olarak Ehmedê Xanî ve ‘Mem û Zîn’*, Weşanxaneya Avesta, s. 2007

Jan Assman, *Kültürel Bellek*, Weşanxaneya Ayrıntı, Stenbol 2018, r. 142

Kadri Yıldırım / Ramazan Pertev / Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanxaneya Zanîngeha Mêrdînê, Stenbol 2013

Kadri, Yıldırım, *Kürtçe Dilbilgisi*, Weşanxaneya Mardin Artuklu Üniversitesi, 2012

Kamuran, Bedirxan, “Edebiyata Welatî”, *Kovara Hawar*, s. 1932, j. 1

M.Zahir, Ertekin, “Du Deng û Yek Reng Di Kurdî De: Dengbêjî û Qesîdebêjî”, *Sempozyûma Navnetewî ya Dengbêj û Çanda Dengbêjan*, 2019

Mehmed, Uzun, *Destpêka Edebiya Kurdî*, Weşanxaneya Ithaki, s. 2007

Mehmet Tekin, *Roman Sanatî*, Weşanxaneya Ötüken Neşriyat, 2016

- Mehmet Uzun, *Bir Dil Yaratmak*, Weşanxaneyaya Gendaş, 2005
- Metin Ekinci, *Halk Bilgisi Folklor Derleme ve İnceleme Yöntemleri*, Weşanxaneyaya Geleneksel, 2007
- Mithat Sancar, *Geçmişle Hesaplaşma*, Weşanxaneyaya Ayrıntı, Stenbol 2010
- Mustafa Borak, *Ferhenga Biwêjan*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Sal: 2014
- Mustafa, Borak, “Kela Dimdimê” *Kovara Folkora Kurdan*, s. 2015 h. 4
- Nail Tan, “Türkiye’de Halk Bilimi Çalışmalarının 100. Yılına Kutlarken”, *Kovara Folklor ve Edebiyat*, cilt:19, sayı:75, 2013/3
- Pertev Naili, BORATAV, *100 Soruda Türk Folkloru*, Weşanxaneyaya Gerçek, Stenbol. 1999
- Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanxaneyaya Awesta, İstanbul s. 2018
- Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok, Destpêka Pedagojiya Kurdî*, Weşanên Doz, Stenbol 2009
- Ramazan, Turgut, “Çanda Xwarina Kurdan”, *Kovara Folklor Kurdan*, s. 2015. h.3, r. 4
- Remezan, Alan, *Li Dor Texeyyûlên Berê Rêçên Îroyîn - Folklor û Roman*, Weşanxaneyaya Peywend, s. 2013
- Renê Wellek û Austîn Warren, *Edebiyat Teorisi*, Weşanxaneyaya Dergah, s. 2013
- Richard M. Dorson, *Folklor û Teoriyên Folklorê Îroyîn*, Weşanxaneyaya Awesta, Stenbol, 2017
- Sedat Veyis Örnek, *Türk Halk Bilimi*, Weşanxaneyaya İş Bankası, Enqere 1977
- Sedat Veyis, Örnek, *Anadolu Folklorunda Ölüm*, Weşanxaneyaya Zankoya Enqerê, Enqere 1971
- Sedat Veyis, Örnek, *Türk Halk Bilimi*, Weşanxaneyaya Wezaretê Çandî, Enqere 2000
- Sedat, Ulugana, “Di Nav Kurdên Yekitiya Sovyetan ên Berê de Edebiyata Kurdî!”, <https://krd.riataza.com/2015/10/12/di-nav-kurden-yekitiya-sovyet-de-edebiyeta-kurdi/>
- Selçuk Çıkla, “Romanda Kurmaca Ve Gerçekçilik”, *Kovara Hece* 2002, h. 65/ 66/ 67

Süheyla Sarıtaş, “Halk Bilimine Giriş”,
www.acikders.org.tr/pluginfile.php/2512/mod_resource/content/2/Hafta_3.pdf,
13.12.2018

T.S, Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, Weşanxaneyya Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, s. 1983

Tekîn, Çiftçi, *Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê: Kilam û Jin*, Weşanxaneyya Nûbihar, s. 2014

Vladimir Propp, *Folklor, Teori ve Tarih*, Weşanên Awesta, Stenbol 1999

William Bascom, “Halkbilimi, Sözlü Sanat Ve Kültür” Wer. Nilgün Aytuzlar, *Kovara Milli Folklor* 2004, h. 63

Yuri M. Sokolov, *Folklor: Tarih ve Kuram*, Weşanxaneyya Geleneksel, Enqere 2009

Zekeriya Karadavut, *Kırgızlarda Ad Verme Geleneği*, Weşanxaneyya Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları.s. 2013

Zülküf, Ergün, “Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê”, *Kovara Mukaddime*, 2018

KURTE JÎYAN

Di sala 1994an de li navçeya Bismila Diyarbekirê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Bismilê, dibistana navendî li Aksarayê û lîse jî li Manîsayê kuta kirîye. Di salan 2017an de li Bîngolê beşa Ziman û Wêjeya Kurdî qedand û niha jî di beşa ziman û wêjeya kurdî de masterm dike.

ÖZGEÇMİŞ

1994 yılında Diyarbakır'ın Bismil ilçesinde doğdu. İlkokulu Bismil' de, ortaokulu Aksaray'da, liseyi de Manisa da tamamladı. Bingöl Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı bölümünde mezun oldu. Bingöl üniversitesi Kürt dili ve edebiyatı bölümünde Master yapmaktadır.